



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

DEM DI DEVOKA TORÊ DA
(Bi Mînaka Gundê Xerabê Bena)

Teza Lîsansa Bilind

Lokman KALAN

13711044

Şêwirmend:

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn, 2019

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

DEM DI DEVOKA TORÊ DA
(Bi Mînaka Gundê Xerabê Bena)

Teza Lîsansa Bilind

Lokman KALAN

13711044

Şêwirmend:

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn, 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**DEM DI DEVOKA TORÊ DA (Bi Mînaka Gundê Xerabê Bena)**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim/Projem sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

28/06/2019

Lokman KALAN

KABUL VE ONAY

Lokman KALAN tarafından hazırlanan “*DEM DI DEVOKA TORÊ DA (Bi Mînaka Gundê Xerabê Bena)*” adındaki çalışma, tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oy birliği / oy çokluğu ile kabul edilmiştir.

Danışman : Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Üye : Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

Üye : Dr. Öğr. Üyesi Hacı ÖNEN

Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

Doç. Dr. Yunus CENGİZ
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü

PÊŞGOTIN

Zimanê kurdî tevî her çar zaravayên xwe (kurmancî, soranî, zazakî, goranî) li rojhilata navîn xwedî cihêkî taybet e. Kurmancî jî bi hejmara axiverên xwe ve beşa herî mezin e. Xebatên ku li ser vî zimanî tên kirin di salên dawî da, bi taybetî tezên lîsansa bilind, zêde dibin û ev ziman ji aliyê van xebatan ve xurt dibe. Me jî ev xebata xwe li zanîngeha Mardin Artukluyê kir. Li aliyê din digel ku kurmancî xwedî para herî mezin e xebat ewqas li ser nehatine kirin.

Em di vê xebata xwe da li herêmeka sînordar li ser deman xebitîn. Ji bo vê jî me herêma Torê û gundê Xerabê Bena hilbijart. Devoka Torê hem ji aliyê erdnîgarîya xwe hem jî ji aliyê mêjera axiverê xwe ve berfireh e. Ji ber vê yekê jî em di wê bawerîyê da ne ku xebatên li ser devoka vê herêmê dê ji gelek alîyan ve xizmeta zimanê kurdî bikin û ji bo xebatên din bibin bingeş. Li aliyê din me xebat bi demên lêkeran sînordar kir ku heta ji destê me bê em karibin li mijarê hûr bibin. Di nav mijarên rêzimanî da sedema hilbijartina deman jî ew e ku devok di axaftinê da herî zêde xwe di dengên da didin dest û cudahiyan dengên jî bêhtir di kişandina lêkeran da xwe nîşan didin. Ji ber ku ez bixwe jî axiverekî xwezayî yê vê devokê me, vê tercîhê karê me ji aliyên bi awayekî rast qeydkirina metnan, tesbît û danasîna rewş û awarteyên ziman yên herêmê û li cihên hewce dana nimûneyan ve hêsan kir.

Ev xebat bi alîkarîya gelek kesan temam bû û gihîşt ber destê we. Di serî da dixwazim ku ji şewirmendê xwe Doç. Dr. Mustafa Öztürk ra spas bikim ku ne ji wî bûna dê gelek kêmasî ketibûna vê xebatê. Ji Dr. Mikail Bülbül ra spas dikim ku bi fikirên xwe rê li ber şaşîyên min girt û berê xebatê da rêyeka zelal. Ji hevalên xwe Ahmet Seyari, Ramazan Yaman û M. Emin Sincar ra spasdar im ku wan jî di kemilîna xebatê da alîkarîya min kir. Di dawîyê da ji vebêjerên xwe ra spas dikim ku di serê kanîya xebatê da ew hene. Hêvîya me ji xebatê ew e ku mijareka destnedayî ronî bike û kevîrekî li ser dîwarê ziman bike û ji xebatên pey xwe ra jî bibe alîkar. Bi hêvîya ku her bajar, bajarok û gundekî me bibe warê xebatên ji vê xebatê serkeftîtir.

Lokman KALAN

Mêrdîn, 2019

KURTE

Mijara vê xebatê di kurmancîya jorîn da demên devoka Torê ye. Herwiha taybetîyên morfolojî û erka demên lêkeran û têkilîyên wan binmijarên vê vekolînê pêk tînin. Di xebatê da rêbaza zimannasîya şayesî (descriptive linguistics) û sîstema erkparêz (functional plane) hatiye bikaranîn. Vekolîn ji alîyê mijarê ve bi deman û ji alîyê cihê xebatê ve jî bi gundekî herêma Torê (Xerabê Bena) hatiye sînorkirin. Armanca sereke ya xebatê danasîna demên devoka Torê ye. Herwiha danasîneka giştî ya devoka Torê, ji armancên talî yê wê vekolînê ye. Herêma Torê ji alîyê erdnîgarîya xwe ve herêmeka têra xwe fireh e û devoka Torê di zimanê kurdî da di nav zaravayê kurmançî da ji alîyê serjimara axiverên xwe ve xwedî cihêkî girîng e. Ji ber vê yekê jî tê hêvîkirin ku xebatên li ser wê devokê di ronîkirina gelek mijarên kurmançî da roleka êrênî bilîzin û rê li ber gelek xebatên din vekin. Xebat bi taybetî li ser demên lêkeran hûr bûye. Ji ber ku taybetîyên devokî herî zêde di kêşana lêkeran da xwe nîşan didin xebatên di vî warî da ji bo şayesandina taybetîyên devokêkê pir girîng in. Ev xebat ji destpêkekê û çar beşan pêk tê. Di destpêkê da mijar, armanc û girîngî, rêbaz û çavkanîyên teze hatine vegotin. Di beşa yekem da derheqê têgehên sereke yê têkildarî mijarê da agahî hatine dayîn. Têgehên wekî lêker û kêşana lêkeran hatine şîrovekirin. Dîsa di vê beşê da herêma Torê û devoka Torê û gundê Xerabê Bena hatine danasîn. Di beşa duyem da lêkolîn li ser demên borî hatiye kirin. Ev beş ji çar binbeşan pêk tê ku her binbeş demeka borî pêk tîne. Di beşa sêyem da lêkolîn li ser dema niha hatiye kirin. Mijara beşa çarem jî dema bê ye. Ji bo her demê jî pêşî taybetîyên morfolojî û erka wê demê bi giştî hatine dayîn dûra jî taybetîyên wê demê yê ku di devoka Torê da hatine çespendin hatine pêşkêşkirin. Taybetîyên sereke yê demên devoka Torê yê ku di wê xebatê da hatin çespendin di dawîya van beşan da wekî encam hatine dayîn.

Peyvên Sereke: Dem, kêşana lêkeran, devoka Torê, gundê Xerabê Bena.

ÖZET

Bu çalışmanın konusu Kürtçenin Kurmancca lehçesindeki Tor ağzının zamanlarıdır. Aynı zamanda fiillerin zamanlarının biçim ve işlev özellikleri ve ilişkileri bu araştırmanın alt konularını oluşturmaktadır. Bu çalışmada betimleyici dilbilim (descriptive linguistics) metodu ve işlevsel düzlem (functional plane) kullanılmıştır. Bu araştırma, konusu bakımından zamanlar ve çalışma yeri bakımından Tor yöresinin bir köyü (Xerabê Bena) ile sınırlandırılmıştır. Çalışmanın ana amacı Tor ağzının zamanlarının tanıtılmasıdır. Ayrıca Tor ağzının genel bir tanıtımı bu araştırmanın ikincil amaçlarındandır. Tor yöresi coğrafyası bakımından yeterince geniştir ve Tor ağzı Kürtçede Kurmancca lehçesi içinde konuşucularının nüfusu bakımından önemli bir yere sahiptir. Bu yüzden bu ağız üzerindeki çalışmaların Kurmanccanın birçok konusunun aydınlatılmasında olumlu bir rol üstlenmesi ve birçok çalışmaya önayak olması umulmaktadır. Çalışma özellikle fiil zamanları üzerine yoğunlaşmıştır. Yöresel özellikler kendilerini en çok fiil çekimlerinde ele verdiği için dolaylı olarak bu alandaki çalışmalar bir ağzın tasvir edilmesi için çok önemlidir. Bu çalışma bir giriş ve dört bölümden oluşmaktadır. Girişte çalışmanın konu, amaç ve önem, yöntem ve kaynakları sunulmuş. Birinci bölümde konuyla ilgili ana kavramlar hakkında bilgiler verilmiş. Fiil ve fiil çekimi gibi konular ele alınıp açıklanmış. Tor yöresi ile Tor ağzı ve Xerabê Bena köyü tanıtılmış. İkinci bölümde geçmiş zamanlar incelenmiş. Bu bölüm dört alt bölümden meydana gelmekte ve her alt bölüm bir geçmiş zamanı oluşturmaktadır. Üçüncü bölümde şimdiki zaman incelenmiş. Dördüncü bölümün konusu ise gelecek zamandır. Her bir zaman için de önce o zamanın morfolojisi ve işlevi genel olarak verilmiş sonra da o zamanın Tor ağzında tespit edilen özellikleri sunulmuştur. Bu çalışmada tespit edilen Tor ağzının zamanlarının başlıca özellikleri bu bölümlerin sonunda sonuç başlığı altına sunulmuştur.

Anahtar Sözcükler: Zaman, fiil çekimi, Tor ağzı, Xerabê Bena Köyü.

ABSTRACT

The subject of this study is the tenses of the Tor accent. At the same time, the characteristics of form and function and correlation of verbs' tenses constitute the sub-topics of this research. Descriptive linguistics method and functional plane were used in the study. This subject is limited to tenses in terms of the subject of the research; and limited to a village of the Tor region (Xerabê Bena) in terms of place of study. The main aim of the study is to introduce the tenses of Tor accent. In addition, a general introduction of the Tor accent is one of the secondary aims of this research. Tor region is large enough in terms of geography and Tor accent has an important place in the Kurmanji dialect in the area. Therefore, it is hoped that studies on this accent will play a positive role in clear up many issues of Kurmanji and will lead many studies. The study mainly focuses on verb tenses. Because the local features give themselves the most at verb conjugations, the studies in this area are very important for portraying an accent. This study consists of an introduction and four parts. In the introduction the subject, aims and importance, methods, parts, limitations and resources of the study are presented. In the first chapter, information about the main concepts are given. Topics such as verb and verb conjugation are explained. Tor region and Tor accent and Xerabê Bena village are identified. In the second chapter past tenses are examined. This chapter consists of four subdivisions and each sub-section forms a past tense. In the third chapter the present continuous tense has been examined. The topic of fourth chapter is the future tense. Also in each tenses the morphology and function of tenses are mentioned in general and then distinguished features of the tenses in Tor accent are presented. As a conclusion in this study, the main features of the Tor accent tenses are presented at the end of these sections.

Key Words: Tense, verb conjugation, Tor accent, Xerabê Bena village.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	II
ÖZET	III
ABSTRACT	IV
NAVEROK	V
KURTEBÊJE	VIII
DESTPÊK	1
1. Mijara Tezê	1
2. Armanc û Girîngîya Tezê	3
3. Rêbaza Tezê	3
4. Çavkanîyên Tezê	6

BEŞA YEKEM: HERÊMA TORÊ Û TÊGEHÊN SEREKE YÊN XEBATÊ

1.1. HERÊMA TORÊ	7
1.1.1. Herêma Torê ji Alîyê Dîrokî, Erdnîgarî û Beşerîya Xwe ve	7
1.1.2. Gundê Xerabê Bena	8
1.1.3. Devoka Torê	9
1.1.4. Xebatên Ku li ser Devoka Torê Hatine Kirin	10
1.1.5. Xebatên Ku li ser Vê Mijarê Hatine Kirin	12
1.2. TÊGEHÊN SEREKE	12
1.2.1. Ziman (Language)	12
1.2.2. Zarava û Devok (Dialect and Accent)	12
1.2.3. Rêziman (Grammar)	13
1.2.4. Zimannasî (Linguistics)	14
1.2.5. Zimannasîya Şayesî (Descriptive Linguistics)	15
1.2.6. Erdnîgarîya Zimannas (Linguistic Geography)	16
1.2.7. Morfolojî (Morphology)	16
1.2.7.1. Morfem (Morpheme)	17
1.2.7.2. Alomorf (Allomorph)	18
1.3. LÊKER Û KÊŞANA LÊKERÎ	19
1.3.1. Lêker (Verb)	19

1.3.2. Mesder (Infinitive)	20
1.3.3. Kêşana Lêkerî (Verbal Conjugation)	20
1.3.3.1. Kes (Person)	21
1.3.3.2. Dem û Wext (Tense and Time)	22
1.3.3.3. Dem û Xuyang (Tense and Aspect)	24
1.3.4. Pevguherîna Deman (Tense Shift)	26

BEŞA DUYEM: DEMÊN BORÎ

2.1. DEMA BORÎYA TÊDEYÎ (SIMPLE PAST TENSE)	28
2.1.1. Morfolojî û Erka Dema Borîya Têdeyî	28
2.1.2. Bikaranîna Dema Borîya Têdeyî di Devoka Torê da	29
2.1.2.1. Dema Borîya Têdeyî ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe	32
2.1.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî di Dema Borîya Têdeyî da	32
2.1.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Bêjeya Serbixwe ye	32
2.1.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Cihna Paşnûsek e	33
2.1.2.3. Xuyanga ku di Dema Borîya Têdeyî da bi Bêjeyan Çêdibe	34
2.1.2.3.1. Lêkera Çûnê	34
2.1.2.3.2. Lêkera Rabûnê	35
2.1.2.3.3. Lêkera Dîtinê	36
2.1.2.4. Lêkerên Cotmesder di Dema Borîya Têdeyî da	36
2.1.2.5. Lêkerên Awarte di Dema Borîya Têdeyî da	37
2.1.2.5.1. Lêkera Gotinê	37
2.1.2.5.2. Lêkera Dîtinê	38
2.2. DEMA BORÎYA TEMAM (PRESENT PERFECT TENSE)	39
2.2.1. Morfolojî û Erka Dema Borîya Temam	39
2.2.2. Bikaranîna Dema Borîya Temam di Devoka Torê da	41
2.2.2.1. Dema Borîya Temam ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe	45
2.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî di Dema Borîya Temam da	46
2.2.2.3. Lêkerên Cotmesder di Dema Borîya Temam da	48
2.3. DEMA BORÎYA DOMDAR (PAST CONTINUOUS TENSE)	50
2.3.1. Morfolojî û Erka Dema Borîya Domdar	50
2.3.2. Bikaranîna Dema Borîya Domdar di Devoka Torê da	52
2.3.2.1. Dema Borîya Domdar ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe	53
2.3.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî di Dema Borîya Domdar da	53
2.3.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Bêjeya Serbixwe ye	53
2.3.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Cihna Paşnûsek e	54
2.3.2.4. Lêkerên Cotmesder di Dema Borîya Domdar da	54
2.4. DEMA BORÎYA DÛR (PAST PERFECT TENSE)	55
2.4.1. Morfolojî û Erka Dema Borîya Dûr	55
2.4.2. Bikaranîna Dema Borîya Dûr di Devoka Torê da	56
2.4.2.1. Dema Borîya Dûr ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe	58
2.4.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî di Dema Borîya Dûr da	59
2.4.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Bêjeya Serbixwe ye	59
2.4.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Cihna Paşnûsek e	60

BEŞA SÊYEM: DEMA NIHA

3.1. MORFOLOJÎ Û ERKA DEMA NIHA (PRESENT CONTINUOUS TENSE).....	62
3.2. BIKARANÎNA DEMA NIHA DI DEVOKA TORÊ DA	64
3.2.1. Dema Niha ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe	68
3.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî di Dema Niha da.....	69
3.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Bêjeya Serbixwe ye	69
3.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Cihna Paşnûsek e	69
3.2.3. Xuyanga ku di Dema Niha da bi Bêjeyan Çêdibe.....	70
3.2.3.1. Lêkera Çûnê.....	70
3.2.3.2. Lêkera Rabûnê.....	71
3.2.4. Lêkerên ku Mesdera Wan bi -andinê Diqede di Dema Niha da.....	72
3.2.5. Lêkerên Awarte di Dema Niha da.....	72
3.2.5.1. Lêkera Gotinê	72
3.2.5.2. Lêkera Meyzandinê	73

BEŞA ÇAREM: DEMA BÊ

4.1. MORFOLOJÎ Û ERKA DEMA BÊ (FUTURE TENSE)	74
4.2. BIKARANÎNA DEMA BÊ DI DEVOKA TORÊ DA	75
4.2.1. Dema Bê ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe	78
4.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî di Dema Bê da	79
4.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Bêjeyeka Serbixwe ye	79
4.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Cihna Paşnûsek e	80
4.2.3. Xuyanga ku di Dema Bê da bi Bêjeyan Çêdibe	81
4.2.3.1. Lêkera Rabûnê.....	81
4.2.3.2. Lêkera Çûnê.....	81
4.2.3.3. Lêkera Gotinê	82
4.2.4. Lêkerên ku Mesdera Wan bi -andinê Diqede di Dema Bê da	82

ENCAM.....	84
-------------------	-----------

ÇAVKANÎ.....	86
---------------------	-----------

PÊVEK 1: METNÊN XEBATÊ.....	90
------------------------------------	-----------

METN 1	90
METN 2	104
METN 3	113
METN 4	115
METN 5	119
METN 6	122
METN 7	124

PÊVEK 2: FERHENGOKA METNAN.....	126
--	------------

PÊVEK 3: NEXŞE Û WÊNEYÊN HERÊMÊ.....	128
---	------------

KURTEBÊJE

bnr: binêre

BTR: bûyer, tevger û rewş

edît.: edîtor

h.b.: heman berhem

hwd.: her wekî din

MVX: metnên vê xebatê

r.: rûpel

rr.: ji rûpelê ... heta rûpelê ...

Vgz.: veguhêz

wer.: wergêr

DESTPÊK

Ziman ji bo ragihandinê rêya herî rast û zelal e. Ragihandin jî bi giştî di nav sîstemeka diyar da pêk tê. Ev sîstem jî alîyekî ve bi rêzimana xwe ya xweser zimanekî¹ pêk tîne û ji alîyekî din ve bi pergalên xwe yên navzimanî wekî qabiliyeta ziman di nav sîstema navnetewî ya zimanan da cih digire.

Lêker hêmayek ji rêzimanê ye û bi hin taybetîyên xwe ku di tu cûreyên bêjeyan yên din da tunin ji hêmayên din vediqete. Dem, kes, rawe hin ji van taybetîyan in ku bi lêkeran ve girêdayî ne. Di hin mijarên rêzimanî da beşkirina lêker û yên din ya herî guncan e. Eger di komeka peyvvan da lêker tune be gelek caran ragihandin bi awayekî zelal pêk nayê, kêr dimîne, peyam bi temamî nagihîje peyambar. Eger lêker hebe hêmayên din erka xwe bê kêmasî pêk tînin. Loma jî dikare bê gotin ku lêker wekî lokomotîfa trêne danêrê hevokê ye. Lêker bi serê xwe hevokekê pêk tîne lê ew tune be hevok kêr tê hesibandin û hêmayên din bêtî lêkerê nikarin tevbigerin.

Taybetîyeka karakterîstîk ya lêkerê dem e ku bûye mijara vê xebatê. Lêkera ku bûyer, tevger yan jî rewşekê îfade dike kengê pêk hatiye yan dê kengê pêk bê? Bersiva vê pirsê dem bi xwe ye. Dem bi giştî wekî borî, niha û bê xwedî sê rengdêran e. Eger lêker pêk hatibe bi dema borî û ya pêkhatinê be bi dema bê û di ewra pêk hatinê da be bi dema niha tê kişandin. Dem jî di zimannasîyê da wekî morfem ku pîranîya wan qertaf in xuya dîkin.

Di rêzimanên kurmancî da dem digel her sê demên navborî bi hejmarên xwe dibin warê lêkolînê. Hejmara deman, pênase û taybetîyên deman, demên hevpar yên ku îro di kurmancîya nivîskî da kêr zêde bi cih bûne, varyantên deman û demên herêmî hêjayî lêkolînê ne.

1. Mijara Tezê

Mijara vê xebatê demên devoka Torê (bi mînaka gundê Xerabê Bena) ye. Di vê xebatê da li bersiva van pirsan hatiye gerîn: Li herêma Torê kîjan dem hene? Taybetîyên morfolojîk û erkên wan deman çi ne? Awa û rewşên awarte yên wan

¹ Wekî kurdî, inglîzî, erebî û her yek ji hemû zimanan.

deman eger hebin çi ne? Têkilî di navbera deman da hene yan na? Ew dem li ser xeta demê dikarin çawa bîn nîşandan? Lêkerên ku bi qertafên lêkeran hatine formulîzekirin xwedî xuyangên çawa ne? Têkilîyên dem û xuyangê çi ne? Kêşanên lêkeran yên ku ji bilî lêkeran li ser bêjeyên din tên kirin kîjan in û taybetîyên wan çi ne? Rewşên herêmî yên ku di kêşana lêkeran da derdikevin pêşîya mirov çi ne? Ji tesbîtên ku di vê xebatê da hatin kirin kîjan herêmî ne?

Du sînorên mijara vê xebatê hene: Yek ji wan devoka Torê ye ku di vê xebatê da bi mînakê gundê Xerabê Bena derbas dibe. Sînorê din jî demên lêkeran in. Di xebatê da ev her du sînor hatine parastin. Wekî nimûne: Digel pevguherîna deman di navbera xwe da, pevguherînên di navbera dem û raweyan da jî hatin çavdêrîkirin. Lê ji ber ku rawe ne ji mijara vê xebatê ne bi tenê ya di navbera deman da ketiye nav mijarên vê xebatê û ya ku di navbera dem û raweyan da pêk tê di vê xebatê da cih negirtiye.

Ev xebat bi rêzê ji pêşgotin, kurte, destpêk, çar beşan, encam, çavkanî û pêvekan pêk tê. Di destpêkê da mijar, girîngî, rêbaz û çavkanîyên teze hatine vegotin. Di beşa yekem da derheqê têgehên sereke yên têkildarî mijarê da agahî hatine dayîn. Têgehên wekî lêker û kêşana lêkeran hatine şîrovekirin. Dîsa di vê beşê da herêm û devoka Torê û gundê Xerabê Bena hatine danasîn. Mijara beşa duyem demên borî ne. Ev beş ji çar binbeşan pêk tê ku her binbeş demeka borî pêk tîne û ya pêşî dema borîya têdeyî ye. Her yek ji binbeşan di du xalan da hatiye nivîsîn. Di xalên yekem da morfolojî û erka demekê ya di kurmancîya nivîskî da hatiye dayîn. Di xalên duyem da taybetîyên wê demê yên ku di vê xebatê da hatin çespandin hatine nivîsîn. Divê bê gotin ku tesbîtên vê xala duyem di çarçoveya vê xebatê da li ser devoka Torê hatine kirin ne ku bi tenê yên devoka Torê ne. Di vê xalê da hem taybetîyên herêmî hem jî taybetîyên bi kurmancîya nivîskî ra hevpar cuda cuda hatine destnîşankirin. Heman rêbaza jorî ji bo hemû demên ku di vê xebatê da cih girtine hatiye meşandin. Dema niha bi serê xwe beşa sêyem pêk tîne. Beşa çarem jî dîsa bi serê xwe ji dema bê pêk tê.

Di beşa encamê da taybetîyên sereke yên demên devoka Torê yên ku di vê xebatê da hatin çespandin di dawîya van beşan da wekî encam hatine dayîn. Dûra

çavkanîyên ku ji wan hatiye sûdgirtin tên. Piştî wan di beşa pêvekan da metnên gelêrî yên vê xebatê, ferhengoka metnên gelêrî, nexşe û wêneyên herêmê hatine dayîn.

2. Armanç û Girîngîya Tezê

Armanca sereke ya vê xebatê danasîna demên lêkeran di devoka Torê (bi mînaka gundê Xerabê Bena) da ye. Ji vê xebatê dîsa tê hêvîkirin ku cudahîyên devoka Torê yên bi mijara vê xebatê ra têkildar tesbît bike û eger di pêş da neşxeya zimanî çî ya kurdî çî ya kurmançî û çî jî ya herêmê bê çêkirin jê bê sûdwergerin. Ev xebat di vî warî da valahîyekê dagire.

Bi qasî ku hat çespendin berî vê xebatê li ser demên Torê nehatiye xebitîn. Wisa tê hêvîkirin ku ev xebat dê di mijara demên Torê da bibe ya yekem û di pêş da ji bo xebatên zimannasîyê yên ku li ser demên Torê yan jî yên berawirdî yên ku Tor jî di nav wan da be bibe çavkanîyek. Gelek caran mirov nikare dewlemendiya zimanê devkî derbasî zimanê nivîskî bike. Ev yek jî girîngîya xebatên devokê derdixe holê û bi xêra wan mirov dikare van dewlemendiyan tesbît û mayinde bike.²

Tor ji alîyê morfolojîyê ve xwedî hin taybetîyan e ku bi van taybetîyan jî kurmançîya nivîskî vediqete. Çendî ku van salên dawî di rastnivîsa kurdîya kurmançî da ji alîyê yekrêzîyê ve pêşveçûn çêbûbin jî cudahîyên herêmî yên ku di nivîsê da jî xuya dikin ji holê ranebûne. Ev jî bo zimanekî nivîskî pirsgerêkek e. Carinan tê dîtin ku nivîsên kesên ji heman herêmê jî di hin xalan da ji hev vediqetin. Eger taybetîyên herêman bîn çespendin dê xalên hevpar jî bîn dîtin û rê li ber nivîseka standart bêhtir vebe. Tê hêvîkirin ku ev xebat bi rêbaza zanistî taybetîyên xasî herêma Torê û bi wan ra jî taybetîyên kurdîya kurmançî yên hevpar tesbît bike. Di vê xebatê da bi dayîna hevokên nimûne yên Torê û kurmançîya nivîskî li bal hev, hêviyeka wiha tê kirin: Dibe ku ev xebat ji bilî mijara vê xebatê li ser mijarên din jî ji bo danberheva devoka Torê û kurmançîya nivîskî yan jî devoka Torê û devokên din bibe çavkanîyek.

3. Rêbaza Tezê

Ev xebat xebateka zimannasîyê ye. Di nav xebatên zimannas da dikeve warê xebatên teşenas. Di xebatê da sîstema erkparêz derdikeve pêş. Bi zimannasîya şayesî

² Çetin Taş, **Dengsazîya Devoka Çaldiranê**, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2015, r. 5.

hatiye kirin. Bi gotineka din di vê xebatê da wênegirtina rewşên zimanî hatiye kirin. Eger hebin jî nirxandinên wekî çespendina şaşîyan û duristkirina wan ne bûye mijar û ne jî bûye armanca vê xebatê. Loma jî di vê xebatê da heta ku ji dest hat ji zimannasîya şayesî nehatiye derketin. Metoda sereke ya xebatê ev e digel vê di vê xebatê da danberheveka xwezayî jî heye. Digel ku danberheveka birêkûpêk ne ji rêbazên vê xebatê jî be bi armanca naskirina taybetîyên herêmê xalên herêmî ku di kurmancîya nivîskî da cuda xuya dikin hatine destnîşan kirin. Bi vê armancê li binê hevokên nimûne kurmancîya wan ya nivîskî jî hatiye nivîsîn.

Di vê xebatê da du rêbazên sereke yê zimannasîyê hatine bikaranîn: zimannasîya teşeparêz û zimannasîya erkparêz. Ya teşeparêz girîngîyê bi tenê dide rêzikên teşegirtina bêjeyan. Ya din jî rêbaza erkparêz ku girîngîyê dide erka ragihandinê ya ziman û digel teşeyê tim peywendê li ber çavan digire. Ji ber ku rêbaza teşeparêz têrî şayesandina rewşên zimanî hemûyan nake rêbaza erkparêz di vê xebatê da bêhtir derketiye pêş.

Taybetîyên herêmê ji kesên herêmê bi rêya qeydîyên dengan ku di zimannasîyê da wekî hevpeyvînên zimannas³ tên pênasekirin hatine wergirtin û danasîn. Di hîlbijartina kesên çavkanî da ku di vê xebatê da wekî vebêjer cih girtine ev li ber çavan hatin girtin: Ji ber tesîra zimanên din kesên ku temenê wan mezin e hatin hîlbijartin ku di zarokatî û ciwanîya xwe da tesîra zimanên din kêmtir li ser wan çêbûye. Kesên ku di ziman û çîrokbêjîyê da şareza ne. Kesên ku ne bi kurmancî û ne jî bi zimanekî din nanivîsin û naxwînin hatine hîlbijartin.

Du sedemên hîlbijartina devoka Torê û gundê Xerabê Bena ji bo vê xebatê hene: Yek ji wan ew e ku kesê ku ev xebat kiriye axiverê xwezayî (native speaker) yê devoka Torê ye. Ev destkeftî di pêvajoya bi awayekî saxlem derbaskirina metnan bi ser nivîsê da û di cihên ku hewce dikir di dayîna hevok û formên nimûne yê herêmê da hat bikaranîn. Sedema duyem jî ew e ku gundê Xerabê Bena ji aliyê axaftina xwe ve dikeve nav devoka Torê û nimûneyeka guncan e ji bo devoka Torê ku di beşa yekem da hatiye danasîn. Sedema vê sedema duyem jî ew e ku ji axaftinên kesên cûrbicûr yê herêmê û nîşeyên di pirtûkên rêziman da yê li ser herêmê hat

³ Bnr. Beşa Zimannasîya Şayesî

çespandin ku di bin devoka Torê da hin şêweyên axaftinê (bindevok) hene.⁴ Gundê Xerabê Bena jî ji alîyê taybetîyên axaftinê ve dikeve nav devoka Torê ku ji Heskîfê digihîje heta Hezexê.

Demên ku bûne mijara vê xebatê di nav sîstema navnetewî ya deman da hatine danasîn û ev dem li ser xeta demê ya ku ji alîyê piranîya zimannasan ve tê bikaranîn hatine şayesandin. Demên ku bûne mijara vê xebatê ji alîyê xuyanga lêkeran ve bi giştî ya ku sê cûreyan di xwe da dihevine (temam, berdewam û adetî) hatine pênasekirin. Ji bo famkirin û naskirina sîstemên xuyangê hem ji xebatên orijînal (inglîzî) hem jî ji xebatên ku bi zimanên din hatine nivîsandin hat îstîfadekirin. Wekî nimûne tirkî, kurdî.

Ev xebat ji bo ku ji mijara xwe veneqete, neketiye nav nîqaş û tevlihevîyên termînolojîyê ku ev di kurmancî da pîrsgirêkeka mezin e. Wekî nimûne Deham Ebdulfettah ji bo lêkerê navê kar pêşnîyaz dike û ji bo vê pêşnîyazê hin şîrove û delîlên maqul tîne.⁵ Li alîyê din li ber fikira ku lêker hêmana herî girîng ya hevokê ye dikare bê gotin ku tiştê ku hevokê lê dike yanî saz dike lêker bi xwe ye. Wekî ku li jor hat gotin ji ber ku vê xebatê tevlihevî û angaştên li ser termînolojîyê nexistine armanc ji xwe ra dê di vê xebatê da wekî lêker derbas bibe ku di piranîya xebatan da wiha cih digire. Ev rêgez heta ku ji dest hat di vê xebatê da ji bo termên din jî hat parastin û xebat di nav yekrêzîyeka rastnivîsê da hat kirin. Ji bo vê jî du tişt wekî pîvan hatin girtin: Yek termînolojîya Weqfa Mezopotamyayê ye. Ya din jî termînolojîya kurmancîya nivîskî ya hevpar e ku îro di hin xalên wê da angaşt safî bûne.

Di amadekirina vê xebatê da hin zehmetî hatin kişandin. Derbaskirina nivîsê ya metnên vê xebatê (MVX) pêvajoyeka zehmet bû. Lewra di hin cihan da hewce dikir ku mirov li ser hev hema hema bê hejmar guhdarîyê bike. Ji ber ku hin çavkanîyên sereke bi inglîzî bûn di îstîfadeya ji wan da hin zehmetî hatin kişandin. Di lêgerîna çavkanîyên têkildarî mijarê da zehmetîya ku ji neyekrêzîya termînolojîyê peyda bû karê famkirina mijaran kir zehmet.

⁴ Ji bo van du nimûne di beşa yekem da hatine dayîn. Bnr. Beşa Devoka Torê

⁵ Deham Ebdulfettah, **Mistek Ji Hêvî û Arîşeyên Zimanê Kurdî (Kurmancî)**, Lîs, Ankara 2018, r. 30-34.

4. Çavkanîyên Tezê

Çavkanîyên yekem heft heb qeydîyên deng in ku ji kesên ku niha jî dijîn hatine wergirtin. Ev deng ji bo xebatê bi ser nivîsê ve hatin derbaskirin. Deng heta ku ji dest hat tîp bi tîp hatin parastin û tu destwerdan yan kêmkirin û zêdekirin di wan da nehatin kirin. Çavkanîyên duyem jî gotar, tez û pirtûkên ku têkildarî mijarê ne. Hin ji wan çavkanîyan ev in ku ji wan bêhtir hat sêdgirtin:

Kürtçe Dilbilgisi, ya Bedirxan û Lescot: Di asta destpêkê da ji fikirên nivîskaran yên ku li ser mijarên ku têkildarî mijara vê xebatê ne hat sêdgirtin.

Rêzimana Kurmancî, ya Samî Tan û gotarên wî: Di pênasekirin û binbeşkirina mijarên rêzimanî da ji nivîskar hat sêdgirtin.

Dilbilim, ya Jean Parrot: Di naskirina zimannasîyê, rêbazên zimannasîyê û qabiliyeta ziman da ji vê berhemê hat sêdgirtin.

Kar, ya Deham Ebdulfettah: Di hûrgilîyên mijara lêkeran da bi giştî û demên lêkeran da bi taybetî ji nêrînên nivîskar hat sêdgirtin.

Teza doktorayê, ya Mikail Bülbül: Di pênasekirina rewşên awarte yên têkildarî mijara vê xebatê da ji nivîskar hat sêdgirtin.

Guman-I, ya Îbrahîm Seydo Aydogan: Di naskirina şaşî û tevlihevîyên li ser mijara vê xebatê û termînolojîyê da ji nivîskar hat sêdgirtin.

Genel Dilbilim-I, ya Özsoy û Turan: Di naskirin û famkirina sîstemên zimanî yên navnetewî yên têkildarî mijarê ji vê berhemê hat sêdgirtin.

Kovara Zendê: Ji gotarên kesên zimannas yên ku li ser mijarên spesîfik yên ku têkildarî mijara vê xebatê ne hat sêdgirtin.

BEŞA YEKEM: HERÊMA TORÊ Û TÊGEHÊN SEREKE YÊN XEBATÊ

1.1. HERÊMA TORÊ

1.1.1. Herêma Torê ji Alîyê Dîrokî, Erdnîgarî û Beşerîya Xwe ve

Xerabê Bena gundekî herêma Torê ye. Beşa ku ev gund jî lê dimîne wekî Tora Hevêrka jî tê naskirin. Li gor Farouq Ismaîl Tor bêjeyeka aramî ye, wateya wê çiya ye û di çavkanîyên bi alfabeya mîxî da wekî “ki-iş-ia-ri” derbas dibe.⁶ Dîroka herêmê jî îslamê kevintir e. Cibo di berhema xwe da ji bajarên ku li Torê ne vanan dijimêre: Mêrdîn, Midyad, Nisêbîn, Kercos û Hezex.⁷ Herêma Torê li Mezopotamyaya Jorîn û başûrrojhilatê Anadolê dikeve. Firehîya erdnîgarîya wê nêzî 10.000 km²i ye.⁸ Tan ji bo bajarên Torê behsa Heskîf, Kerboran û Stewrê jî dike û sînorên herêmê wiha dide naskirin.⁹ Li bakur sînorên Batman û Sêrtê û Çemê Dijleyê ye. Rojhilatê Dijleyê herêma Botan û Rojavayê wê Tûrabidîn e.¹⁰

Herêma Torê di çavkanîyên bi alfabeya mîxî da wekî çiyayê Kaşyari derbas dibe.¹¹ Tûrabidîn navê warê siryanîyan e û wekî navenda olî û civakî ya siryanîyan tê nasîn. Siryanîyên ku li gundên Torê dijîyan di salên dawî da ji herêmê koç kirine. Îro mirov dikare bibêje ku li gundên Torê êdî nemane. Di nexşeya¹² arşîveka (1530) dewleta Osmanî da herêma Torê bi navê Tûr li ser eyaleta Diyarbekirê xuya dike.¹³

Herêma Torê di nav xwe da hin herêmên piçûktir dihevine. Di navlêkirina van herêman da bi piranî taybetîyên erdnîgarî û avhewayê û carinan jî eşîr bûne faktor. Li gor agahîyên gundîyên Xerabê Bena gundên ku li ber Çemê Heskîfê li

⁶ Farouq Ismail (Hevdîtina taybet, Batman, 07.05.2019).

⁷ Nezîrê Cibo, **Havêrkan Sultanları-1**, Komal, İstanbul 2010, r. 22-24.

⁸ Şükran Yaşar, “**Mor Loozor Manastırı**” Mukaddime, h. 2 r. 119-130., 2010. r. 121.

⁹ Bnr. Nexşe 2

¹⁰ Altan Tan, **Turabidinden Berriyêye Aşiretler Dinler Diller Kùltürler**, Nûbihar, İstanbul 2015. r. 17.

¹¹ Hayat Erkanal, “**Mezopotamya'ya Açılan Kapı: Nusaybin**” Di Makalelerle Mardin I (Tarih-Coğrafya) da, edit. İbrahim Özcoşar, r. 1-16., 2007. r. 1-2. Vgz. Hüseyin Güneş, “**Tûr Abdîn Yöresinin İslamlaşma Süreci**” Şırnak Üniversitesi İlahiyat Fakùltesi İslâm Tarihi Anabilim Dalı 3, h. 6 r. 71-101., 2012. r. 72

¹² Bnr. Neşxe 1

¹³ Ahmet Özkılınç û yên din, **998 Numaralı Muhâsebe-i Vilâyet-i Diyâr-i Bekr ve 'Arab ve Zül'l-Kadiriyye Defteri (937-1530) I. Arşiv**, T.C. Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü Osmanlı Arşivi Daire Başkanlığı, Ankara 1998, r. 119.

alîyê başûr dimînin wekî gundên Beravê tên binavkirin. Devera ku gundên wekî Dêrdîlê, Xerabê Bena û Êsê û hin gundên din ku li başûrê Beravê dimînin wekî Sirtê tê binavkirin. Ji derdora Kerboran heta bi Midyadê jî wekî Tora Banî tê binavkirin û wekî cihên bêav, kênav û bi çalên xwe yê navdar tê naskirin. Ji Midyadê ber bi rojava û bakur ve heta nêzî Kercosê wekî gundên Mihelmîyan tê zanîn. Ji devera ku ji bakurê herêma Mihelmîyan di rojavayê Heskîfê ra ber bi Batmanê ve dirêj dibe ra gundên Hebizbinîyan tê gotin. Ji gundên ku li derdora çiyayên Rema ne ra gundên Rema tê gotin. Ji bilî yê ku li bakurê Heskîfê ne beşek ji wan gundanli başûrê Heskîfê yanî wekî erdnîgarî li nav herêma Torê dimînin.

Kesên ku li vê herêmê dijîn bi giştî wekî Torî tên nasîn. Li herêmê ji bo kesên ku ji van deveran in jî navlêkirinên wekî Beravî, Sirtî, Hebizbinî, Mihelmî, Remî û hwd. tên bihîstin. Ev navlêkirin li nav wan herêmên piçûk baş tên zanîn. Dibe ku li herêmên Torê yê dûrî van deveran ev navlêkirin tunebin yan jî cuda bin. Li gor Keskin di nav kesên ku li herêmê dijîn da digel siryanî, kurd û ereban kesên ku xwe di nav van koman da wekî seyîd, mihelmî û mitirb didin nasîn jî, peyda dibin.¹⁴

Taybetîyeka kesên Torî ew e ku ji herêma Torê belav bûne, derketine derveyê sînorên erdnîgarîya herêmê. Ev rewş carinan tevlihevîyan ji bo sînorê herêma Torê derdixe holê. Wekî nimûne li bajarê Batmanê û Qamişloyê jî Torî hene. Ev cihên navborî digel ku ne di nav sînorên erdnîgarîya Torê da ne, ji ber ku Torî li wan deveran dijîn taybetîyên devoka Torê li wan deveran jî xuya dikin. Mirov dikare bibêje ku sînorên devoka Torê ji sînorên erdnîgarîya Torê firehtir in û bi qasî sînorên erdnîgarîya wê nezelal in.

1.1.2. Gundê Xerabê Bena

Xerabê Bena¹⁵ gundekî li ser navçeya Kercosa Batmanê ye. Bi qasî 9-10 kîlometreyan li rojhilatê rêya Heskîf-Kercosê¹⁶ dikeve.¹⁷ Bi qasî şêst malî lê hene.

¹⁴ Necat Keskin, “Tûr Abdîn'de Bir Kimlik ve Anlatım Biçimi: Mıtırblar ve mıtırplık” Cyprus International University 21, h. 4 r. 57-72., 2015, r. 58.

¹⁵ Bi tirkî: Seki. Ev navê bi tirkî van 30-40 salên dawî li gund hatiye kirin. Bnr. Wêne 1

¹⁶ Bnr. Nexşe 4

¹⁷ Dema mirov ji Heskîfê diçe Xerabê Bena, piştî ku ji rêya Kercosê vediqete, di ber gundê Xirbê Smayîl û di nav gundê Dêrdîlê ra derbas dibe û digihîje Xerabê Bena.

Xerabê Bena ji du bêjeyan pêk tê: Xerab û Ben. Bêjeya xerab digel forma xirbê ji bo cih û warên kevin, şûnmayî, kavil û wêran tê bikaranîn. Li herêmê nêzî Xerabê Bena gundên ku di navê wan da ev bêje derbas dibe hene: Xirbê Smayîl, Xirbê Ta û Xirbê Mercîya.¹⁸ Ben têgeheka çandinîyê ye.¹⁹ Bêjeya benê li herêmê beramberî beşên rastkirî yên ku di erda hevraz da ji bo çandinîyê hatine çêkirin tê. Mirov dikare bi rehetî bibêje ku Xerabê Bena bi benên xwe navdar e. Lewra li hemû çiya û newalên li derdora gund ben hene. Li gor agahîyên gundîyan hin ji wan benan berî îslambûnê hatine çêkirin. Wisa tê zanîn ku navê gund yê tirkî (Seki) li ber wateya benê hatiye danîn. Divê ev jî bê gotin ku dengê –ayê yê li dawîya bêjeya benê (Bena) morfema pirjimarîya navdêran ya li herêmê ye. Kesên ku ji vî gundî ne xwe wekî Xerabenî bi nav dikin. Hin kesên ku ne ji vî gundî ne bi guhertina dengekî, wan wekî Xirabenî û gundên wan jî wekî Xirabê Bena bilêv dikin.

1.1.3. Devoka Torê

Devoka Torê li rojhilat bi devoka Botan û li rojava bi devoka Omerîyan û li bakur bi devoka herêma Bişêrîyê ra cîran e. Bi taybetîyên xwe ji van devokan vediqete. Di devoka Torê da hemû taybetî li hemû deveran tam ne wekî hev in. Ji alîyekî ve kesên ku taybetîyên devoka Torê bi wan ra hene hemû ne li herêmê dijîn. Ji alîyê din ve kesên ku li herêmê dijîn jî hemû taybetîyên devoka Torê di xwe da nahewînin. Hin taybetîyên devoka Torê yên sereke ev in ku ji ber qeydîyên metnan û çavdêrîyan hatine nivîsîn:

Li herêmê di lêkerên dariştî da morfema neyînîyê û ya diyê tê pêşîya pêşgirê.²⁰

Wekî: (ew) navexwê, (ti) divekê

Li herêmê ji bo kesê yekjimar yê sêyem lêkera *bûnê* bi *ayê* çêdibe.

Wekî: (ew) baş a

Ev taybetî di kêşana lêkerên resen da digel kesê yekjimar yê duyem jî tê dîtin.

¹⁸ Bnr. Nexşe 3

¹⁹ Zana Farqînî, **Ferhenga Kurdî-Tirkî**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul 2010, r. 115.

²⁰ Ev taybetî li nav eşîra Hebizbinîyan, tune û li cem wan wiha ye: (ew) venaxwa, (ti) vedika Cudahîyên girîng di navbera axaftina kesên din yên Torî û wan da hene. Ji ber ku ne mijara vê xebatê ye lazîm e ku xebatên spesîfîk li ser axaftina Hebizbinîyan (Li bakurrojhilatê herêma Torê herêmeka tampon e ji bo herêma Torê.) bên kirin û bê çespandin bê ka devok e ya bindevok e.

Wekî: (ew) çûya, (ti) bida

Di lêkerên ku di dema niha da hatine kişandin da qertafên kesên yekjimar yê duyem û yê sêyem bi *êyê* tên xebitandin.²¹

Wekî: (ew) dixwê, (ti) didê

Di lêkerên ku di dema bê da hatine kişandin da qertafên kesên yekjimar yê duyem û yê sêyem bi *êyê* tên xebitandin.

Wekî: (ew ê) çê, (tê) çê

Di devoka Torê da kesê duyem *tu* wekî *tiyê* xuya dike.²²

Li herêmê morfema pirjimarîyê *bêyî* dengê *nyê* ye.

Wekî: destê(n), mirova(n)

Ji bilî pevdenga *xwyê* mirov leqayî van her du pevdengan jî tê: *gw, kw*.

Wekî: gwehdar, gwêriz, kwêtandin, şekwîl

Di cihên ku ergatîf lê heye carinan tê dîtîn ku bireser ne xwerû lê tewandî bi kar tê:

Wekî: Min wê dît, Te wî anî

Ji bilî *yyê* dengê *wyê* jî wekî dengê kelijandinê xuya dike:

Wekî: Xwesûwa te hatiye, Ti çûwa ketiya heyra maçkirina ruwê xwa.

1.1.4. Xebatên Ku li ser Devoka Torê Hatine Kirin

Xebata Dehqan ya li ser devoka Torê ku û ji aliyê Filiz ve ji îngilîzî hatiye kurmancîkirin û bi navê “Gramerek”²³ Kurdî ya Garşûnîxet ji Bexdadê” wekî gotar hatiye weşandin xebata dawî ye ya ku hay jê çêbûye.²⁴

²¹ Ev form li nav Hebizbinîyan wiha ye: (ew) dixwa, (ti) dida

²² Bi tenê dema ku lêkera *bûnê* digire dawîya xwe carinan formeka wiha derdikeve holê: *Tû yî*

²³ gramer: rêziman

Mikaîl Bûlbûl teza xwe ya doktorayê li ser sazkirina hevok û komekan û peyvrêziya wan li ser devoka Mêrdînê kiriye û herêma Torê jî di nav vê devokê da wekî beşekê cih girtiye. Bûlbûl di vê xebata xwe da derheqê xebatên ku li ser devoka Mêrdînê hatine kirin van agahîyan dide:

“Du xebatên Hugo Makas (1897) devoka Mêrdînê têkildar dikin ku yek jê rasterast li ser devoka Mêrdînê ye (*Dialekte Aus Der Gegend Von Märdîn*) û gelek tekstên herêma Mêrdînê tê da cih digirin ku wergera wan jî tê da heye. Her wiha di dawîya wê xebatê da ferheng jî cih digire. Xebata Makas (1900) ya din jî (*Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gäwar; Jezidengebete*) her çend dîrekt ne li ser devoka Mêrdînê be jî, di asta fonolojîk û leksîkolojîk da berawirdkirina hin taybetîyên devoka Mêrdîn û Diyarbekirê tê da cih girtine. Ev herdû xebat di yek pirtûkê da hatine komkirin û di 1979an da li Amsterdamê dîsa hatine çapkirin [Makas, Hugo, 1979].

Xebateka din jî ya Eugen Prym û Albert Socin (1886) e û li Petersburgê çap kiriye, li ser devoka Tûr Abîdîn e ku beşek ji herêma Mêrdînê jî dikeve ber vê devokê. Di vê xebatê da gelek çîrok û kilam cih digirin ku rengvedana axaftina devera Mêrdînê pir tê da cih digire. Lê ne xebateka rêzimanî ye lê belê folklorîk e û ji ber ku tekstên wê demê hatine qeydkirin, gelekî giring e.

Dîsa du xebatên Helmut Ritter jî hene ku di 1968-9 û 1976an da çap bûne û li ser devoka Tor Abîdîn in. Ji ber ku qismek devoka Tor Abîdîn dikeve herêma Mêrdînê ev xebat jî bi awayekî îndîrekt ji bo xebatên li ser devoka Mêrdînê giring in.”²⁵

Li zanîngeha Mardîn Artukluyê di sala 2018an da tezeka lîsansa bilind bi navê Nomînal Morfolojiya Kurmanciya Herêma Torê, ji aliyê Ahmet Güneri ve hatiye nivîsandin. Li zanîngeha Mardîn Artukluyê di Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkîyeyê da di bernameya lîsansa bilind ya bêtez da li ser devoka Torê xebat hatine

²⁴ Mustefa Dehqan, “Gramerek Kurdî ya Garşûnîxet ji Bexdadê”, edit. Mehmet Şirin Filiz, Nûbihar h. 146, 2019, r. 6-11.

²⁵ Mikail Bûlbûl, *Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêziya Wan (Di Dîyalekta Jorî Ya Zimanê Kurdî Da - Devoka Mêrdînê)*, Teza Doktorayê, Zankoya Zaxoyê Fakûlteya Zanistên Mirovayetî Pişka Zimanê Kurdî, Zaxo 2017, r. 12.

kirin. Hin ji wan xebatan ev in: Xebata Ahmet Şimşek ya bi navê Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Kercosê De (Weku mînak Şeş Çîrokên Herêma Kercosê), xebata Mehmet Çoban ya bi navê Bikaranîna Rengdêran Li Herêma Midyad, xebata Bilal Bulgan ya bi navê Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran) Di Devoka Herêma Kercewsê De, xebata Enes Akıncı ya bi navê Bikaranîna Rengdêran Di devoka Kerboranê De (Weku Mînak Du çîrokên Herêma Kerboranê).

1.1.5. Xebatên Ku li ser Vê Mijarê Hatine Kirin

Heta niha tu xebatên ku rasterast li ser demên devoka Torê hatine kirin nayên zanîn. Digel vê di hin xebatên rêzimanî da derheqê demên vê devokê da hin nîşe tên dîtin: Wekî Nimûne di rêzimana Bedirxan û Lescot û rêzimana Cegerxwîn da di nav mijarên deman da derheqê devoka Torê (Hevêrkan) da hin têbînî hene.

Piştî venêrînê hat dîtin ku di sîstema Yöksisê da (Tez Tarama Merkezi) ya ku hemû tezên ku li zanîngehên li Tirkiyeyê hatine nivîsîn tê da cih digirin tu xebatên ku rasterast li ser mijara navborî hatine kirin nehatin dîtin.

1.2. TÊGEHÊN SEREKE

1.2.1. Ziman (Language)

Ziman amûra sereke ya têkilî û derbirînê ye. Mirov bi xêra ziman têkilîyeka fambar, aşkere datîne. Ji bo têkilîyeka zelal û bitesîr zimanê ku bi dengên saz dibe yê herî baş e. Li gor Aksan ziman sîstemeka pir pêşketî û pîralî ye ku di civakekê da bi alîkarîya hêma û rêzikên ku ji aliyê deng û wateyê ve hevpar in bi kêrî veguhestina fikir, hest û daxwazan ji kesên din ra tê.²⁶ Li gor Akhmanova (Ahanov) ziman amûra danûstandina fikiran û ragihandina navbera mirovan e.²⁷

1.2.2. Zarava û Devok (Dialect and Accent)

Di şêweya têkilî û derbirîna her mirovî da hin taybetîyên bi axiver ve girêdayî hene. Ziman bi awayekî gelek xurt bi axiverê xwe ve girêdayî ye. Hin ji van taybetîyan ku wekî guherte tên hesibandin carinan ji bo kes, malbat, bavik, gund, bajar û herêman jî derbasdar in. Bi kurtasî her koma mirovan ji aliyê ziman ve xwedî

²⁶ Doğan Aksan, **Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim**, Türk Dil Kurumu, Ankara 2009, r. 55.

²⁷ Kaken Ahanov, **Dil Bilimin Esasları**, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2013, r. 13.

hin taybetîyên hevpar e û bi van taybetîyên xwe ji komên din vediqete. Zimanên van koman li gor hindikbûn û zêdebûna xalên hevpar û cuda wekî devok û zarava tî dabeşkirin. Lê ji ber têkilîyên mirovan sînorên van devok û zaravayan gelek caran ne zelal in. Herwiha carinan navlêkirinên binbeşên zimanekî jî tevlihev in. Li gor Parrot ziman pir guherbar e û ev taybetîya wî rê nade ku mirov pîvaneka saxlem bi kar bîne. Bi ser da jî hemû cudahîyên cûrbicûr dema tî holê jimartin yekcar dijwar dibe.²⁸

Malbatên zimanan di nav xwe da zimanan dihevin. Ziman di nav xwe da zaravayan dihevin. Zarava jî binbeş dibin û devok ji zaravayan derdikevin. Dibe ku ev binbeşkirin li gor guherteyan bidome jî. Helbet hejmara van binbeşan li gor her zimanî tabloyeka cuda derdixe pêşîya mirov. Çi ziman çi zarava û çi jî devok bi sînorên tam diyar ji hev venaqetin. Ji van beşan di navbera du hebên cîran da herêmen tîkel hene. Li gor Demir jî devok li derveyî herêma ku bi wê ve girêdayî ne jî xuya dibin.²⁹ Saussure ji bo vê tîkelhevîya zimanan dibêje ku “Eger li Fransayê em ji Pas de Calaisê³⁰ ber bi Alpan ve bimeşin piştra jî heta bi Torînoyê³¹ biçin em nikarin leqayî noqteyeka wiha bibin ku em karibin bibêjin ku “Ez ji nav fransîzî derketim û derbasî îtalyanî bûm.”³²

1.2.3. Rêziman (Grammar)

Agahî û rêzikên ku ji bikaranîna ziman ya axiverên zimanekî tî bidestxistin rêzimana wî zimanî pêk tînin. Tan ji bo rêzimanê wiha dibêje “Rêziman, lêkolîn û lêhûrbûna li ser rêz û rêzikên zimanekî xwezayî ye.”³³

Li gor Parrot kategorîyên rêzimanî di nav xwe da dijberîya hev dikin û bi vî awayî tî nasîn. Di latînî da raweya xwestekî bi dijberîya raweya ragihandinê tî pênasekirin. Dijberî di hemû qadên zimanî da sisteman ava dikin. Sistemên her zimanî jî bi hev ra sistema sisteman ava dikin.³⁴ Li ber nimûneya Parrot mirov ji bo

²⁸ Jean Parrot, *Dilbilim*, Dost, Ankara 2006, r. 29.

²⁹ Nurettin Demir, *Ankara Örneğinde Ağzların Belgelemesi*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2013, r. 18.

³⁰ Bajarekî ku li bakurê Fransayê ye.

³¹ Bajarekî ku li bakurrojavayê Îtalyayê ye.

³² Ferdinand De Saussure, *Genel Dilbilim Yazıları*, İthaki, İstanbul 2014, r. 309.

³³ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015, r. 35.

³⁴ Parrot, *h.b.*, r. 122-123.

kurmancî dikare bibêje ku dema borî bi dijberîya wê ya bi dema niha û dema bê û raweyan ra tê pênasekirin.

Li gor Özsoy û Turan rêziman di zimannasîyê da bi sê cûreyan derdikeve ber mirov: rêzimana şayesî, rêzimana birêzik, rêzimana hînger. Rêzimanên şayesî yên ku ji alîyê zimannasan ve hatine nivîsandin hewl didin ku agahîyên ku ji alîyê axiverên zimanê zikmakî hatine hundirandin bidin nasîn.³⁵

1.2.4. Zimannasî (Linguistics)

Zimannasî ew zanist e ku li zimanên mirovan û têkilîyên wan û qabiliyeta ziman dikole. Zimannasî bi her alîyê ziman ve mijûl dibe. Li gor Parrot armanca zimannasîyê têgihiştina qabiliyeta ziman e ku di eslê xwe da yek tişt e lê wekî gelek zimanan bi rengekî pirjimar xuya dike. Li gor zanyaran qabiliyeta ziman yek tişt e û nûnertîya erkeka mirov dike: yekbûna naverokên fikir û dengên ku bi axaftinê derdikevin.³⁶

Lêkolînên zimanî di dîroka mirovayetîyê da digihîjin demên kevnar. Li gor hin zanyaran zimannasîya nûdem di dawîya sedsala 19. û destpêka sedsala 20. da dest pê kiriye. Bi zimannasîya nûdem xebatên li ser pêşveçûn û guherîna dîrokî ya ziman û balkişandina li ser taybetîyên ziman yên nûdem pêk hatine. Bi vî awayî jî bingeha zimannasîya binyadparêz (structuralist linguistics) hatiye avêtin.³⁷

Li gor Akhmanova (Ahanov) zimannasîya giştî dibe du beş: Zimannasîya hevdemî (synchronic) û zimannasîya dîrokî (diachronic). Ya hevdemî ji bo di demeka diyar da tesbîta taybetîyên ziman tê kirin û wekî zimannasîya şayesî jî tê zanîn. Ya dîrokî ji bo lêkolîna derketin û pêşketina zimanekî tê kirin.³⁸ Xebatên zimansîyê yên meydanî ji ber ku di demeka sînordar da tên kirin û taybetîyên ziman bi tenê yên di wê dema sînordar da diçespînin dikevin nav zimannasîya hevdemî. Herwiha xebatên ku li ser berhemên edebî bi armanca çespandina taybetîyên ziman yên dema nivîsandina berhemê tên kirin jî yên hevdemî ne. Ji bo zimannasîya dîrokî

³⁵ A. Sumru Özsoy û Ümit Deniz Turan, **Genel Dilbilim-1**, Anadolu Üniversitesi, Eskişehir 2017, r. 9-10.

³⁶ Parrot, **h.b.**, r. 11.

³⁷ Özsoy û Turan, **h.b.**, r. V.

³⁸ Ahanov, **h.b.**, r.13.

xebatên etîmolojîyê (etymologic) nimûneyên guncan in. Lewra vekolîna li ser pêşketin û guherînên zimanan yên dîrokî û danûstandinên di navbera zimanan da dikevin nav zimannasîya dîrokî.

1.2.5. Zimannasîya Şayesî (Descriptive Linguistics)

Zimannasîya şayesî di demeka diyar da bi danehev û şayesandina keresteyên zimanî ve mijûl dibe. Di zimannasîya şayesî da armanc danasîna ziman e. Nirxandinên wekî rast û çewt ji bo rewşên ziman di vê rêbazê da cih nagirin. Mirov dikare bibêje ku eger mimkûn be wênegirtina ziman e. Di zimannasîya şayesî da midaxele û şîrovevîyên şexsî wekî desttêwerdanê tîpîkî pejirandin. Li gor Parrot îro hem ji bo ku zimanên nû bîna nasîn hem jî ji bo serwextbûna pîrcûreyîya zimanên heyî hevpeyvînên zimannas bi awayekî berbelav tîpîkî bikaranîn.³⁹ Navborî ji bo şayesandina zimanekî jî wiha dibêje:

“Komkirina keresteyên hemû cûreyan bi ser hev da ne bes e. Zimanek sistemek e ku divê pergala wî bê famkirin û sazîyek e ku divê çarçoveya wî bê diyarkirin. Bêyî ku şayeseka saxlem û darîçav hebe em ne dikarin li zimanekî bi awayekî dîrokî bikolin ne jî dikarin lêkolîneka tîpîkî ya rastîn bikin. Ji bo şayeseka qenc şert e ku zimannasê şayesî serwextî hemû aliyên mijara xwe be. Zimannas ji bo ku mijarê hilde destê xwe divê rêbazeka teqez bipejirîne.”⁴⁰

Li gor Yozgat du sistemen sereke yên zimannasîyê hene: sistema teşeparêz û sistema erkparêz. Ya teşeparêz piştî xwe dide teşe û rêzikên teşegirtina bêjeyan. Peywendê li ber çavan nagire. Ya erkparêz jî girîngîyê dide erka ziman ya ragihandinê. Peywendê tim li ber çavan digire. Rêzimanê wekî lihevkerina teşe û wateyê dibîne.⁴¹

³⁹ Parrot, **h.b.**, r. 35.

⁴⁰ Parrot, **h.b.**, r. 41.

⁴¹ Umut Yozgat, “**Dilbilimde Biçimci ve İşlevci Düzlem**” Di Dilbilim Kuramları İki Düzlem Beş Kuram da, nivîskar Umut Yozgat, Özgün Koşaner, G. Songül Ercan û Yê din, edit. Özge Can, 33-83. İthaki, İstanbul 2018, r. 62.

1.2.6. Erdnîgarîya Zimannas (Linguistic Geography)

Erdnîgarîya zimannas ew tablo ye ku di encama dabeşkirina zimanekî bi ser zarava, devok û şêweyên axaftinê yên wî zimanî ve derdikeve holê. Encamên ku derdikevin li ser nexşeyan tîrî nîşandan ku ji wan ra nexşeya ziman tê gotin. Divê bê gotin ku ji ber tîkîlîyên mirovan sînorên devok û zarava heta carinan yên zimanan jî tevlihev in. Erdnîgarîya zimannas li pey danasîna xalên hevpar û cuda yên ziman û binbeşên zimanan e. Helbet ev sînorên navborî carinan guh nadin sînorên welatan. Tiştê herî girîng yê ku devokan ji hev vediqetîne astengên xwezayî yên erdnîgarî ne. Wekî çem, çiya û hwd.

Tiştên ku di amadekirina nexşeya ziman da li ber çavan tîrî girtin li gor Aksan ev in: cudahîyên dengan, yên rêzimanî, yên bêjesazî û heyîna ziman.⁴²

Di qada xebatê da hejmara cihên xebatê girîng e. Lewra çiqas zêde bin ewqas xizmetê ji bo amadekirina nexşeya ziman dîkin. Li gor Parrot Nexşeya Zimannasîyê ya Fransayê (1900-1912) bûye destpêka erdnîgarîya zimannasîyê ya ku Gilliémer û Edmont du hezar nexşe anîne bal hev û ji wan ev nexşeya yekbûyî bi dest xistine. Navborî awayê xebatê wiha dide naskirin: Pirs berê hatine amadekirin. Ev pirs heta ku derfet rê didin li gelek deveran tîrî pirsîn. Bersivên ku hatine dayîn tîrî komkirin. Ji bo her diyardeyê nexşeyeka cuda tê çêkirin.⁴³ Îro li gelek dewletan nexşeyên zimannasîyê tîrî çêkirin. Wekî nimûne Karahan ji bo dabeşkirina devokên tirkîya li Tirkîyeyê dibêje ku ev qad li gor qadên din pir hêdî dimeşe û ji bo ku atlaseka devokan bê amadekirin xebatên heyî tîrî nakin û di dawîya xebata xwe da cih dide bîst û heşt nexşeyan. Hin ji wan ev in: Kurtbûna Bêjeyên bi Dengdêrên Dirêj yên ji Zimanên Din Wergirtî, Devokên Sereke, Guherînên ku di Qertafa Dema Niha da Pêk Hatine.⁴⁴

1.2.7. Morfolojî (Morphology)

Morfolojî ji van her du bêjeyan pêk tê: morf û lojî. Yanî teşe û zanist. Morfolojî zanista teşeyên ziman e. Li gor zanyaran bi giştî sîstema zimanekî ji çar

⁴² Aksan, **h.b.**, r. 143.

⁴³ Parrot, **h.b.**, r. 35-36.

⁴⁴ Leylâ Karahan, **Anadolu Ağzlarının Sınıflandırılması**, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2017, r. IX.

qadan pêk tê: dengnasî, teşenasî, hevoknasî, watenasî. Li gor Saussure “Ziman ne cewherek lê formek e.” Ev pênase ji ber girîngî û rola teşeyê ya di ziman da hatiye kirin. Li gor Üçok teşenasî li ser van mijaran lêkolînê dike: Di zimanekî da kategorîyên bêjeyan kîjan in, çawa tên kişandin, dikevin nav formên çawa?⁴⁵ Bi kurtasî xebatên teşenas (morphological) li ser teşeya bêjeyan dixebitin. Teşeya bêjeyan jî ji morfeman pêk tê.

1.2.7.1. Morfem (Morpheme)

Morfem yekeyên bêjeyan yên herî piçûk in ku ji bilî dabeşkirina bi ser foneman ve êdî nayên parçekirin. Morfemek dibe ku ji fonemekê yan jî ji bêhtir foneman pêk hatibe. Tiştê ku dengê yan jî pirtir dengên ziman dixê morfem erka wan ya rêzimanî ye. Dibe ku morfem bêjeyeka bi serê xwe be û watedar be û dibe ku morfem ne bi serê xwe be û wateguhêr be. Wekî: *Mezin im*. Di vir da du morfem hene: *mezin* û *im*. *Mezin* bi serê xwe bêjeyek e û watedar e û ji alîyê erka xwe ya rêzimanî ve rengdêr e. *Im* ne bêjeyeka bi serê xwe watedar e. Ji alîyê erka xwe ya rêzimanî ve wateya dema niha ji bo kesê yekem yê yekjimar li rengdêra *mezinê* bar kiriye û bi vî awayî wateya wê diguherîne. Li gor ku Yılmaz ji Packe vediguhêze morfem dibin du cûre: morfemên peyvî (lexical) û morfemên rêzimanî (grammatical).⁴⁶ Di nimûneya jorîn da *mezin* morfemeka peyvî ye û *im* morfemeka rêzimanî ye. Morfemên rêzimanî bi du erkan bi bêjeyan ve didin. Yan ji bêjeyan bêjeyeka din saz dikin yan jî wateya bêjeyan diguherînin. Wekî nimûne: *Elî rabû û niha ji dikandar ra pereyan dijimêre*. Di vê nimûneyê da *-ra*, *-dar*; *-an*, *di-* du komên morfemên yên ji hev cuda ne. Morfema *-rayê* û morfema *-darê* ji bêjeyên *bûnê* û *dikanê* her yekê bêjeyeka din çêkiriye. Lê morfema *-anê* wateya pirjimariyê li bêjeya *pereyê* bar kiriye, û morfema *di-yê* jî bêjeya *jimartinê* bi dema niha kişandiye. Morfemên *-anê* û *di-yê* wekî morfemên *-rayê* û *-darê* peyveka nû çênekirine. Li gor Balcı morfem wekî mekîne û parçeyên mekîneyan li bêjeyan tên siwarkirin (monte) û ji wan tên jihevexistin (demonte) û bi vî awayî digel ku wateya xwe jî diparêzin dikarin li ser bêjeyên cuda yên ji heman cûreyî dubare bibin. Bi

⁴⁵ Necip Üçok, *Genel Dilbilim (Lengüistik)*, Multilingual, İstanbul 2004, r. 118.

⁴⁶ Ferhat Yılmaz, “*Teşenasî (Morphology)*” Di Gotarên Zimannasîyê da, nivîskar Barzo Mahmoud, Ferhat Yılmaz, Güneş Kan Yokuş û Yûn Din, edit Kenan Subaşı û Resul Geyik, 43-53. Nûbihar, İstanbul 2017, r. 44.

kurtasî morfem dubare dibin lê nayên parçekirin.⁴⁷ Wekî nimûne: **ji min, ji te, ji wan; bide, bixwe, biçe**. Di van her du koman da *ji û bi-* morfemên rêzimanî ne. Bêjeyên *min, te, wan; dan, xwarin û çûnê* jî morfemên peyvî ne. Di morfolojîyê da qeneeta giştî ew e ku her morfem bi kêrî yek erkê tê. Lê carinan rewşên ku derketine derveyî vê rêzikê jî tên dîtin. Wekî morfema vala, morfema sifir û morfema ku bi guherîna denga çêdibe. Ji bo ya sifir mirov dikare li van her du hevokan binêre: *Elî diçe, Fatê her roj diçe*. Di her du nimûneyan da tê dîtin ku di *lêkera çûnê* da du erkên cuda bi yek morfemê (*di-*) xuya dikin. Di vir da hevoka duyem jî alîyê erkê ve ne wekî ya yekem e lê ji bo vê guherteyê tu tişt li lêkerê zêde nebûye. Di zimannasîyê da jî vê rewşê ra morfema sifir (zero morpheme) tê gotin. Morfema vala ew morfem e ku bi kêrî tu erkê nayê. Morfema ku bi guherîna denga çêdibe wekî wanên din ne bi lêzêdebûna denga bi guherîna wan çêdibe.⁴⁸ Wekî nimûne: *Elî û Fatê û zarokên wan xwe berdan bajarê*. Di bêjeya *bajarê* da diyarkirin bi guherîna deng pêk hatiye. Hin morfem jî hene ku ji yekê zêdetir erkên zimanî bi wan pêk tên. Wekî: *Baş im*. Di vir da morfema *imê* jî bo bêjeya *başê* hem kesê yekjimar yê yekem diyar kiriye hem jî bêjeya *başê* jî alîyê demê ve bi dema niha ve sînordar kiriye.

1.2.7.2. Alomorf (Allomorph)

Ji awayên morfemekê yên ku li ber cudahîya denga çêbûne ra alomorf tê gotin. Alomorf wekî rengên cuda yên heman morfemê ne. Lewra tu tiştî li erk û wateya morfeman zêde nakin. Ji ber rewşên dengî peyda dibin. Mehmûd alomorfên wekî şeweyên morfeman pênasê dike.⁴⁹

- | | |
|------------------------------|-------------------------|
| 1. a. Ez xwendekar im | b. Ez mamoste me |
| 2. a. Tu xwendekar î | b. Tu mamoste yî |
| 3. a. Ew xwendekar in | b. Ew mamoste ne |

Di nimûneyên jorîn da hin alomorf xuya dikin ku cudahîya di navbera wan da bi tenê cudahîya dengên wan e. Ji alîyê erkê û wateya ku didin bêjeyan tu cudahî di

⁴⁷ Ayla Balcı, “**Biçimbilim-II: Sözcük Yapısı**” Di Genel Dilbilim-I da, nivîskar A. Sumru Özsoy, Ayla Balcı û Ümit Deniz Turan, edit. A. Sumru Özsoy û Ümit Deniz Turan, r. 94-118., Anadolu Üniversitesi, Eskişehir 2017, r. 95.

⁴⁸ Balcı, **Biçimbilim-II: Sözcük Yapısı**, r. 109.

⁴⁹ Berzo Mehmûd, **Rênivîsa Peyva Kurdî Likan û Nelikan**, Beyrût 2005, r. 184.

navbera wan da tune. Ji ber ku di xalên jorîn da nimûneyên b.yan bi tîpên dengdêr diqedin morfem jî li gor wan guherîye. Eger jî dêvla bêjeya *mamosteyê* ve bêjeya *karmendê* bê danîn alomorfên b.yan dê vegerin ser rewşa ku di nimûneyên a.yan da xuya dikin.

1.3. LÊKER Û KÊŞANA LÊKERÎ

1.3.1. Lêker (Verb)

Lêker ew bêje ye ku wateya bûyer, tevger û rewşan dide. Di hevokê da bêjeya ku hêmana herî girîng radigihîne lêker e. Ew hêman jî bûyer, tevger yan jî rewş (BTR) bi xwe ye. Mirov dikare bibêje ku lêker têgeha rêzimanî ya BTRyan e. Di hevokê da armanca sereke bi giştî ragihandina BTRYê ye. Kesê ku BTR pê ve girêdayî ye (biker), tişt yan jî kesê ku di bin tesîra bûyer û tevgerê da dimîne, cih û wextê pêkhatinê û hwd. hêmanên talî ne. Helbet dibe ku bi tercîha axiver carinan girîngîya van hêmanan biguhere lê ev, taybetîya lêkerê ya giştî naguherîne. Tan balê dikişîne ser girîngîya lêkerê û ji bo wê dibêje ku hevokeka bêlêker, hevokeka nîvçe ye.⁵⁰ Pênaseya li jor têra danasîna taybetîyên lêkerê nake û behsa potansiyela lêkerê dike. Divê bê gotin ku ji bo ku bêjeyek bibe lêker divê bê kişandin yanî bi hin qertafan ve bê girêdan. Ebdulfettah lêkerê wekî bêjeya ku “rûdan û demê bi hev ra dide” dide pênasekirin.⁵¹ Wekî nimûne *biserketin* wateya BTRYekê dide lê ev ji bo ku bibe lêker divê bi kesekî û demekê ve bê girêdan. Dema ku bi kes û demê ve tê girêdan ew lêker êdî dibe lêkera kişandî. Wekî nimûne: *Fatê di pêşbirkê da **bi ser ket**. Elî jî dibêje ku: Ez dê jî **bi ser bikevim**.*

Du taybetîyên sereke yên ku lêkeran ji bêjeyên din vediqetînin hene: Lêker wateya BTRyan didin. Lêker digel kesê biker, wateya demê yan jî helwesta bikerê ya li ser lêkerê (rawe) bi xwe ve digirin. Ji ber ku digel wateya BTRYê tê da dem heye mirov dikare bibêje ku ji bêjeyên jêrîn bi tenê bêjeya dawî (anî) lêker e: *kirin, bûn, avêtin, hilanîn, Elî **anî***. Di bêjeya *anîyê* da tevgerek heye ku bi destê kesê yekjimar yê sêyem di dema borî da pêk hatiye. Ev her sê taybetî di lêkera *anîyê* da hene. Bi taybetîyên kes û demê lêker di nav cûreyên bêjeyan da poleka bi serê xwe ava dikin. Di nimûneyên jêrîn da bêjeyên reşkirî lêker in.

⁵⁰ Samî Tan, “*Hinek taybetiyên lêkerên kurmançî*” Zend, h. Rêzepirtûk 13 r. 52-58., 2010, r. 52.

⁵¹ Deham Ebdulfettah, *Kar (Lêker)*, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2011, r. 15.

Zarok **diçin** xwendingehê. Dê nîvro ji bo firavînê **bên** malê. Piştî firavînê dîsa dê **vegerin** xwendingehê.

1.3.2. Mesder (Infinitive)

Mesder wekî jêderê lêkeran e ku di wê da potansîyela BTRyê heye. Ji forma lêkerê ya ku qertafên kes, dem û raweyan negirtiye ra mesder tê gotin. Mesder nakevin nav lêkerên kişandî. Ji alîyê cûreya xwe ve jî ne lêker in. Ji ber ku navên lêkeran in ji alîyê rêzimanî ve dikevin nav cûreya navdêran. Wekî nimûne *hatin, anîn, çûn, berdan, têkçûn, liberketin, derxistin, hilandin* mesder in. Di dawîya hemû mesderan da dengê *nyê* heye. Bûlbûl –*inê* wekî yekane mesdera kurmancî dide naskirin û awayên cuda yên mesderan bi paşgiran şîrove dike.⁵² Di nimûneya jêrîn da mesderek û lêkerek li bal hev xuya dikin: *Ez bi dîtina te kêfxweş bûm*. Di vê hevokê da *dîtin* ji ber ku qertafên kes, dem û raweyan nergirtiye mesder e. *Lê kêfxweş bûm* ji ber ku qertafên kes û demê girtine lêker e.

1.3.3. Kêşana Lêkerî (Verbal Conjugation)

Li jor hatibû gotin ku lêker wateya demê yan jî helwesta bikerê ya li ser BTRyê didin. Ev jî bi lêbarkirina qertafên kes, dem û raweyan pêk tê. Divê di serî da bê gotin ku ev qertafên navborî bi cûreyên bêjeyan yên ku ne lêker in ve jî dibin. Ev pêvajoyê wekî kêşana lêkeran (verb conjugation) tê binavkirin. Bozkurt ji bo kêşana lêkeran dibêje ku tevahîya formên lêkeran e û wê wekî kesandina lêkeran bi nav dike.⁵³

Li gor Ergin lêkera kêşayî ji van her sê hêmayan pêk tê: Yek ji wan reh û qurmê lêkerê ye. Ev beş di lêkerê da wateya bûyer, tevger yan jî rewşê dide. Parçeyek jî qertafa demê ye. Bi van qertafan ji bilî demê carinan dirûvê (rawe) lêkerê jî tê famkirin. Parçeyê sêyem jî qertafa kesane ye. Bi qertafên kesane bikerê lêkerê

⁵² Mîkaîl Bûlbûl, “**Rader (Mesdar)**” Zend, h. Rêzepirtûk 10: r. 103-104., 2008, r. 103.

⁵³ Aynur Bozkurt, **Kesandina Lêkerên Kurmancî**, Doz, Îstanbul 2008, r. 7.

diyar dibe.⁵⁴ Li gor Balcı kêşana lêkerî pêvajoya barkirina dem, xuyang, rawe, kes, avanî, neyînî, hejmar û cinsê li reh û qurmê lêkerê ye.⁵⁵

Ji bo nîşandayîna kêşana lêkeran mirov dikare li vê nimûneyê binêre:

Elî Fatê û zarokên xwe çûbûn sûkê û hêj jî nehatine malê

Di hevoka jorîn da du lêker hene: *çûn* û *hatin*. Ya pêşîn piştî reha xwe *—bûn* girtiye dawîya xwe. Bi *—bûnê* dem, xuyang, kes û erênî li lêkerê bar bûne. Li lêkera *hatinê* jî bi morfemên ku bi xwe ve girtine dem, xuyang, kes û neyînî bar bûne.

1.3.3.1. Kes (Person)

Kes (person) ji hêmayên lêkera kêşayî ye û tê dawîya lêkerê. Di lêkerê da beramberî kirarê tevgêrê û bûyerê yan jî xwedîyê rewşê tê. Di kurdî da şeş kes hene ku ji alîyê cûreyê xwe ve dikevin nav koma cihnavan: Ez, tu, ew, em, hûn, ew. Her sê hebên pêşî yekjimar û sêyên din jî pirjimar in. Kes ne şert e ku mirov be.

Kes ji bilî ku di hevokê da wekî bêjeyeka serbixwe tên di kêşana lêkeran da wekî qertaf piştî lêkerê tên. Di kêşana lêkeran da ji kesan mebest ne cihnav lê qertafên kesane ne. Dema kes tên dawîya lêkeran eger lêker lêkerekê resen be bi gotineka din eger wekî cûre lêker be pê ve tên nivîsîn. Eger ne lêkerekê resen lê ji cûreyekî din yê bêjeyan be û bi saya qertafên lêkeran hatibe kişandin hingê jî cihê tên nivîsandin. Yê ku bi bêjeyên wiha ku ne lêker in ve hatibin girêdan wekî kopulayê⁵⁶ (copula) jî tên binavkirin. Çi pê ve û çi jî cihê kes, li gor dawîya bêjeya ku pê ve tên girêdan xwe diguherînin. Mirov dikare wan wekî qertafên kesane û kopula wiha bide nîşandan:

Qertafên Kesane

1. ez **çûm**, tu **çûyî**, ew **çû** (**Ø**)⁵⁷ em **çûn**, hûn **çûn**, ew **çûn**

2. ez **hatim**, tu **hatî**, ew **hat** (**Ø**) em **hatin**, hûn **hatin**, ew **hatin**

⁵⁴ Muharrem Ergin, *Türk Dil Bilgisi*, Bayrak, İstanbul 1998, r. 281.

⁵⁵ Ayla Balcı, *Biçimbilim-III: Çekimsel Biçimbilim*, nivîskar A. Sumru Özsoy, Ayla Balcı û Ümit Deniz Turan, edît. A. Sumru Özsoy û Ümit Deniz Turan, r. 121-149., Anadolu Üniversitesi, Eskişehir 2017, r. 132.

⁵⁶ Bi tirkî jê ra dibêjin ekfiil.

⁵⁷ Ev nîşan ya morfema sifirê ye.

Kopula

1. ez xwendekar **im**, tu xwendekar **î**, ew xwendekar **e**
em xwendekar **in**, hûn xwendekar **in**, ew xwendekar **in**
2. ez mamoste **me**, tu mamoste **yî**, ew mamoste **ye**
em mamoste **ne**, hûn mamoste **ne**, ew mamoste **ne**

1.3.3.2. Dem û Wext (Tense and Time)

Dem (tense) di nav têgeha wext da tê pênasekirin û naskirin. Ji bo ku dem baş bê naskirin hewce ye ku pêşî wext û têkilîya wext û demê bê zanîn. Wext sîstemeka bêsînor e ku ji aliyê hemû mirovên cîhanê ve hatiye sazkirin. Lewra bingeha wê li ser ferzkirina mirovan ava bûye. Mirovan ji bo ku wext tayîn bikin ew xistiye beşên wekî sal, meh, roj, saet, deqîqe û hwd. Çendî ku li gor çand û mîletan ev dabeşkirin carinan hevûdu negirin jî îro beşên demê yê navborî bi awayekî navnetewî ji aliyê piraniya mirovan ve tên bikaranîn. Taybetîyeka din ya wext ew e ku mirov destpêk û dawîya wext nizane.

Dem (tense) wextê pêkhatina lêkerê ye. Dem têgeheka rêzimanî ye û nîşandayîna wext e. Bi lêkera xwe ve girêdayî ye. Pêkhatina lêkerê ji aliyê wext ve sînordar dike. Wekî wext ew jî wekî xetekê tê şayesandin ku ji aliyê çepê ber bi yê rastê ve diçe. Çendî ku mantiqa dem û wext wekî hev xuya bike jî divê neyên tevlihevkirin ji ber ku du tiştên cuda ne. Wext ji rêza dîrokî (chronology) ya yekeyên sal, meh û hwd. pêk tê. Lê dema rêzimanî bi tenê nîşandayîna wextê BTRyan e. Dibe ku hevûdu negirin lewra dem bi dabeşkirin û rêzkirina BTRyan ve têkildar e. Di wext (time) da nêzîkbûn yan jî dûrbûna demên lêkeran nikarin teqez bîn nîşandan. Bi tenê eger dem bi hev ra li ser xeta demê bîn şayesandin yê ku di navbera wan da rêzek hebe dikarin bi rêzê bîn nîşandayîn. Wekî nimûne mirov dikare BTRYeka ku îro danê sibehê pêk hatibe wekî *Fatê bir* û yeka ku dîsa îro danê êvarê pêk hatibe wekî *Elî biribû* ragihîne. Ev têkildarî demê ne û divê bi wextê navnetewî ve neyên tevlihevkirin.

Li gor piranîya zanyaran dem bi giştî dibe sê beş: borî, niha, bê. Di kurmancî da beşkirina hin zimannasên wekî Tan, Ebdulfettah û Ahmad jî bi vî awayî ye.⁵⁸ Digel ku hemû ziman ji alîyê hejmara demên rêzimanî ve ne wekî hev bin jî li ser xeta demê tevî cudahiyan xwe dikarin bîr nîşandan. Comrie jî wext wekî tîgeheka sêparçeyî teswîr dike.⁵⁹ Di dabeşkirina navborî da wextê borî wekî past, wextê bê wekî future û wextê niha jî wekî present di nivê her duyan da hatiye nîşandayîn. Givón li ser xeta demê digel her sê demên navborî bi navê hînbûn (habitual) demeka din di nav demên sereke da destnîşan dike.⁶⁰

Di kurmancî da jî dem bi giştî dibe sê beş: Demên borî, dema niha, dema bê.⁶¹ Loma jî di kurdî da BTRYek yan bûye û li milê çepê yê xeta demê dikeve. Yan dê bibe û li milê rastê yê xeta demê dikeve. Yan jî di pêvajoya pêkhatinê da ye ku li nivê her du alîyan dikeve. Mirov demên kurmancî li ser xeta demê dikare wiha nîşan bide.

Fîgur 1: Dabeşkirina Wext li ser Xeta Demê



Reh (Root)

Reh bingeha lêkera kişandî ye û wekî kok jî tê zanîn. Dema qertafên kes, dem û raweyan ji lêkera kişandî bîr avêtin rehên lêkeran dimînin. Bo gotineka din di kêşana lêkeran da qertafên kes, dem û raweyan bi ser reha lêkerê ve dibin û lêkera kişandî ava dibe. Wekî nimûne: *Elî pirtûkan dibe*. Di vir da *di-* qertafa dema niha ye, *-e* qertafa kesê yekjimar yê sêyem e. Dema mirov van her du qertafan dide alî di destê mirov da bi tenê *-b-* dimîne ku ew jî reha lêkerê ye. Di kurmancî da du reh hene: reha dema borî, reha dema niha. Reha dema niha wekî reha fermanî jî tê binavkirin. Reha dema niha hem di dema niha da û hem di dema bê da û hem jî di

⁵⁸ Tan II, *Du Xebatên Destpêkî Yê Bi Inglîzî Yê Rêzimana Kurmancî: Analîzeke Zimanzanî û Rêzimanî* r. 69.; Ebdulfettah, *Kar (Lêker)*, r. 124.; Baîz Omar Ahmad, *Têns Le Dîyalektî Jorî Zimanî Kurdî da Govarî Badînî*, Kolecî Edabî Zankoyî Selahaddîn, Selahaddîn-Hewlêr 1999, r. 5.

⁵⁹ Bernard Comrie, *Tense*, Cambridge University Press, Cambridge 2000, r. 2.

⁶⁰ Talmy Givón, *Syntax Volume I*, Cild 1, Jhon Benjamins Publishing Company, Amsterdam 2001, r. 286.

⁶¹ Ahmad, *h.b.*, r. 5.

raweyan⁶² da bingeha lêkerê pêk tîne. Lê reha dema borî di hemû demên borî da bingeha lêkerê pêk tîne. Demên kurmancî di warê rehan da dikarin wekî du koman bên dabeşkirin: Demên borî û demên din. Tan jî di gotara xwe ya ku kurdî û farisî dide ber hev da dibêje ku kurdî û farisî du-rayekî ne.⁶³ Mirov dikare rehên kurmancî li ser nimûneyên jêrîn di nav kevanekan da bibîne:

Reha dema borî: *Fatê digot (got), Elî hat (hat)*

Rehên dema niha: *Zarok diçin (ç), Mamoste dê bibêje (bêj), Divê ez bixwim (xw)*

Reh û qurm (stem) tu tiştên ji hev cuda ne lê têkildar in. Dema ku rehê lêkerê qertafeka bêjesaz bi xwe ve bigire êdî ew dibe qurm. Çawa lêkerên ku di forma reh da ne tên kişandin qurm jî tên kişandin. Bi gotineka din ji bo qurman mirov dikare bibêje ku lêkerên dariştî ne.

1.3.3.3. Dem û Xuyang (Tense and Aspect)

Dem û xuyang⁶⁴ (aspect)⁶⁵ du têgehên cuda ne lê têkilîyeka xurt di navbera wan da heye. Xuyang jî wekî demê derheqê wextê pêkhatina lêkerê da fikirekî dide mirov lê bi cudahiyeke ji demê. Xuyang ew e ku bê di çavê axiver da BTRYa ku bûye mijara hevoka axiver çawa xuya dike. Dem wextê pêkhatina BTRYê bi mirov dide zanîn lê xuyang çawabûna pêkhatina BTRYê bi mirov dide famkirin. Ji bersiva pîrsa “kengê pêk tê” bêhtir bersiva pîrsa “çawa pêk tê” dibe mijar û naveroka xuyangê. Yanî xuyang bersiva van pîrsan e ku ji bo BTRYê tên kirin: *Gelo temam bûye yan na?, Dewam dike yan na?, Dest pê kiriye yan na?, Xwedî pêvajoyekê ye yan na?, Dubare dibe yan na?* Wekî nimûne mirov dikare li ser van her du hevokan li taybetîyên xuyanga lêkeran binêre:

Elî hatibû: BTR qedîyaye û wekî BTRYeka temambûyî xuya dike.

Elî tê: BTR neqedîyaye û wekî BTRYeka berdewam xuya dike.

⁶² Rawe di vir da ji bo raweyên xwestekî hatiye bikaranîn.

⁶³ Samî Tan, “Hevrûkirina lêkerên xwerû û bingehîn ên kurdî û farisî” Zend, h. Rêzepirtûk 19 r. 96-104., 2012, r. 104.

⁶⁴ Di kurdî da wekî “libiwarî” jî tê zanîn. Ji **Rafik Sulaiman** (Hevdîtina taybet, Mêrdîn, 28.06.2019).

⁶⁵ Bi tirkî jî beramberî bêjeya “görünüş”ê tê.

Divê di serî da bê gotin ku li ber pirsên wekî yên jorîn dabeşkirin û şayesandina xuyangê li cem hemû zimannasan ne wekî hev e. Tan piştî ku têkiliya xuyangê ya di navbera dema borîya têdeyî û borîya temam da destnîşan dike xuyangê ji bo kurmancî wiha dabeş dike: adetî, berdewam, dubareyî, netemam û temam.⁶⁶ Comrie xuyangê bi giştî wekî temam (perfective) û netemam (imperfective) dabeş dike. Navborî xuyanga netemam wekî adetî (habitual) û domdar (continious) û ya domdar jî wekî berdewam (progresivve) û neberdewam (nonprogresivve) dike du cûre.⁶⁷

Wekî ku li jor jî hatibû gotin dem nîşandayîna wextê BTRYê ye û bi giştî dibe sê beş. Îcar xuyang ji bilî dema BTRYê hin taybetîyên wê bi mirov dide zanîn ku ev bi çawabûna BTRYê ve têkildar in. Di çavê axiver da bê BTR çawa xuya dike ew xuyanga lêkerê ye. Temam bûye yan temam nebûye? Dest bi pêkhatinê kiriye yan na? Domdar e yan na? Rasteqîn (realis) e yan ne rasteqîn (irrealis) e. Wekî nimûne li gor dabeşkirina bi dijberîya rasteqîn û nerasteqîn hemû demên borî ji ber ku pêk hatine rasteqîn in.

Li gor lêkolînên li ser mijara xuyangê û çavdêrîyên ku di vê xebatê da hatin kirin di kurmancî da xuyanga lêkeran bi giştî ji sê cûreyan pêk tê. Di vê xebatê da dê lêker ji aliyê xuyangê ve di çarçoveya van her sê cûreyan da bîna dabeşkirin: temam (perfective), berdewam (progressive) û adetî (habitual). Mirov ji bo danberhevê dikare li van her sê nimûneyan binêre:

Fatê taştê xwariye. (xuyanga temam)

Elî taştêyê dixwe. (xuyanga berdewam)

Zarok sibehan taştêyê dixwin. (xuyanga adetî)

Ji hevokên jorîn ji ber ku di hevoka yekem da BTR pêk hatiye, temam bûye yanî çûye serî lêker xwedî xuyanga temam e. Di ya duyem da ji ber ku temam nebûye, neçûye serî yan jî bo bi gotineka din dewam dike lêker xwedî xuyanga berdewam e. Di hevoka dawî da jî ji ber ku BTR wekî hînbûnekê dubare dibe ji aliyê

⁶⁶ Samî Tan, **Du Xebatên Destpêkî Yên Bi Inglîzî Yên Rêzimana Kurmancî: Analîzeke Zimanzanî û Rêzimanî**, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2018, r. 68.

⁶⁷ Bernard Comrie, **Aspect**, Cambridge University Press, Cambridge 2001, r. 25.

xuyangê ve adetî ye. Hem dem hem jî bi wan ra xuyang ji alîyê rêzimanî ve bi qertafên lêkeran saz dibin. Wekî nimûne di kurmancî da morfema *di*-yê dem û xuyangê bi hev ra li lêkera xwe bar dike. Wekî:

Zarok diçin. (dema niha-xuyanga berdewam)

Elî û Fatê diçûn. (dema borîya domdar-xuyanga berdewam)

Digel vê taybetîya xuyangê ku di qertafên lêkeran da xuya dike dibe ku xuyang bi bêjeyan jî bê çêkirin. Wekî nimûne mirov dikare bibêje ku *Zarokan duh saet ji şeşan heta heftan xwend*. Dema ku mirov bi tenê li lêkerê dinêre dibîne ku *xwend* di forma dema borîya têdeyî ye. Tu nîşanên berdewamîyê di lêkerê da tunin. Lê dema ku mirov bala xwe bide hokera *saet ji şeşan heta heftan* tê dîtîn ku lêker domdar e. Yanî xuyanga berdewam di lêkerê da heye. Di çavê axiver da BTR xwedî maweyekê ye yanî demekê dewam kiriye. Loma jî axiver hokera *saet ji şeşan heta heftan* li hevoka xwe zêde kiriye û xuyanga lêkerê ne bi qertafên lêkeran bi bêjeyan diyar bûye.

1.3.4. Pevguherîna Deman (Tense Shift)

Carinan tê dîtîn ku wate li dû morfolojîyê naçe. Lêkerên ku morfema demekê bi xwe ve girtine wateya demeka din didin. Yan jî yekê ji qertafên demê digirin lê wateya raweyekê didin. Baran bi navê pevguherîna raweyan ev rewş destnîşan kiriye.⁶⁸ Di vir da bi tenê rêbaza teşeparêz têrî pênasekirina vê rewşê nake û rêbaza erkparêz derdikeve pêş. Lewra rêbaza erkparêz di cihên wiha da dikeve pey erkê û pê ra jî wateyê. Wekî nimûne dema mirov bibêje *Fatê rojekê diçe ber mizgeftê* tê famkirin ku çûna Fatê pêk hatiye yanî di dema borî da ye. Ev jî bêjeya *rojekê* tê famkirin. Carinan jî ji tevahî yan jî beşeka ji metnê tê derxistin ku wate û form hevûdu nagirin. Bi taybetî di çîrok û serborîyan da dema ku ji bilî demên borî formên din tên bikaranîn ev bider (îstisna) pir xuya dikin. Herwiha dibe ku demên borî jî di nav hevûdu da şûna hev bigirin. Aktuğ ji bo vê rewşê balê dikişîne ser windakirina

⁶⁸ Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Belki, İstanbul 2012, r. 148.

wateya eslî û diyarkirina demeka din.⁶⁹ Ebdulfettah pevguherîna deman bi tercîh û mebesta axiver ve girê dide û van nimûneyan dibêje:⁷⁰

Zîn pirtûkê dixwîne. Telefonê bo wê lêda: Ka tu nehatî? Zînê got: Va ez **têm**.

Ma tu li kû mayî? (Zîn hêj neçûye) Va ez **hatim**!

Di her du nimûneyan da mebest dema bê ye lê form yên dema niha û borî ne.



⁶⁹ Halil Aktuğ, **Gramera Kurdî - Kürtçe Gramer**, Avesta, İstanbul 2013, r. 302.

⁷⁰ Ebdulfettah, **Kar (Lêker)**, r. 218.

BEŞA DUYEM: DEMÊN BORÎ

Lêkerên ku di wextê berê da pêk hatine bi demên borî tên ragihandin. Demên borî di kurmancî da xwedî hin taybetîyan in ku ew taybetî ne di demên din da ne jî di raweyan da xuya dikin. Ev cudahî di du xalan da berçav dibin: reh û ergatîvî. Reha demên borî ne wekî demên din û raweyan e ku di demên din û raweyan da reh heman reha dema niha ye. Wekî ku tê zanîn ergatîvî di demên borî da heye lê di her du demên din da tune. Ji ber van dikare bê gotin ku di kurmancî da demên borî jî xwe ra cîhanekê ava dikin û jî demên din vediqetin. Di vê xebatê da jî dem wiha hatine beşkirin: Demên borî, dema niha û dema bê. Ji ber ku beşkirina sêparçeyî ya demê li demên kurmancî dihat û beşkirina hin zimannasên wekî Tan, Ebdulfettah û Ahmad jî wiha bû di vê xebatê da sîstema demê ya sêparçeyî bi giştî wekî pîvan hat girtin.⁷¹

2.1. DEMA BORÎYA TÊDEYÎ (SIMPLE PAST TENSE)

2.1.1. Morfolojî û Erka Dema Borîya Têdeyî

Reha dema borî + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) ket + im

Dema borîya têdeyî di kurmancîya nivîskî da li ser reha dema borî bi qertafa kesane çêdibe. Lêkera vê demê di wextekî berê da pêk hatiye, tamam bûye. Mirov dikare dema borîya têdeyî li ser xeta demê wiha nîşan bide:

Fîgur 2: Nîşandayîna Dema Borîya Têdeyî li ser Xeta Demê



Bya ku li ser xeta demê di wextekî borî da hatiye bicihkirin bûyera ku berê pêk hatiye temsîl dike. Ji dema lêkerên ku berî niha dest bi pêkhatinê kirine û dîsa berî niha qedîyane ra dema borîya têdeyî tê gotin. Lêkerên ku bi dema borîya têdeyî hatine kişandin li ser xeta demê li milê çepê û berî noqtaya ku nîşana dema niha ye tên nîşandan. Axiver jî ber çend sedeman vê demê bi kar tîne. Yek ji wan ev e ku çî

⁷¹ Tan II, *Du Xebatên Destpêkî Yê Bi Inglîzî Yê Rêzimana Kurmancî: Analîzeke Zimanzanî û Rêzimanî* r. 69.; Ebdulfettah, *Kar (Lêker)*, r. 124.; Ahmad, *h.b.*, r. 5.

bûyer çî tevger û çî jî rewşa ku bûye mijara hevoka axiver berî niha pêk hatiye. Sedema din jî ew e ku axiver yan ew BTR dîtiye yan jî bi awayekî bêguman ji pêkhatina wê serwest e. Sedemeka din jî ew e ku tiştê ku berê pêk hatiye xilas bûye û çûye. Bi gotineka din ew BTR di nav sînoren dema pêkhatina xwe da maye. Mirov dikare ji bo dema borîya têdeyî li van hevokan binêre: *Fatê ji ber dîwar çû. Elî û zarokên xwe ji sîkê hatin*. Lêkerên çû û hatin di dema borîya têdeyî da hatine kişandin.

Dema borîya têdeyî bi kişandina lêkera *bûnê* ya borî jî tê bidestxistin. Di kurmancîya nivîskî da bi bêjeyeka ku ne lêker e, reha dema borî ya lêkera *bûnê* û qertafa kesane çêdibe. Mirov dikare morfolojîya dema borîya têdeyî ya bi lêkera *bûnê* wiha bide naskirin:

Bêjeya dijîlêker + Reha *bûnê* ya dema borî + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) xwendekar bûm

Bêjeyên ku ne lêker in (navdêr, rengdêr, cihnav û hwd.) eger bi lêkerên alîkar ra jî nebûbin lêker, di nav sîstema kêşana lêkerî da bi lêkera *bûnê* ku wekî kopulayê jî tê naskirin tên kişandin. Bi gotineka din piştî ku ew bêje lêkera *bûnê* digirin êdî wateya dem, kes, rawe, erênî û neyînîyê li wan bar dibe. Wekî nimûne mirov bibêje ku *Fatê azîb bû* tê dîtin ku digel ku ne lêkerekê resen e di bêjeya *azîbê* da ji wateyên navborî dem, kes û erênî hene. Ev jî bi saya *bûyê* yanî lêkera *bûnê* ya di dema borî da çêbûye. Mehmûd kopulayê wekî yek ji diyardeyên herî girîng di zimanên hindo-ewropî da dide nasîn.⁷² Ev taybetî di zimanên ewropî da bi tenê di şaxa germenîstîk (zimanên wekî almanî, inglîzî, flemenkî ku li rojavayê ewruxpa dimînin) da tê dîtin.⁷³

2.1.2. Bikaranîna Dema Borîya Têdeyî di Devoka Torê da

Bikaranîna dema borîya têdeyî ya li herêmê ji aliyê morfolojî û erka xwe ya sereke ve bi giştî wekî ya nivîskî ye. Lêkerên her sê nimûneyên jêrîn bi dema borîya têdeyî hatine kişandin. BTR hem di wextê berê da pêk hatine hem jî xilas bûne û çûne yanî tiştek ji wan nemaye di wextê niha da. Ev hevok di têkilîya axiver û BTRYê da ji hev vediqetin. Di hevoka ayê û cyê da axiver BTRYeka ku bi çavan

⁷² Berzo Mehmûd, *Kopyûle û Paşkok di Rîsta Kurdî û Hîndo-Ewropî de*, Sham 2012, r.12.

⁷³ Rafîk Sulaiman (Hevdîtina taybet, Mêrdîn, 28.06.2019).

dîtiye dibêje. Lê di hevoka byê da axiver BTR bi çavan nedîtiye lê ji pêkhatina bûyerê bi awayekî bêşik serwext e ku ev jî sedemeka bikaranîna dema borîya têdeyî ye. BTRYê nabîne lê fam dike ku pêk tê û wê piştî pêkhatina wê, radigihîne. Dizane ku navborî “xwe kiriye ber da” û ji bo ku famkirin û bi wê ra jî serwextbûna pêkhatinê bi guhdar (hearer) bide zanîn jî wekî ku dîtibe ji nav demên borî, borîya têdeyî tercîh dike. Axiver di vê nimûneyê da “mi go”yê jî li hevoka xwe zêde dike. Di vir da “mi go” wateyeka wekî *min fam kir ku* dide.

(1) a. Me’j xwa ra erse **kirî**. (1/140)

(Me ji xwe ra erse kirî.)

b. mi go: Ha’p Xwedê xwa **kira**⁷⁴ ber da. (1/242)

(min got: Ha bi Xwedê xwe kir ber da.)

c. Û’ d ceh de pêşî wê piştîyê xwa **kir**. (7/3)

(Û di cih da pêşî wê piştîyê xwe kir.)

Dema borîya têdeyî ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe li herêmê ji alîyê morfolojî û erka xwe ve, ji bilî formeka li herêmê ku dê di xala jêrtir da bê dayîn, wekî ya nivîskî ye. Mirov bikaranînên li herêmê dikare li ser nimûneyên jêrîn bibîne.

(2) a. Weka go’z ne’l dinyayê **bûm**. (1/206)

(Wekî ku ez ne li dinyayê bûm.)

b. Weka pakêtkê bû, ’d destê wê de **bû** (2/32)

(Wekî pakêtekê bû, di destê wê da bû)

c. Go Jinka Zêra jêhatî **bû**. (7/2)

(Go Jinika Zêra jêhatî bû.)

Di dema borîya têdeyî ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe da li herêmê formeka ne wekî forma giştî heye. Di vê formê da wekî morfemeka serbixwe *î* xuya dike. Li herêmê ji bo bikerên pirjimar û yên yekjimar yên zayendmê wekî *a* û ji bo kesên din yê yekjimar jî wekî *î* derbas dibe. Li herêmê bikaranînên wiha xuya dikin. Hevokeka

⁷⁴ Ev morfema *-ayê* ji ber ku bireser piştî lêkerê hatiye lê zêde bûye. Kêşan heman kêşana borîya têdeyî ye. Ev form dê di pêş da bê nasandin.

wekî *Elî li malê bû* li herêmê wekî *Elî î li malê bû* xuya dike. Yan jî hevokeka wekî *Zarokên Elî û Fatê li xwendîngehê bûn* li herêmê wekî *Zarokên Elî û Fatê a li xwendîngehê bûn* xuya dike. Divê bê destnîşankirin ku ev bikaranîn ne alternatîfa forma kurmancîya nivîskî ye. Li herêmê her du form jî hene. Li jêr hin nimûne û kurmancîya wan ya nivîskî ji bo rewşa navborî hatine dayîn.

(3) a. Ez î'1 Binê Biîka bûm. (1/429)

(Ez li Binê Biîka⁷⁵ bûm.)

b. Û vêce zaro jî a'd stûyê mi da bûn. (1/35)

(Û îcar zarok jî di stûyê min da bûn.)

c. Xwarin halo n'a'b têrayî bû. (1/49)

(Xwarin wiha ne bi têrayî bû.)

Lêkera *bûnê* ya resen ku ji alîyê ferhengî ve beramberî BTRyekê tê û wateya *bûyînê* dide û lêkera *bûnê* ya ku wekî kopulayê tê zanîn divê neyê tevlihevkirin. Wekî nimûne dema mirov ji bo yekî nexweş bibêje *Ew baş bû* ji peywendê tê famkirin ku başbûn di vir da lêker e yanî BTRyek e ku dikare wekî *Ew rehet bû* yan jî *Ew ji nexweşîyê xilas bû* jî bê gotin. Eger mirov ji pîrsa *Rewşa Fatê çawa bû?* ra wekî bersiv bibêje *Rewşa wê baş bû* tê famkirin ku di vir da *baş* rengdêra bêjeya *rewşê* ye. Helbet di vir da peywend girîng e ku di gelek cihan da erk û wateya morfeman bi wê diguhere.

(4) a. hema **peya bûn** emele, miştrîyê xwa danîn (1/245)

(hema peya bûn emele, mişterîyên xwe danîn)

b. Kêlîya go, neşxwa, teqlê mi **şist bûn** (4/31)

(Kêlîya ku, nejixwe, teqlên min şist bûn)

c. Dibê: Bajarê bavê te **xera bû**. (4/67)

(Dibêje: Bajarê bavê te xerab bû.)

⁷⁵ Çendî ku bêjeya Biîka di kurmancîya nivîskî da bi qertafa pirjimarîyê (n) tê nivîsîn jî ji ber ku navekî taybet e dest pê nehat dan.

2.1.2.1. Dema Borîya Têdeyî ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe

Carinan tê dîtîn ku lêker ne di forma dema borîya têdeyî da jî be wateya dema borîya têdeyî dide. Di nimûneyên wiha da di navbera deman da pevguherîn pêk tê. Wekî nimûne: *Elî duh diçe mala bavê xwe*. Di vê nimûneyê da tê dîtîn ku forma lêkera *çûnê* forma dema niha ye lê ji hokera *duh* tê famkirin ku BTR di dema borî da pêk hatiye. Digel hokeran ji peywendê (context) jî ev pevguherîn tê çespendin. Lê ji bo ku cudahîya form û wateyê bê çespendin gelek caran hewce dike ku mirov li peywendê binêre. Li jêr sê nimûne hatine dayîn û her sê jî ji bilî dema borîya têdeyî di formên din da ne lê wateya dema borîya têdeyî didin.

- (5) a. Rojekê ew jî **dibînê** wê qasekê **dibînê**, (2/41)
(Rojekê ew jî dibîne wê qasekê dibîne,)
- b. me **kiriya** wû **nekiriya** me dahf **daya** (1/195)
(me kiriye û nekiriye me dahf daye)
- c. Ew dibê: Mi **kuştîya**. Ew dibê: Mi **kuştîya**. (2/137)
(Ew dibêje: Min kuştîye. Ew dibêje: Min kuştîye.)

2.1.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî di Dema Borîya Têdeyî da

2.1.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Bêjeya Serbixwe ye

Di MVXyê da hin lêkerên ku bi dema borîya têdeyî hatine kişandin hene ku bi hebûna morfemê ji kêşana asayî (normal) vediqetin. Ev lêker morfema –ayê bi dawîya xwe ve digirin. Dema mirov bala xwe bi tenê dide van lêkeran dibe ku wan wekî lêkerên dema borîya temam bihesibîne. Lewra dema borîya temam jî li herêma bi giştî bi dengê *ayê* diqede. Lê hevokên navborî rewşeka awarte pêk tînin û di dema borîya têdeyî da ne. Tiştê sereke ku wan lêkeran ji yên borîya temam vediqetîne ev e: Lêkerên wiha piştî xwe biresereka nerasterast (ya ku piştî lêkerê tê) digirin. Digel vê taybetîyê peywenda metnê ku lêker tê da ye jî ji bo naskirina van lêkeran alîkarîya mirov dike. Aydogan ji bo vê morfema –ayê wiha dibêje: “Ev qertaf berê bûyerê

nîşan dide û bi tenê bi lêkerên berpêbûyinê (directionnel)⁷⁶ ve tê bikaranîn.”⁷⁷ Li jêr di nimûneyên wiha da ev rewş dê baştir bê dîtin.

- (6) a. Ew jî **birna** wê dirê. (5/86)
(Ew jî birin wê derê.)
- b. Xwedê’j bavê te ra jî nehêlê go di sêv anîn, **nekirna** sisê. (5/47)
(Xwedê ji bavê te ra jî nehêle ku du sêv anîn, nekirin sê.)
- c. Tûrikê xwa **kişanda** qahfê xwa (3/5)
(Tûrikê xwe kişand qafê xwa)

Li jêr ji nav MVXyê ji bo ku mirov lêkerên berpêbûyinî û yên din bide ber hev, du nimûne hatine derxistin. Taybetîya van her du nimûneyan ev e: Lêkerên di van nimûneyan da heman lêker in yanî wateya wan ya ferhengî yek e. Loma jî bi rêya wan cudahîya lêkerên berpêbûyinî û yên asayî di dema borîya têdeyî da dê baş bê dîtin. Di vir da divê peywend jî li ber çavan bê girtin lewra lêker heman lêker e.

- (7) a. **bûna** xwedîmewîj, em **bûna** xwedîpez, em **bûna** xwedîzaro (1/30)
(bûn xwedîmewîj, em bûn xwedîpez, em bûn xwedîzarok)
- b. Ê xwedîpez **bûn**,⁷⁸ xwedîdewar **bûn** û em xwedîmal **bûn**. (1/85)
(Ê xwedîpez bûn, xwedîdewar bûn û em xwedîmal bûn.)

2.1.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyinî yên ku Biresera Wan Cihnav Paşnûsek e

Di MVXyê da bireserên ku piştî lêkeran tên eger cihnav bin carinan bi dawîya lêkera xwe ve dizeliqin. Ji van ra cihnavên paşnûsek (enclitic pronoun) tê gotin. Ev rewş bi tenê ji bo bireserên ku kesê sêyem yê yekjimar in derbasdar e. Eger cihnav pirjimar be wekî *wan* û *van* ev rewşa bider pêk nayê. Divê bê zanîn ku çendî ku ji aliyê morfolojîya xwe ve cudahî di navbera kêşana lêkerên wiha û lêkerên asayî da hebe jî dem heman dema borîya têdeyî ye. Di nav MVXyê da di dema borîya têdeyî da nimûneyên van cihnavan pir in. Ji aliyê morfolojîya xwe ve kêşaneka wiha tê bi destxistin:

⁷⁶ Bi inglîzî directional e.

⁷⁷ Îbrahîm Seydo Aydoğan, **Guman-1**, Lîs, Ankara 2013/a, r. 61

⁷⁸ *Bûnên* di vê xala byê da ne lêkera *bûnê* ne, lêkera alîkar in.

(8) a. xelkê, xwedîyê wî **gotnê** go: (1/104)

(xelkê, xwedîyên wî gotinê gotin:)

b. Û wela mi avêtyê, ewk **ketyê** da. (2/86)

(Û wele min avêtê, ewk ketê.)

c. Go çeçmeq anî **dayê** da. (5/20)

(Go çeçmeq anî dayê.)

2.1.2.3. Xuyanga ku di Dema Borîya Têdeyî da bi Bêjeyan Çêdibe

2.1.2.3.1. Lêkera Çûnê

Di MVXyê da hin lêker hene ku bi dema borîya têdeyî hatine kişandin lê di nava peywenda hevoka xwe da wateya xwe ya ferhengî nadin û loma jî wekî lêkerekê kişandî nayên hesibandin. Ew derheqê çawabûna pêkhatina lêkera bingehîn da fikirekî didin guhdar. Yanî taybetîyeka xuyangî li lêkera bingehîn ya hevokê zêde dikan. Yek ji wan lêkera *çûnê* ye. Ev lêker ji alîyê morfemên ku girtine bi gotineka din ji alîyê binyada xwe ve wekî lêkerekê kişandî xuya dikan. Lê dema mirov bala xwe baş dide wan, dibîne ku ew bêje beramberî BTRYekê nayên. Bûlbûl di teza xwe ya doktorayê da di beşa Risteyên Aloziyê bi Lêkerên Espektîf da li ser van lêkerên disekine û vê lêkera *çûnê* ya ku bi dema borî hatiye kişandin wekî lêkera *çûnê* ya espektîf bi nav dike. Dûra dibêje ku lêkera *çûnê* ya espektîf wateya bidawîbûnê (terminative) anku temambûnê li lêkera bingehîn bar dike. Loma jî ev cûre lêker ne lêkerên bingehîn in.⁷⁹ Ji vir tê famkirin û dikare bê gotin ku di hevokên jêrîn da axiver bi bikaranîna lêkera *çûnê* wateyeka wekî qetî û bêveger li lêkera bingehîn bar dike.

(9) a. Tî bû, **çû** sewîlkê avê'b ser xwa dakir. (5/4)

(Tî bû, çû sewîlkê avê bi ser xwe dakir.)

b. Jinbavê **çû** bêbextî li mi kir. (5/71)

(Jinbavê çû bêbextî li min kir.)

⁷⁹ Bûlbûl, Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêziya Wan (Di Dîyalekta Jorî Ya Zimanê Kurdî Da - Devoka Mêrdînê), r. 116-119.

- c. mi **neçû** çar bacan jê neanîn. (1/67)
(min neçû çar bacan jê neanîn.)

2.1.2.3.2. Lêkera Rabûnê

Lêkerekê din ya xuyangî jî lêkera *rabûnê* ye. Bûlbûl ji bo vê lêkerê wiha dibêje: “Alîyê wê yê espektîf ew e ku destpêkirinekê nîşan dide û alîyê wê yê modal⁸⁰ jî ew e ku helwesta biryardarîyê û teşebusekê (attempt) îfade dike. Yanî hem destpêkirinek heye û hem jî di wê destpêkirinê da biryardarîyek û îradeyekê ku teşebusekê dike heye.”⁸¹

- (10) a. Go **rabû** keçik çû serê darekê ji xwa ra rûnişt û girî. (5/21)
(Go rabû keçik çû serê darekê ji xwe ra rûnişt û girîya.)

- b. Mi **rabû**, hema nan’b tenûrê ve hişt. (1/290)
(Min rabû, hema nan bi tenûrê ve hişt.)

- c. **Rabû** ew jî didinê. (2/13)
(Rabû ew jî didinê.)

Taybetîyeka din di vê lêkerê da heye ku bi giştî bêtî qertafên kesane tê bikaranîn. Bi gotineka din di forma kesê yekjimar yê sêyem da ye lê carinan jî tê dîtîn ku ev lêker qertafên kesane jî digire. Lê wiha jî be êdî ew ne lêkera resen e. Li jêr di nimûneya a, b û c yê da lêkera *rabûnê* wekî nimûneya di xala 10. da ji wateya xwe ya ferhengî derketiye û êdî wateya BTRYekê nade yanî ne lêkerekê asayî ye. Di nimûneyên jêrîn da peywendê hevok û metnan pir girîng e lewra lêkera *rabûnê* wateya xwe ya ferhengî ji dest dabe jî eger mirov peywendê li ber çavan negire dibe ku wan wekî lêkera resen bihesibîne.

- (11) a. Em **rabûn** wê şevê man (1/250)
(Em rabûn wê şevê man)
- b. E **rabûm**, ji wê derkê, çûma oda pîreka (1/350)
(Ez rabûm, ji wê derikê, çûm odeya pîrekan)

⁸⁰ rawetî

⁸¹ Bûlbûl, *Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêziya Wan (Di Dîyalekta Jorî Ya Zimanê Kurdî Da - Devoka Mêrdînê)*, r. 118.

- c. Axirê wêna e **rabûm** mi limêja eşayê kîr. (1/324)
(Axirê wê ez rabûm min nimêja eşayê kir.)

2.1.2.3.3. Lêkera Dîtinê

Lêkera *dîtinê* di MVXyê da carinan ji alîyê binyada xwe ve wekî lêkereka ku bi dema borîya têdeyî kişandî tevgerîyaye lê tê dîtin ku dem di wê da tune. Bi gotineka din bi forma dema borîya têdeyî lê wateyeka ji wê cuda dide. Dema mirov baş bala xwe dide nimûneyên jêrîn tê dîtin ku lêkera *dîtinê* ji wateya xwe ya ferhengî derketiye. Êdî wateya wê ne *dîtin* e. Ji mînak û peywenda wan tê famkirin ku ev lêker wateya *bi carekê ra yanî ji nişka ve* dide lêkera resen ya hevoka ku di nav da cih girtiye. Bi vî awayî rewşeka xuyangî li lêkera bingehîn ya hevokê bar kiriye.

- (12) a. **Û mi dî** marê reş ji devkê wê verişa (5/29)
(Û min dît ku marê reş ji devikê wê verişîya)
- b. Wê gihina devê min **û te dî** go mar hat (4/21)
(Dê bigihîjin devê min û te dît ku mar hat)
- c. Hê wilo, **me dî** me ereba Girbereşk hat. (1/244)
(Hê wisa, me dît ku erebeya Girbereşk hat.)

2.1.2.4. Lêkerên Cotmesder di Dema Borîya Têdeyî da

Taybetîyeka din ya devoka Torê heye ku digel dema borîya têdeyî di demên borî yên din da jî xuya dike. Lêkerên ku mesdera wan cot in, wekî nimûne *kelîn/kelîyan, geran/gerîyan* û hwd. li herêmê bi piranî wekî forma pêşî (kelîn, geran) ne. Wekî nimûne li herêmê forma *Fatê girî* xuya dike lê forma *Fatê girîya* xuya nake. Ev forma dawî di MVXyê da jî nehat dîtin. Carinan jî wekî forma duyem (kelîyan, gerîyan) xuya dikin lê di navbera kurmancîya herêmê û ya nivîskî da cudahîyeka wiha heye: Dengê yyê di van nimûneyan da wekî *hyê* derbas dibe. Forma dirêj bi tenê carinan xuya dike ne ku her tim wisa ye. Di xala jêrîn da ji nav MVXyê hin nimûne hatine derxistin. Her du nimûneyên pêşî ji bo forma yekem û ya din jî ji bo forma duyem in. Di nimûneya cyê da heman lêker li dû hev hem bi awayê yekem û hem jî bi awayê duyem xuya dike.

- (13) a. Go rabû keçik çû serê darekê ji xwa ra rûnişt **û girî** (5/21)

(Go rabû keçik çû serê darekê ji xwe ra rûnişt û girîya)

b. Birin textorik, deverik, tiştik nema **negera** (4/100)

(Birin textorek, deverek, tiştekan nema negerîya)

c. Ê mi dî marê reş ji devkê wê verişa **verîşaha** (5/29)

(Ê min dît ku marê reş ji devikê wê verişîya verişîya)

2.1.2.5. Lêkerên Awarte di Dema Borîya Têdeyî da

2.1.2.5.1. Lêkera Gotinê

Di nav MVXyê da lêkera *gotinê* ku hem bi hejmara xwe û hem jî bi wate û erkên xwe pir tê dîtin. Divê di serî da bê gotin ku *goya* ku gihanek e û di kurmancîya nivîskî da beramberî *kuyê* tê jî vê lêkerê divê bê veqetandin. *Goya* ku gihanek e ji peywenda hevokê bi hêsanî tê naskirin. Di nav MVXyê da di kêşana vê lêkerê da awayê *goyê* ji *gotê* berbelavtir e. Wekî nimûne li herêmê hevokeka wekî *Zaroka got* gelekî kêmtir e ji hevoka *Zaroka goyê*. Ji ber ku ji çîrokên gelêrî û serpêhatîyekê pêk hatine yanî behsa wextê berê dîkin di MVXyê da jî lêkera *gotinê* (awayê demên borî) pir e û carinan li ser hev jî tê dîtin. Di nava van hejmarên lêkera *gotinê* da yek hat çespendin ku ji wateya xwe ya ferhengî dûr ketiye. Vê dûrketinê dema lêkerê jî ji wê biriye. Dema mirov di nav peywendê da li wan dinêre dikare bibêje ku ev *go* hêmaneka çîrokbêjîyê ye û wateyeka wekî van wateyan dide: *Li gorî ku berê di(go)tin, Dihate (go)tin ku, Yê ku me ev çîrok jê bihîst di(go)t ku.*

(14) a. **Go** hebû nebû. (5/1)

(Go hebû tunebû.)

b. **Go** berê ew çemçik hebûn. (6/15)

(Go berê ew çemçik hebûn.)

c. **Go** go⁸² rabû **go** hevala wê ya pey ra, wê jî kir. (7/4)

(Go ku rabû go hevala wê ya pey ra, wê jî kir.)

Di nav MVXyê da tê dîtin ku lêkera *gotinê* di nav forma “me go”yê da jî carinan ji wateya xwe ya ferhengî derketiye. Di MVXyê da hevokên wiha di nav

⁸² Herçî ev *go* ye gihaneka *kuyê* ya li herêmê ye.

hevokên lêkdayî da cih digirin. Tê dîtîn ku *gotineka* rastîn (ya bi wateya ferhengî) di wan hevokan da tune. Dema mirov bala dide hevokan fam dike ku wateya wekî *me niyet kir ku, me xwest ku, me ji xwe ra wisa got ku* ji vê formê tê bidestxistin. Mirov dikare bibêje ku axiver di dilê xwe da ew tişt derbas kiriye û wekî ku ji xwe ra gotibe pêşkêş dike. Tiştê ku dibêje nîyet lê kiriye ne ku gotiye lê bi lêkera *gotinê* anîye ser ziman. Mirov dikare nimûneyeka wiha jî bibêje: *Ez çûm zanîngehê. Min got ez ê bibim mamoste. Lê mixabin min xwendina xwe neqedand.* Di vir da lêkera *gotinê* ji aliyê ferhengî ve wateya *gotinê* nade. Wateyeka wekî *Armanca/hêvîya min ew bû ku ez bibim mamoste.* dide. Ji ber ku di nav forma “me go”yê da lêkera *gotinê* bi wateya xwe ya ferhengî jî pir tê bikaranîn divê mirov baş hay ji peywendê hebe.

(15) a. **me go** de anî wê telefûn **kê** (1/274)

(me go de yanî dê telefonê bike)

b. **Me go** em ê xênî ava kin. (1/140)

(Me go em dê xanî ava bikin.)

c. **me go** em ê xanîyê xwa’l Edenê çêkin. (1/102)

(me go em dê xanîyê xwe li Edeneyê çêbikin.)

2.1.2.5.2. Lêkera Dîtînê

Lêkera *dîtînê* di nav MVXyê da du caran ji li derveyê erkên ku di vê xebatê da hatin çespasdin û bi wateyeka cuda hatiye bikaranîn. Di nimûneyên jêrîn da lêkera *dîtînê* bi kesê yekjimar yê duyem ra wateyeka wekî *tu jî dizanî* dide. Di nav vê forma xwe da lêkera *dîtînê* ji çarçoveya dema borîya têdeyî derketiye û biderek ava kiriye. Mirov dikare bibêje ku di vir da *dîtîn* êdî wateya xwe ya ferhengî nade. Herwiha bi vê guherînê lêkera *dîtînê* wateya dema borîya têdeyî jî ji dest daye. Di vir da *te dît* wateyeka nêzî *wekî ku tu jî dizanî* dide muxeteb ku ew jî kesê guhdar e. Di cihên wiha da axiver vê formê di erka bibîrxistin û pesendxwestinekê bi kar tîne.

(16) a. çîrokê berê, te **dît**, wilo bûn. (6/46)

(çîrokên berê, te dît, wisa bûn.)

b. Te **dî** berê dgotin digo: Pîrebok. (7/10)

(Te dît berê digotin digot: Pîrebok.)

2.2. DEMA BORÎYA TEMAM (PRESENT PERFECT TENSE)


2.2.1. Morfolojî û Erka Dema Borîya Temam

Reha dema borî + Paşgira partîsîp + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) ket + i + me

Dema borîya temam di kurmancîya nivîskî da li ser reha dema borî bi paşgira partîsîp⁸³ (participle) û qertafa kesane çêdibe. Lêkera vê demê ji ber ku qedîyaye ji aliyê xuyangê ve temam e. Mirov dikare vê demê li ser xeta demê wiha nîşan bide:

Fîgur 3: Nîşandayîna Dema Borîya Temam li ser Xeta Demê



B bûyera ku bi dema borîya temam hatiye ragihandin temsîl dike û tîra ku ji wê bûyerê derketiye, gihîştîye dema niha û sîya li bin tesîra bûyerê temsîl dikin. Dema borîya temam ji bo BTRYên ku berî wextê niha di demeka nediyar da pêk hatine û temam bûne lê di wextê niha da jî bi awayekî devam dikin tê bikaranîn. Divê di serî da bê gotin ku ev dewamkirin ne dewamkirina BTRYê yanî ya lêkerê ye. Tiştê ku ji lêkera borîya temam devam dike tesîra wê ye. Ew bi xwe temam bûye. Ji bo tevlihevîya navlêkirinan çênebe divê mirov temambûn û dewamîya vê demê baş ji hev safî bike. Dema mirov du kesan xeyal bike û bi dorê van hevokan bi wan bide gotin û li ser wan bifikire dê cudahîya her du hevokan bê dîtin: Mirovê pêşî dibêje ku *Fatê dew anî*. Yê duyem jî dibêje ku *Elî dew anîye*. Dema mirov van her du hevokan dibihîze bi carekê ra dizane ku bi tenê behsa anîna dew ya *Fatê* dike ku di demeka berê da ev kar pêk anîye, karê ku kiriye xilas bûye û hew. Lê dema ku mirov guhê xwe dide hevoka *Elî* dîsa pê ra pê ra dizane ku *Elî* jî dew anîye û wekî *Fatê* di demeka berê da ev kar pêk anîye, karê ku wî jî kiriye xilas bûye yanî lêker temam bûye. Lê cudahî ev e: Guhdar dizane ku dewê ku *Elî* anîye niha jî li cihê xwe ye. *Elî* ev kar kir lê axiver bi forma borîya temam tiştêkî wisa kir ku mirov êdî dizane ku

⁸³ Wekî weklêker jî tê zanîn. Bi tirkî jê ra sıfatfiil tê gotin.

dew li cihê ku *Elî* anîye disekine. Ev jî têkilîya di navbera dema borîya temam û wextê niha da nîşan dide. Lê ji bo dewê ku *Fatê* anîbû tiştekî wisa nikare bê gotin. Dibe ku li cihê xwe be û dîsa dibe ku ne li cihê xwe be jî. Rewşa rast çî dibe bila be guhdar ji vê agahîyê mehrûm e. Lewra di forma borîya têdeyî da dewamkirina tesîra bûyerê tune. Mirov vê têkilîyê dikare li ser vê nimûneyê jî nîşan bide: *Elî* tê devê polê û dibîne ku mamoste di polê da ye. Ji *Fatê* ra dibêje: *Semînerê dest pê kiriye*. Ji ber ku semîner niha dewam dike û *Elî* nizane bê ka kengê semînerê dest pê kiriye forma borîya temam bi kar tîne. Lewra dema borîya temam ji bo BTRYên ku di demeka borî nediyar da pêk hatine tê bikaranîn. Eger *Elî* ji *Fatê* ra gotibûna *Semînerê dest pê kir* dê bihata famkirin ku *Elî* di destpêka semînerê da hazir bû û dît ku semînerê dest pê kir. Ev jî cudahiyeke sereke ye ya di navbera her du demên navborî da.

Kurdo ji bo awayê vê demê dibêje ku di her du dîyalektan⁸⁴ da mîna hev in û partîsîpê wekî “navê biker” terîf dike.⁸⁵ Zaxoyî jî lêkera ku paşgira partîsîp girtiye dawîya xwe wekî lêkera temam bi nav dike.⁸⁶ Partîsîp ji rengdêrên ku ji lêkeran çêdibin ra tê gotin. Ev form bi lêzêdebûna morfema *-îyê* li ser reha lêkerê ya demên borî tê bidestxin. Wekî nimûne: helandî, paqijkirî, girtî, kuştî... Ev dem di inglîzî da wekî *present perfect tense*ê ye û bi forma lêkerê ya sêyem (verb 3) çêdibe. Dema mirov bala xwe dide forma di inglîzî da dibîne ku ew jî wekî kurmancî bi lêzêdebûna partîsîpê li ser reha dema borî tê bidestxistin. Muhammed ji bo inglîzî dibêje ku forma borîya dûdar di heman demê da wekî rengdêr jî tê bikaranîn û van nimûneyan dide: sold: firoî, done: kirî, written: nivîsandî / nivîsiyayî.⁸⁷ Di kurmancî da ev form bi paşgira *-îyê* tê bidestxistin. Lê di lêkerên dema borîya temam da hem di devoka Torê da ku nimûneyên wê di MVXYê da hene hem jî di kurmancîya nivîskî da ev paşgir (suffix) bi piranî bi dengê *-iyê* guherîye. Kurdo ji bo vê guherîna deng wiha dibêje: Di kurmancî da paşgira navên biker di van rewşan da jî nav diçe: ez hatime, te ez şandime, ewî em girtine. Di dîyalekta jêrîn da paşgira navên biker bi tu awayî ji

⁸⁴ Di vê berhema xwe da Kurdo rêzimana kurmancî û soranî bi awayekî berawirdî dide.

⁸⁵ Qanatê Kurdo, **Rêzimana Kurdî Kurmancî û Soranî**, Wer. Zülküf Ergün., Nûbihar, İstanbul 2013, r. 185.

⁸⁶ Îbrahîm Remezan Zaxoyî, **Rêzman a Kurdî Kurdish grammar**, Çapxaneya Hawar, Duhok 2007, r. 86.

⁸⁷ Husein Muhammed, **Rêzimana Inglîzî Bi Zimanê Kurdî English Grammar In Kurdish**, çapa elektronîk: <https://zimannas.files.wordpress.com/2015/07/rezimana-englizi.pdf>, 2013-2014., r. 63.

nav naçe û di awayê (û) yan jî (w)yê da ye. Kurmancî: ez ketime, tu ketiyî, ew ketiye, em/hûn/ew ketine Soranî: min kewtûm, to kewtûy(t), ew kewtû, ême kewtûyn, êwe kewtûn, ewan kewtûn.⁸⁸ Mirov dikare bibêje ku dema ku partîsîp dikeve nav kêşana borîya temam bi piranî vediguhêre dengê –iyê.

Ji bo ku cudahîyên di navbera borîya temam û borîya têdeyî da bibîne mirov dikare li van nimûneyan binêre. Ji bo van her du nimûneyan mirov bifikire ku du kes hene û di heman demê da axiver in: *Elî û Fatê*. *Fatê* dibîne ku balafir dadikeve û *Elî* nabîne ku balafir dadikeve lê rewşa balafirê ya daketî dibîne yan jî daketina balafirê ji hin kesan dibihîze. Yê dîtî (*Fatê*) dê bibêje *Balafir daket* û yê nedîtî (*Elî*) jî dê bibêje *Balafir daketiye*. Îcar pirs ev e ku qertafên –i û -(y)eyê⁸⁹ li lêkerekê ku bi dema borîya têdeyî hatiye kişandin çi bar dîkin? Du tiştan bar dîkin: Yek jê ew e ku axiver tenê bi lêzêdekirina qertafên –i û -(y)eyê bi guhdar dide famkirin ku ev agahî ne di bin dîtin, çavdêrî û pêzanîna wî da pêk hatiye. Dibe ku jê ra hatibe gotin yan jî bi awayekî din serwextî daketina balafirê bûbe. Ya din jî ew e ku li gor agahîyên axiverê hevoka *Balafir daketiye*, *balafir* hêj jî *daketî* ye yanî li cihê daketînê ye. Ji bo wî daketina balafirê êdî rewşeka nû ye û herwiha rewşa dawî ye. Dibe ku balafir ji nû ve bi hewa ketibe û dibe ku bi hewa neketibe jî. Rewşa herî dawî ya balafirê çi jî be axiver pê nîzane. Lewra paşî pê hisîyaye yan jî wî bi tenê tiştê ku ji wî ra hatiye gotin veguhastîye. Bi kurtasî dikare bê gotin ku axiverê hevoka *Balafir daketiye* wekî postevanekî ku zerfa li ber destê wî bêtî ku tiştêkî jê biguherîne vediguhêze xwedî, agahîya li ber destê xwe vediguhêze guhdar. Ne ku wî dîtîye, jê ra hatiye gotin. Loma jî agahîyên wî bi daketina balafirê sînorkirî ne. Ev rewşa ku di çavê axiver da bi agahîya bihîstî çêbûye heta ku axiver tiştêkî nû bibihîze yan bibîne jî dê dewam bike.

2.2.2. Bikaranîna Dema Borîya Temam di Devoka Torê da

Bikaranîna dema borîya temam ya li herêmê ji aliyê morfolojî û erka xwe ya sereke ve bi giştî wekî ya nivîskî ye. Ji bo bikaranîna dema borîya temam nimûneyên jêrîn ji MVXYê hatine girtin.

(17) a. neyarê ma **kuştina**. **Kuştîya** va ya'd vir da (4/24)

⁸⁸ Kurdo, *Rêzimana Kurdî Kurmancî û Soranî*, r. 186.

⁸⁹ Ev qertafa kesane (–e) li herêmê bi piranî wekî –ayê xuya dike. Yya berî wê dengê kelijandinê ye.

(neyarê me kuştine. Kuştiye va ye di vir da)

b. Mi soz pê ra *daya* û mi wî *anîya*. (2/221)

(Min soz pê ra daye û min ew anîye.)

c. Go: Wela keçika te'î mi *daya*. Parsuwê mi *şkandina*. (5/13)

(Got: Wele keçika te li min daye. Parsûyên min şikandine.)

Mirov dikare cudahîyên sereke yên di navbera dema borîya temam û borîya têdeyî da li ser MVXYê jî nîşan bide. Wekî tê zanîn dema borîya têdeyî wekî borîya nêz, borîya nêzborî jî tê binavkirin. Li gor ku di MVXYê da jî hat çespandin dikare bê gotin ku ji dema borîya têdeyî nêzîkbûnê wext teqez nayê bidestxistin. Lê mirov dikare behsa nêzîkbûna axiver û lêkerê bike. Yanî ev nêzîkbûn dikare wekî dîtîn, pêzanîn û jêserwextbûna axiver bê terîfkirin ne wekî nêzîkbûna wext. Pir normal e ku BTRYeka ku bi dema borîya têdeyî kişandî berî BTRYeka ku bi dema borîya temam kişandî pêk hatibe. Yan jî her du di heman wextî da pêk hatibin. Di vir da divê cudahîya wext û demê bê bibîrxistin.⁹⁰ Ev rewş di nimûneyên jêrîn da tê dîtîn. Dema mirov bala xwe dide xala ayê dibîne ku du lêkerên ku yek ji wan bi dema borîya têdeyî û ya din jî bi dema borîya temam hatiye kişandin tê da hene. Heman axiver her du lêkeran li bal hev dibêje û du formên cuda bi kar tîne. Axiver ji bilî pirjimarîkirina bikerê di wateya ferhengî ya hevokan da tu guherîn nekirine. Xaleka hevpar ya girîng ku ji peywendê tê bidestxistin ev e ku her du lêkerên xala ayê ji alîyê dîtîn û pêzanîna axiver ve wekî hev in. Ev yek di MVXYê da jî cihê ku hevoka nimûne jê hatiye girtin tê jî famkirin. Îcar dema mirov baş bala xwe dide her du lêkeran dibîne ku cudahîya ku axiver daye hevokê ne ji bo guherandîna demê ye. Tê famkirin ku axiver bikaranîna qertafên *-î* û *-(y)ayê* ji bo domandîna tesîra lêkerê li lêkera pêşî bar kiriye. Bikaranîna *-î* û *-(y)ayê* tesîra lêkera dema borî, wekî ku li ser xeta demê jî hatibû nîşandan, ji dema pêkhatina wê digire û bi heta wextê niha yanî wextê ku tê jiyîn vedizilîne. Yanî “Wî ji me re kiriye.” ne ku “Wî ji me re kir.” Cudahîya van çî ye? Wateyeka wiha di forma “Wî ji me re kiriye.” da heye ku di forma din da tune: Ew niha yekî wisa ye ku ji me ra kiriye. Eger forma “Wî ji me re kir.” bikaranîbûna dê guhdar famkiribûna ku berevajî forma din lêker pêk hat û çû,

⁹⁰ Bnr. Beşa yekem: Dem û Wext

wisa ma. Yanî di nav sînore dema xwe da ma, lêkera *kirinê* tevî tesîrên xwe negihîşt wextê niha yanî wextê axaftina axiver. Dema mirov li xala byê dinêre dibîne ku axiver pêşî lêkera dema borîya têdeyî û dûra jî lêkera dema borîya temam bi kar anîye. Tê dîtîn ku hem lêkera hatinê hem jî lêkera anînê bi hev ra pêk tên. Dema mirov xwe dixê şûna axiver fam dike ku axiver pêşî lêkera *hatinê* dibîne û piştra jî bi lêkera *anînê* dihise. Lê di nav van lêkeran da rêza dîrokî (chronology) tune. Axiver bi morfema *-i* û *-(y)ayê* dixwaze bi guhdar bide zanîn ku lêkera *anînê* nedîtiye yan jî di dema pêkhatina lêkera *anînê* da ne bi biker ra ye. Axiver piştra bi awayekî pê hisîyaye yan jî dîtiye ku biker bi xwe ra “Tursîlkeka wiha anîye.” (1/185) Dema mirov bi çavê axiver li BTRYan binêre dikare wiha bibêje: *Min ne dît ku anî lê dema ku hat di destê wî da bû. Bi gumana min wî anîye.*

(18) a. E dibê: Wî’j me ra **kiriya**, wa’j me ra **kir**. (1/139)

(Ez dibêjim: Wî ji me ra kiriye, wan ji me ra kir.)

b. Rojekê **hat** go wî tursîlkka halo **anîya**. (1/185)

(Rojekê hat ku tursîlkeka wiha anîye.)

Dema borîya temam bi giştî bi du erkan dixebite. Yek ji wan ya ku ji bo BTRYên ku tesîra wan dewam dike. Ya din jî ew e ku BTRYên ku axiver bi çavan nedîtine û bi rêya bihîstinê ji kesên din hîn bûye. Yanî BTRYên bihîstbar jî nav hemû demên borî bi vê demê tên ragihandin. Aydogan vê erka duyem ku bi forma borîya temam çêdibe bi dema bihurî ya medyatîfê nav dike û dibêje ku bi medyatîfê axiver xwe ji berpirsiyarîya agahîya hevoka xwe xilas dike.⁹¹ Medyatîfî termek e ku di ziman da bi agahîyên ku hatine bihîstin ra têkildar e. Li jêr jî MVXYê hin nimûne ji bo dema borîya temam ya bi awayê medyatîfî hatine dayîn.

(19) a. Wî jî eyn weka te **gotiya**. (4/7)

(Wî jî eynî wekî te gotiye.)

b. te **gotiye**⁹² “Wê jina mi zarokê guharzêrînk ji mi ra ênê.” (2/28)

(te gotiye ku “Dê jina min zarokên guharzêrînk ji min ra bîne.”)

⁹¹ Îbrahîm Seydo Aydogan, “**Medyatîf di kurdî kurmancî de: Vejîneke sîstema deman**”, Zend h. Rêzepirtûk / 20: r. 34-61., 2013/b, r. 34-46.

⁹² Ev morfema *-eyê* li dijî vê nimûneyê li herêmê bi piranî wekî *-ayê* xuya dike.

c. A sabîr a û a feqîr a û qerebalix **nekirya** (1/427)

(Sabîr e û feqîr e û qerebalix nekiriye)

Dema mirov di MVXyê da bala xwe dide BTRyên dema borîya temam ji bilî erka bihîstbarîyê hin erkên din jî tên dîtin. Wekî nimûne BTRyên ku di jîyanê da cara yekem pêk hatine yan jî yên ku piştî demeka dirêj pêk hatibin jî bi vê demê tên ragihandin. Dema mirov van her du nimûneyan bide ber hev cudahîya di navbera her du awayan da xuya dike. Hevoka pêşî ev e ku axiver bersiv daye yekî ku rewşa *Fatê* ji wî pirsîye: *Fatê çûye Zaxoyê* (Fatê ne li vir e niha lê li Zaxoyê ye.) Hevoka duyem jî ev e ku axiver bersiv daye yekî wisa ku dixwaze hîn bibe bê ka *Fatê* berî niha çûye Zaxoyê yan na: *Fatê çûye Zaxoyê* (Fatê yeka wisa ye ku berî niha çûye Zaxoyê bi gotineka din di emrê xwe da Zaxo dîtiye.) Divê bê destnîşankirin ku erka ku di hevoka duyem da xuya dike eger di ser kirina karekî da demeka dirêj derbas bûbe jî tê dîtin. Helbet di vir da jî peywendî pir girîng e lewra her du awa ji alîyê morfolojîyê ve wekî hev in. Li jêr ji nav MVXyê hin nimûne di nav peywenda hevoka xwe da hatine dayîn.

(20) a. Go: Maxerabê, ev sê meha çilo't **neçûya**! (1/159)

(Got ku: Malxerabê, ev sê mehan çawa tu neçûye!)

b. Ma te **dîtiya**, însana cewrikê sa anîna? (2/247)

(Ma te dîtiye ku însanan cewrikên se anîne?)

c. wela nizam hîç **neştexilîya**. (5/46)

(wele nizamim hîç neştexilîye.)

Dema borîya temam carinan ji bo BTRyên ku axiver bi çavên xwe dîtine jî tê bikaranîn lê bi ferqekê: Eger axiver ew ne di wextê pêkhatina wan da dîtibin. Yanî eger axiver BTR piştî pêkhatina wan dîtibin yan jî piştra ji bilî bihîstinê bi awayekî din bi wan hisiyabe dîsa vê demê bi kar tîne. Nimûneyên jêrîn dema ku di nav peywenda hevok û metnên xwe da bîr nîrxandin dê ev rewş baştir bê dîtin.

(21) a. vê şûşa ewkê, bida Mîrza Mihemed. Mi'j bîra **kiriya**. (3/26)

(vê şûşeya ewkê, bide Mîrza Mihemed. Min ji bîr kiriye.)

b. ev rû, ruwê min halo **bûya** (4/63)

(ev rû, ruyê min wiha bûye)

c. Tiştik di halê wê da **nemaya**. (5/39)

(Tiştêk di halê wê da nemaye.)

Ji bo BTRYên ku li derveyî dîtin û zanîna mirov in û razber in jî dema borîya temam tê tercîhkirin. Axiver bawerî û texmînên xwe bi van lêkerên ku di dema borîya temam da hatine kişandin radigihîne. Ji bo ku hevokên jêrîn baştir bînin famkirin divê di nav peywenda xwe da bînin nirxandin. Hevokên a û byê ji bo bawerîyê û ya cyê jî ji bo texmîna axiver dibînin nimûne.

(22) a. ti sucê wî jî tê da nîn a û Xwedê xera **kiriya** (1/397)

(tu sucê wî jî tê da tune û Xwedê xerab kiriye)

b. Ê Xwedê xelat ev Quran xelat jê ra **şîyandya**. (1/428)

(Ê Xwedê xelat ev Quran xelat jê ra şandiye.)

c. Dêmekî'j dil va **çûya**. (3/40)

(Nexwe ji dil ve çûye.)

2.2.2.1. Dema Borîya Temam ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe

Pevguherîna deman carinan rê dide ku lêkerên ku ne di forma dema borîya temam da ne wateya borîya temam bidin. Li jêr ji nav MVXYê nimûne hatine dayîn ku ew di forma demên din da ne lê wateya dema borîya temam didin. Ji bo ku cudahîya form û erkê bê çespendin gelek caran hewce ye ku mirov li peywenda hevok û metnan binêre. Li jêr di nimûneya ayê da axiver her sê lêkerên dawî (şixulîn, dan, anîn) nedîtine lê ji dêvla dema borîya temam ve wekî ku dîtibe dema borîya têdeyî bi kar anîye. Di nimûneya byê da jî heman pevguherîn heye lê cudahîyek jî tê da heye. Di byê da axiver dixwaze bibêje ku **Heta niha me nedîtiye ku axa hatine (ser) şîvan û wan (bi xwe ra) pisîk anîye**. Tê dîtin ku di byê da borîya têdeyî ji dêvla borîya temam ve hatiye bikaranîn. Di vir da ketiye şûna erka borîya temam ya ku ji bo BTRYên ku di jîyanê da cara pêşî pêk tên.

(23) a. çûna Antalya, **şixulîn**. Perekê xwa **dan** hev û **anîn**. (1/144)

(çûn Antalya, şixulîn. Perekên xwe dan hev û anîn.)

b. Dibê: Me **nedî** go axa hatna şîva û pisîk anî. (2/259)

(Dibêje: Me nedît ku axa hatin şîvan û wan pisîk anî.)

Di nav MVXYê da hat çespendin ku pevguherîna deman di navbera demên borî (erk) û niha (morfoloji) da pir xuya dike. Wekî ku tê zanîn MVX ji çîrokên gelêrî û serpehatîyekê pêk hatine. Bûyerên ku berê qewimîne di MVXYê da cihekî pir mezin digirin. Li jêr di beşa ku ji metnê 2. (çîroka Mihemed Yeman û Pelikman) hatiye girtin da bi tenê forma dema niha xuya dike ku cihên wiha pir in.

“Ew, keçik û xweha xwa **dçin**. Wê keçikê jî **dibin**. Xweha wê’l wê derkê **dirûnê**’w ew jî **dçê** ber kanîyê. Keçik **ddê** avê. **Dçê** ba wir. Ziha **têyyê**. Wextê go **tê**, şûr jî pê re **ya**. Ew jî pê re **dçê**. **Didê** avê û **dçê** wir. Wextê go şûr ser devê wî re **digrê**, go devê xwa zer **dikiyê** ew hema **dixê** devê wî û **digelêşê**. Werhasil devê yî **dqelêşê**. Ziha **dimrê**. Keçik **tê** malê. Keçik **tê** malê. Ew **dibê**: Keça axê **ma**’w halo û halo. Destê xwa jî wextê go ziha **dimrê** destê xwa’l xwînê **dxê** **dibê**: Ti xwiha... **Dibê**: Vêga vê kêlîyê ti weka xwiha min î. Li nav pişta yê **dxê**. Li tazîyê wê **dxê** ne’l ser cila **dxê**. Jixwa wilo’l nav pişta yê **dxê**.” (2/110)

Givón vê rewşê bi helwesta axiver ya avakirina tabloyeka zindî (vivid) ya tevna bûyeran îzah dike.⁹³ Dema mirov baş bala xwe dide peywendê bi vê helwesta vebêjeran dihise. Lewra bi piranî bûyerên ku ji alîyê wan ve nehatine dîtin yan jî yên ku di wextekî berê da pêk hatine bi dema niha tîr ragihandin. Çendî ku di hin cihên wekî beşa jorîn da tam ne zelal be bê ka dema niha ji dêvla kîjan demê ve hatiye bikaranîn jî her diyar e ku dema niha ji alîyê erkê ve ketiye cihê demeka borî. Ji bo tesbîta vê jî peywend pir derdikeve pêş. Dema mirov bala xwe dide nimûneya jorîn geneata ku dema niha bi giştî erka dema borîya temam pêk anîye bi mirov ra çêdibe.

2.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî di Dema Borîya Temam da

Divê kêşana dema borîya temam û kêşana dema borîya têdeyî ya ku morfema berpêbûyînê bi dawîya xwe ve digire neyê tevlihevkin. Di vê xalê da jî giringî û

⁹³ Givón, *Syntax Volume I*, r. 298.

tesîra peywenda hevok û metnan derdikeve ber mirov. Lewra ji alîyê teşe ve du bikaranînên ku wekî hev in bi xêra peywendê ji hev vediqetin. Nimûneyên jêrîn ji bo lêkerên dema borîya têdeyî yên ku morfema berpêbûyinê bi dawîya xwe ve digirin hatine dayîn. Di van nimûneyan da tê dîtin ku lêker wekî lêkerên borîya temam bi dengê –ayê diqedin lê dema wan dema borîya têdeyî ye.

(24) a. û şeş sala **çûma** mektebê (1/6)

(û şeş salan çûm mektebê)

b. serê wê **danîna** ser kevirkê û hevalê wê xayintî lê kirin (7/7)

(serê wê danîn ser kevirekê û hevalê wê xayintî lê kirin)

c. E **çûma** paleyîyê. Ewk **dana** min. (5/71)

(Ez çûm paleyîyê. Ewk dan min.)

Ji bo cudahîyeka ku di navbera dema borîya temam û borîya têdeyî da ye mirov dikare li van nimûneyan binêre. Li herêmê lêkerên wekî lêkerên jêrîn ku di hevokên yekem da ne bê bireserên nerasterast nayên bikaranîn. Ji ber ku bi avêtina dengê –iyê ev form tê holê helbet divê bê gotin ku ev rewşa fonetîk ji bo hemû lêkeran ne karîger e. Bi tenê di lêkerên ku dengên wan guncan in da tê dîtin. Di her du nimûneyan da jî demên hevokên yekem borîya têdeyî û yên duyem borîya temam in.

(25) a. 1. Ew jî **birna** wê dirê. (5/86)

(Ew jî birin wê derê.)

2. ew cewrikê sa danîne ber, zarokê yê **birina**. (2/20)

(ew cewrikên se danîne ber, zarokên wê birine.)

b. 1. go guhê kurkê xwa **kirna** berîka xwa da. (5/53)

(go guhên kurikên xwe kirin berîka xwe)

2. We tiştin **kirina**. (2/34)

(We tiştin kirine.)

Rewşa jorîn ku bi ketina dengê –iyê derdikeve holê ji bo lêkerên ku cihnav a paşnûsek bi dawîya xwe ve girtibin jî derbasdar e. Ji bo vê rewşa ku ji ber wekhevîya dawîya forman wekî alozîyê xuya dike di nav MVXyê da hat çespendin ku rêyeka pratîk di ziman da heye. Eger ev taybetî bi kurtasî bi du nimûneyan bê nîşandan dikare wiha bîn gotin:

(26) a. *Elî gwîz xistna elbê / Gwîz xistnê* (Dema borîya têdeyî)

(*Elî gûz xistin elbê / Gûz xistinê*)

b. *Elî gwîz xistina elbê / Gwîz xistinê* (Dema borîya temam)

(*Elî gûz xistine elbê / Gûz xistinê*)

Eger di lêkeran da daxistina dengê iyê pêk nehatibe ku hemû lêker ji bo vê ne guncan in ji bo ku tevlihev nebin divê mirov li peywenda hevokan û bilêvkirinê binêre. Wekî nimûne dema mirov bibêje *Ez çûma wê derê* du wate bi gotineka din du dem ji vê hevokê dikarin bîn bidestxistin: 1. *Ez çûma wê derê* yanî wê dera ku ez behsa wê dikim û ne devereke din. 2. *Ez çûma wê derê* yanî min berî niha ew dera ku behsa wê dikim dîtiye. Ji bo ku ev her du wate û dem ji hev veqetin paşxaneyê her du rewşên ji hev cuda û bilêvkirina hevokan cihekî girîng digirin. Kirpandina ku di hevoka duyem da li ser kêteya çûyê heye di hevoka yekem da li ser heman kêteyê tune. Ev guherte jî rê dide ku mirov derheqê wate û demên wan da bibe xwedîfikir û karibe wan ji hev veqetîne.

2.2.2.3. Lêkerên Cotmesder di Dema Borîya Temam da

Di devoka Torê da taybetîyeka din heye ku di dema borîya temam da xuya dike. Ev taybetî di lêkerên ku mesdera wan cot in da heye. Wekî lêkerên *kenîn/kenîyan*, *helîn/helîyan* û hwd. Di kurmancîya nivîskî da di dema borîya temam da ev form tê tercîhkirin: (ew) *kenîyaye* û (ew) *helîyaye* Lê di devoka Torê da di dema borîya temam da ev lêker wekî (ew) *kenîya* û (ew) *helîya* tên kişandin. Li jêr ji MVXyê hin nimûne hatine derxistin.

(27) a. Mehek **qedaya**. (1/400)

(Mehek qedîyaye.)

b. ga va marekî'l dora çadira ê piçûşkê danîya, **pêçaya**. (4/12)

(va ye ku marekî li dora çadira yê piçûkê danîye, pêçîyaye.)

c. Ew jî, cil û milê wê **qetana**. (5/39)

(Ew jî, cil û milên wê qetîyane.)

2.2.2.4. Awarteya Kesên Yekjimar yê Duyem û Sêyem di Dema Borîya Temam da

Di kêşana lêkerên dema borîya tamam da di nav kesên yekjimar yê duyem (tu) û yê sêyem (ew) da eger biker bi awayekî aşkera nehatibe diyarkirin gelek caran wekhevîyek xuya dike. Wekî nimûneyên (tu) *çûye* û (ew) *çûye*. Ev wekhevî di nivîsê da aloziyekê derxe ber mirov jî ji peywenda hevok û metnan mebest tê famkirin. Di vê mijarê da divê bê gotin ku ev rewş li herêmê ne tenê ji bo dema borîya tamam xuya dike. Herwiha dema bê û dema niha jî di heman rewşê da ne. Li jêr ji MVXYê nimûne hatine dayîn. Di her sê nimûneyên jêrîn da tiştekî balkêş heye ku di tevahîya MVXYê da xuya dike. Dema mirov li peywenda wan vedigere dibîne ku bikerê her sê hevokan jî kesê yekjimar yê sêyem e. Axiveran di MVXYê da ev alozî bi piranî bi terknekirina kesê yekjimar yê duyem çareser kirine. Yanî çendî ku li gor kurmancîya nivîskî ev pirsgirêk jî be, bêbikerî ji her du kesan bi tenê ji bo yekî xuya dike. Ev jî dikare wekî tedbîreka xwezayî ya ziman bê şîrovekirin. Yanî eger axiverên ji herêmê ji bo kesên yekjimarê duyem û sêyem, di van her sê demên navborî da bikerê bi kar neînin û mirov jî li peywenda metnan yanî paşî û pêşîya hevokan nenêre tevlihevîyeka wateyê derdikeve. Pirsgirêk jî ev e: Gelo di vir da biker kesê duyem e yan yê sêyem e. Lê dema mirov li metnan dinêre dibîne ku bi du awayan tevlihevî safî dibe. Wekî ku li jor derbas bû yek ji wan peywend e û ya din jî bikaranîna bikerê ji bo kesê yekjimar yê duyem e. Li jêr ji bo kesê yekjimar yê sêyem hin nimûne hatine dayîn.

(28) a. xesûwa xwa'w **daya** pêşya xwa û **hatiya** (1/400)

(xesûya xwe ew daye pêşîya xwe û hatiye)

b. **Çûya** qasekek, di cewrikê sa **xistinê** û **anîna**. (2/23)

(Çûye qasekek, du cewrikên se xistinê û anîne.)

c. **Kuştiya** va ya'd vir da, parçê wî jî va ya (4/24)

(Kuştiye va ye di vir da, parçeyê wî jî va ye)

2.3. DEMA BORÎYA DOMDAR (PAST CONTINUOUS TENSE)


2.3.1. Morfolojî û Erka Dema Borîya Domdar

Morfema diyê + Reha dema borî + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) di + ket + im

Dema borîya domdar di kurmancîya nivîskî da li ser reha dema borî bi morfema *di-yê* û bi qertafa kesane çêdibe. Di vê demê da morfema demê berî reha lêkerê tê û bi pêşîya lêkerê ve dibe. Lêkera vê demê digel ku di demeka borî da ye û pêk hatiye jî ji ber ku xwedî pêvajoyê ye û di wê pêvajoyê da dewam kiriye ji aliyê xuyangê ve berdewam e. Helbet ev berdewamî di dema borî da ye û ev jî cudahiya wê û berdewamîya di dema niha da ye. Abî xuyanga vê demê bi morfema *di-yê* destnîşan dike.⁹⁴ Mirov dikare dema borîya domdar li ser xeta demê wiha nîşan bide:

Fîgur 4: Nîşandayîna Dema Borîya Domdar li ser Xeta Demê



Dema borîya domdar bi zêdekirina morfema *-diyê* li lêkera dema borîya têdeyî tê bidestxistin. Dema ji hevoka *Elî diçû* morfema *-diyê* bê hilanîn di destê mirov da lêkera di dema borîya têdeyî da kişandî dimîne. Xalên hevpar yên van her du deman ev in: Li ser xeta demê her du dem li milê çepê dikevin. Her du dem ji bo lêkerên ku bi dawî bûne tîrî bikanî. Yanî lêkerên bi vê demê kişandî li dijî dema borîya temam digel tesîra xwe di nav sînorên wextê pêkhatina xwe da mane. Lêkerên borîya domdar bi ferqeka xuyangî ji yên têdeyî cuda dibin. Lêkerên borîya têdeyî li ser xeta demê wekî noqteyekê tîrî nîşandan lewra ew lêker di kêliyêkê da pêkhatine. Çiqas dem girtibin jî eger bi borîya têdeyî hatibin kişandin ew lêker noqteyî ne. Lê


⁹⁴ Abdulmenaf Abî, *Di Kurmancîya Jorîn û Kurmancîya Nawerast de Qertafên Lêkeran*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Wan Yûzûncû Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Wan 2018, r. 29.

yên borîya domdar tevî destpêk û xilaseka xwe maweyekê digirin yanî xwedî pêvajoyekê ne. Loma jî li ser xeta demê ne wekî noqteyê lê wekî xetikekê yan malikekê tên nîşandan. Ji wê xetik yan malikê mebest jî xêzeka ku teqlîda xeta demê ye. Lê wekî xeta demê ne bêdestpêk û bêdawî ye. Ji destpêka pêkhatina lêkera xwe heta bidawîbûna wê ew xêz û xeta demê li hev siwar dibin. Divê neyê jibîrkin ku ev noqte û xêz wext (time) rasterast temsîl nakin. Pir normal e ku lêkerekê dema borîya domdar ji lêkerekê dema borîya têdeyî kêmtir wext girtibe. Di bikaranîna dema borîya têdeyî û domdar da tercîha axiver pir bitesîr e. Di sedema tercîha axiver da jî ya girîng ew e ku lêker di çavê axiver da xuyangeka çawa ava dike. Eger lêker noqteyî (kêlîkî) be ew bi dema borîya têdeyî lê eger xêzkî (pêvajokî) be bi dema borîya domdar tê kişandin. Lêkerên dema borîya têdeyî xeta demê di cihekî da dibirin lê lêkerên borîya domdar di nav sînorên dema borî da jî cihekî dest pê dikin û di cihekî li pêştir da diqedin. Ew lêker wekî dema borîya têdeyî xeta demê di noqteyekê da qut nakin, bi wê ra demekê (bi qasî pêvajoya xwe) dimeşin. Ev dem jî bo BTRYên ku neçûne serî û nîvco mane yanî armanc pêk nehatiye jî tê bikaranîn. Wekî nimûne: *Elî diçû kargehê lê erebeya wî li darê qelibî*. Di vê nimûneyê da tê dîtîn ku lêkera *çûnê* dest pê kiriye, demekê dewam jî kiriye. Lê berî noqteya ku di dema borî da wekî armanc hatiye diyarkirin qut bûye. Pêvajo biderî planê bûye û zû temam bûye.

Wekî ku di jor da jî hatibû gotin dema borîya domdar ji bo lêkerên borî yên ku di hişê axiver da xwedî maweyekê ne tê bikaranîn. Ev mawe bi du awayan di nav wextê borî da saz dibe. Yek ji wan ew e ku BTRYa ku mijara hevoka axiver e di nava wextê borî da jî destpêkê heta dawîya xwe pir caran pêk hatiye yanî dubare bûye. Parçekirî ye ne ku yekkere ye. Lêkerên wiha jî aliyê xuyangê ve adetî ne. BTRYên wekî hînbûn û adetî (habit) ku bi awayekî birêkûpêk dubare dibin dikevin nav vî awayî. Yek ji wan jî ew e ku bi destpêk û dawîya xwe demeka yekkere ye yanî neparçekirî ye. Mirov dikare bala xwe bide van her du nimûneyan: *Fatê bi pêyan diçû zanîngehê û Elî êvarkî nan dixwar*. Cudahîya BTRYên yekkere û yên ku dubare dibin li ser van hevokan xuya dibe. Xwarina *Elî* ya nan bûyereka wisa ye ku carekê pêk hatiye û demekê ajotiye. Lê çûna *Fatê* ya zanîngehê çendî ku wekî ya *Elî* demekê ajotibe (belku demeka dirêjtir) jî di nav wê demê da dubare bûye. Mirov dikare van her du erkên dema borîya domdar li ser xeta demê nîşan bide. Li jêr jî bo

dema borîya domdar li ser xeta demê du bûyer xuya dikin. B1 bûyera yekkere B2 bûyera parçekirî yanî ya ku dubare bûye temsîl dike.

Fîgur 5: Nîşandayîna Du Awayên Dema Borîya Domdar li ser Xeta Demê



2.3.2. Bikaranîna Dema Borîya Domdar di Devoka Torê da

Bikaranîna dema borîya domdar ya li herêmê ji aliyê morfolojî û erka xwe ya sereke ve bi giştî wekî ya kurmancîya nivîskî ye. Li jêr ji bo bikaranîna dema borîya domdar ya li herêmê ji nav MVXyê hin nimûne hatine derxistin.

- (29) a. mi xwa niheq **dikir** mi **dgo** çima bavê mi wilo dibêjê (3/14)
(min xwe neheq dikir min digot çima bavê min wisa dibêje)
- b. Hingî wilo bû'b piya **dçûn**. (2/91)
(Hingê wisa bû bi pêyan diçûn.)
- c. Me'd tifika da agir **dkîr**. Me çira **pêdxist**. (1/51)
(Me di tifikan da agir dikir. Me çira pêdixist.)

Li jêr ji bo her du awayên ku di morfolojî û erka vê demê da hatibûn destnîşankirin ji MVXyê hin nimûne hatine dayîn. Dema mirov bala dide nimûneyên jêrîn ji hevok û peywendê fam dike ku di nimûneyên a û byê da dubarebûn heye. Di nimûneya cyê da dubarebûn tune lê pêvajoyeka neparçekirî û bi destpêk û dawîya lêkera xwe ve sînorkirî heye.

- (30) a. Mey hewqa **digot** jî, mi **dgo**: (6/24)
(Meyzîne ewqasî digot jî, min digot:)
- b. Wilo **dibiward**. Hingî berê wilo **dgotin**. (6/47)
(Wisa dibiwart. Hingê berê wisa digotin.)

- c. Mi **dgo**: Jinamê, halo mi xewn dîtiya. (1/169)
(Min digot: Jinapê, wiha min xewn dîtiye.)

2.3.2.1. Dema Borîya Domdar ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe

Carinan lêker ne di forma dema borîya domdar da bin jî wateya dema borîya domdar didin. Di nimûneyên wiha da di navbera deman da pevguherîn pêk tê. Li jêr ji nav MVXyê nimûne hatine dayîn û her du jî di formên demên din da ne lê wateya dema borîya domdar didin. Ji bo ku cudahiya form û erkê bê çespendin carinan hewce ye ku mirov li peywendê binêre. Li jêr nimûneya ayê di forma dema borîya têdeyî da ye. Nimûneya byê di forma dema niha da ye. Lê her du jî ji aliyê erka xwe ve wateya dema borîya domdar didin.

- (31) a. Halo bû, halo bû, halo bû. Mi jê re **got**. (1/165)
(Wiha bû, wiha bû, wiha bû. Min jê ra got.)
- b. Ga çakêtê xwa, zendik kiriyê da û ya dî ber ra **tê**. (1/203)
(Va ye ku çakêtê xwe, zendikek kiriyê û ya din di ber ra tê.)

2.3.2.2. Lêkerên Berpêbûyinî di Dema Borîya Domdar da

2.3.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyinî yên ku Biresera Wan Bêjeya Serbixwe ye

Morfema *-ayê* ya berpêbûyinê (directional) di dema borîya domdar da bikaranînên wekî van nimûneyên jêrîn derdixe holê ku li herêmê xuya dikin: *Fatê mewîj didana zaroka*. Divê bê gotin ku eger bireserên hevokên wiha, cihnav bin jî heman form xuya dike li herêmê. Mirov ji bo hevokên ku biresera wan ya nerasterast cihnav e nimûneya li jor dikare wiha biguherîne: *Fatê mewîj didana wa*. Çendî ku di vê formê da cudahi xuya bikin jî dem heman dema borîya domdar e. Eger biresera nerasterast ji hevokê bê avêtin pê ra morfema *-ayê* jî ji dawîya lêkerê tê avêtin, lêker vedigere ser forma xwe ya berê. Ev rewş li jêr di nimûneya cyê da li ser lêkera *hatinê* xuya dike. Lêkera *hatinê* carekê bi biresera nerasterast (*fêkî*) û carekê jî bê biresera nerasterast xuya dike. Di forma bêbireser da di dawîya lêkera *hatinê* da morfema *-ayê* jî êdî tune. Lewra ew ji bo bireserê tê dawîya lêkerê.

- (32) a. Go hema dayîm **digota** kurkê xwa (3/2)

(Go hema dayîm digot kurikê xwe)

b. Wela'l filan derê, dengê yekî halo **dhata** min (7/20)

(Wele li filan derê, dengê yekî wiha dihat min)

c. Êdî diya mi ew dihatin, **dihatna** ser fêkî havînî. (1/43)

(Êdî dêya min ew dihatin, dihatin ser fêkî havînî.)

2.3.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Cihna Paşnûsek e

Dema ku lêkerên berpêbûyînî biresera nerasterast digirin dawîya xwe carinan ew bireser wekî qertaf bi lêkerê ve dibe. Ji van cihnavên wisa ra cihna paşnûsek tê gotin. Dema mirov li MVXyê dinêre dikare bê gotin ku ev rewş bi tenê ji bo cihnavên kesê sêyem yê yekjimar derbasdar e. Wekî nimûne ji bo kesê duyem yê yekjimar ev rewş xuya nake li herêmê. Li alîyê din dema mirov bala xwe dide MVXyê di nav forma dema borîya domdar da ev rewş xuya nake. Li gor ku hat çavdêrîkirin sedema sereke ev e: Di metnên çîrokan da erka navborî pir hat dîtin lê di forma dema niha da. Ev jî bi pevguherîna deman dikare bê ravekirin. Bi taybetî di metnê duyem yê vê xebatê da bikaranînên wiha pir hene. Mirov li ser nimûneyên jorîn vê formê dikare wiha nîşan bide.

(33) a. Go hema dayîm **digotyê**

(Go hema dayîm digotê)

b.⁹⁵

c. Êdî diya mi ew dihatin, **dihatnê** havînî.

(Êdî dêya min ew dihatin, dihatinê havînî.)

2.3.2.4. Lêkerên Cotmesder di Dema Borîya Domdar da

Di devoka Torê da taybetîyeka din heye ku digel borîya têdeyî û temam di dema borîya domdar da xuya dike. Lêkerên ku mesdera wan cot in, di dema borîya domdar da ji wan mesderan ne wekî *digirîya* û *dibezîya* bi piranî wekî *digirî* û *dibezî* tên kişandin. Li jêr ji nav MVXyê hin nimûne hatine derxistin. Di xala dawî da forma

⁹⁵ Ji ber ku biresera vê hevokê cihna *minê* ye ev forma ku bi *êyê* çêdibe ji bo kesê yekem yê yekjimar nikare bê tetbîqkirin.

duyem xuya dike lê bi cudahîyeka ku li herêma Torê heye: Dengê di wir da ne y lê h ye.

(34) a. Lêbelê hema go **tkuxî**, (1/281)

(Lêbelê hema ku dikuxîya,)

b. Hingê **nedigrîm**. (1/380)

(Hingê nedigirîyam.)

c. E nizam ne **ttirseham** ne sehwê dgirtim ne (1/433)

(Ez nizamim ne ditirsîyam ne sehwê ez digirtim ne)

2.4. DEMA BORÎYA DÛR (PAST PERFECT TENSE)

2.4.1. Morfolojî û Erka Dema Borîya Dûr

Reha dema borî + Paşgira partîsîp + bûn + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) ket + i + bû + m

Dema borîya dûr di kurmancîya nivîskî da li ser reha dema borî bi paşgira partîsîp û bi morfema *bûnê* û qertafa kesane çêdibe. Lêkera vê demê ji ber ku qedîyaye ji alîyê xuyangê ve temam e. Mirov dikare dema borîya dûr li ser xeta demê wiha nîşan bide:

Fîgur 6: Nîşandayîna Dema Borîya Dûr li ser Xeta Demê



Bedirxan û Lescot ji bo vê demê wiha dibêjin: “Bi *bûnê* û partîsîpa ku bi ketina dengê dawî (n) tê bidestxistin çêdibe.”⁹⁶ Partîsîpa ku ji reha dema borî tê bidestxistin dema ku rengdêr be bi dengê *-îyê* diqede. Lê ev partîsîp di dema borîya dûr û herwiha borîya temam da di kurmancîya nivîskî da bi piranî dibe *-i*. Ev rewş guherîneka dengan e û *-îya* ku dirêj e cihê xwe ji *-iya* ku kurt û siviktir e ra berdide. Bya li jor ya li ser xeta demê bûyera borî temsîl dike. Rya ku li bal bûyerê xuya dike referansa demê ya axiver e. Ji bo nimûne mirov dikare li ser vê rewşê bifikire. *Elî* ji

⁹⁶ Emîr Celadet Bedirxan û Roger Lescot, **Kürtçe Dilbilgisi**, Doz, İstanbul 2011, r. 181.

sûkê vedigere malê û postevan li devê derî dibîne. Hevokeka wiha ji *Fatê* ra dibêje: *Dema ku ez vegeyîyam malê postevan hatibû.* Di vir da *Dema ku ez vegeyîyam* referansa demê ya lêkera *hatinê* pêk tîne. Di vê nimûneyê da referans bi awayekî aşkere hatiye diyarkirin. Helbet *Elî* dikarîbû bi tenê bibêje ku *Postevan hatibû.* Dê hingê jî referansek hebûna lê di hişê *Elî* da. Dema borîya dûr ji bo BTRyên ku berî wextê niha û di heman demê da berî wextekî berî wextê niha pêk hatine tê bikaranîn. Ev wextê ku berî wextê niha ye diyar e û referansa demê ya di hişê axiver da pêk tîne. Ev referans dibe ku bi awayekî aşkere ji alîyê axiver ve bi rêya bêje û hevokan bê bilêvkin. Lê dibe ku bêtî ku behsa wê referansê bê kirin rasterast ev dem bê bikaranîn. Lewra cîhana çîrokan û serpehatîyan ku di wextê berê da ye ji bo vê referansê guncan û amade ye. Herwiha dibe ku li derveyî çîrokan di axaftineka rojane da jî axiver qet behsa referansekê neke. Eger axiver dema borîya dûr bi kar bîne aşkere yan na di hişê wî da di nav dema borî da noqteyeka referansê heye û BTRYa ku dibe mijara hevoka wî berî wê referansê pêk tê. Ev rewş bi saya bikaranîna morfema *-bûnê* ji alîyê guhdar ve jî tê zanîn. Axiver bibêje jî û nebêje jî di hevokeka wekî *Ez çûbûm* da fikira demê wiha ye: *Ez* (berî filan demê) *çûbûm.*

2.4.2. Bikaranîna Dema Borîya Dûr di Devoka Torê da

Bikaranîna dema borîya dûr ya li herêmê ji alîyê morfoloji û erka xwe ya sereke ve bi giştî wekî ya kurmancîya nivîskî ye. Li jêr ji bo bikaranîna dema borîya dûr hin nimûne ji MVXYê hatine derxistin.

(35) a. Mi **nizanîbû** go anî çilo ye jî. (1/207)

(Min nizanîbû ku yanî çawa ye jî.)

b. Yeka yêxtiyar **hatibû** (2/170)

(Yeka êxtiyar hatibû)

c. Me conegayê wî **gurandbû**. (1/388)

(Me conegayê wî gurandibû.)

Dema mirov vê demê û dema borîya têdeyî ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe dide ber hev noqteya referansê ya dema borîya dûr di hişê mirov da zelaltir dibe. Di her du deman da jî morfema *-bûnê* cih digire. Dema mirov bala xwe dide lêkera *bûnê* ya

di dema borîya têdeyî da dizane ku referansa axiver ya demê, dema axaftinê ye. Lê dema ku mirov li lêkerên dema borîya dûr dinêre fam dike ku referansa axiver noqteyeka di nav wextê berê da ye. Îcar BTR jî berî wê referansê pêk hatiye. Li jêr jî nav MVXyê lêkerên borîya dûr û yên dema borîya têdeyî ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe ji bo danberhevê hatine dayîn. Hevokên yekem yên borîya dûr û yên duyem yên borîya têdeyî ya bi lêkera *bûnê* ne.

(36) a. 1. zahf bêbextî'l wê keçikê **kiribûn** (5/95)

(zaf bêbextî li wê keçikê kiribûn)

2. Hingî wilo **bû** (2/91)

(Hingê wisa bû)

b. 1. Ê mi'j bo xatrê wilo mi wê **anîbû** (4/79)

(Ê min ji bo xatirê wisa min ew anîbû)

2. Yadê, ne ew **bû**, (4/23)

(Yadê, ne ew bû,)

Rewşa li jor ya ku ji bo lêkera *bûnê* hat destnîşankirin ji bo lêkerên lêkdayî yên dema borîya têdeyî yên ku bi lêkera alîkar ya *bûnê* çêdibin jî derbasdar e. Di her du nimûneyên jêrîn da jî lêkerên borîya dûr û yên dema borîya têdeyî yên lêkdayî ji bo danberhevê hatine dayîn. Hevokên yekem yên borîya dûr û hevokên duyem jî yên dema borîya têdeyî yên lêkdayî (yên bi lêkera alîkar ya *bûnê* çêbûyî) ne. Lêkerên lêkdayî ku bi *bûnê* çêdibin ji bo ku bikevin forma dema borîya dûr du caran morfema *bûnê* digirin dawîya xwe. Wekî nimûne: *Fatê zû baş bûbû*. Helbet li gor kesan qertafên kesane jî digirin dawîya xwe.

(37) a. 1. Ew û xulamê xwa **hatibûna** nêçîrê (5/75)

(Ew û xulamê xwe hatibûn nêçîrê)

2. keçik baş **bû** û çû serê darê (5/30)

(keçik baş bû û çû serê darê)

b. 1. Ê meelimê nû bûn û hê nû mekteba **vebûbû**. (1/8)

(Ê meelimên nû bûn û hê nû mektebe vebûbû.)

2. Sê zarokê mi **çêbûn**. (5/85)

(Sê zarokên min çêbûn.)

Rewşa navborî ya ku ji bo lêkera *bûnê* hatibû destnîşankirin ji bo lêkerên dema borîya têdeyî yêni dariştî yêni ku *bûn* bi dawîya wan ve dibe jî derbasdar e. Di her du nimûneyên jêrîn da jî îcar lêkerên borîya dûr û yêni borîya têdeyî yêni dariştî ji bo danberhevê hatine dayîn. Yêni yekem ji bo borîya dûr û yêni duyem ji bo lêkerên borîya têdeyî yêni dariştî yêni ku *bûn* bi dawîya wan ve dibe hatine pêşkêşkirin. Lêkerên dariştî yêni ku bi *bûnê* çêdibin ji bo ku bikevin forma dema borîya dûr du caran morfema *bûnê* digirin dawîya xwe. Wekî nimûne: *Devê Elî vebûbû*.

(38) a. 1. **Nikarîbû**. (1/282)

(Nikarîbû.)

2. E **rabûm** ji wê derkê, çûma oda pîreka (1/350)

(Ez rabûm ji wê derikê, çûm odeya pîrekan)

b. 1. Û axir sibeyî heta îdî bê **bûbû** çî çax (1/273)

(Û axir sibeyî heta êdî bê bûbû çî çax)

2. em razan nerazan em **rabûn**. (1/273)

(em razan nerazan em rabûn.)

2.4.2.1. Dema Borîya Dûr ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe

Pevguherîna deman carinan dike ku lêkerên ku ne di forma dema borîya dûr da ne jî wateya dema borîya dûr bidin. Li jêr ji nav MVXYê nimûneyên wiha hatine dayîn. Her sê nimûne jî di formên demên din da ne lê wateya dema borîya dûr didin. Ji bo ku cudahîya form û erkê bê çespandin hewce ye ku mirov li peywendê binêre.

(39) a. Wela mi'd heyatê şixwa kesî'z **nedama** erdê (3/16)

(Wele min di heyatê da jixwe kesî ez nedame erdê)

b. Bavê me wilo **gota** birayê ma. (3/30)

(Bavê me wisa got birayê me.)

c. E **çûma** paleyîyê. (5/71)

(Ez çûm paleyîyê.)

2.4.2.2. Lêkerên Berpêbûyinî di Dema Borîya Dûr da

2.4.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyinî yên ku Biresera Wan Bêjeya Serbixwe ye

Di MVXyê da carinan tê dîtîn ku hin lêkerên bi dema borîya dûr kişandî morfema –ayê digirin herî dawîya xwe. Ev morfem tê dawîya lêkerên berpêbûyinî yanî yên ku bireserên nerasterast digirin. Divê bê gotin ku ev morfema –ayê û biresera nerasterast li herêmê mecbûrî hev in. Yanî bikaranîna yekê ya din bê bider bi xwe ra tine. Eger biresera nerasterast hebe lêker bê morfema –ayê nabe. Herwiha eger morfema –ayê hebe lazim e ku piştî wê biresera nerasterast hebe. Mirov dikare vê têkilîya di navbera her duyan da ji bo hemû demên ku ev her du yekeyên rêzimanî di wan da hene destnîşan bike. Lewra heman pêvajoyê ji bo demên din jî derbasdar e.

(40) a. Îdî wî çaxî ew camêr **daabûna** pêşîya xwa wû hatin. (1/12)

(Êdî wî çaxî ew camêr dabûn pêşîya xwe û hatin.)

b. Ew û xulamê xwa **hatibûna** nêçîrê. (5/75)

(Ew û xulamê xwe hatibûn nêçîrê.)

c. **çûbûme** ber garanê û (2/85)

(çûbûm ber garanê û)

Taybetîyeka wiha di vê kêşanê da heye: Nimûneyên jêrîn yên a û byê digel ku rewş heman rewş e ne wekî nimûneyên jorîn tevgerîyane yanî morfema –ayê negirtine dawîya xwe. Dema mirov baş bala xwe dide wan tê famkirin ku bikera her du lêkeran kesê yekjimar yê sêyem e. Eger wekî wan nimûneyên din morfema –ayê girtibûna dê formên **hatibûya* û **çûbûya* bi dest ketibûna. Lê wî çaxî jî dê bikaranîneka nerêzimanî ku ne armanca axiver e derketibûna holê. Lewra dê wateya lêkerê guherîbûna û formeka di MVXyê da jî nedîtî xuya kiribûna. Helbet divê ev nerêzimanîbûn di çarçoveya devoka Torê da bê nirxandin. Ji bo ku alozîya li vir baş bê nîşandan li binê hevokên nimûne awayê lêkeran hem bi bikerê kesên pirjimar hem jî bi bikerê kesê yekjimar yê yekem hatine nivîsîn. Ji nimûneyên 1. û 2. tê famkirin ku li herêmê morfema –ayê di cihên wiha da bi dawîya lêkerên wan kesan (pirjimar û yekjimarê yekem) ve dibe. Di vir da dikare bê gotin ku kesê yekjimar yê duyem jî

wekî kesê yekjimar yê sêyem tevdigere û morfema –ayê nagire. Wiha tê famkirin ku qertafên kesane rê li ber vê awarteyê vekirine. Lewra ji bilî her du kesên navborî (yekjimarê duyem û sêyem) dawîya lêkerên bi kesên din kişandî bi nedengdêrê diqede.

(41) a. diya wê **hatibû** pey. (1/162)
(dêya wê hatibû pey.)

- | | |
|---|-----------------------------------|
| 1. <i>metikên wê hatibûna pey.</i> | 2. <i>ez hatibûma pey.</i> |
| (metên wê hatibûn pey.) | (ez hatibûm pey.) |

b. Ê birakîm **çûbû** Heskîfê, (1/209)
(Ê birayekî min çûbû Heskîfê,)

- | | |
|--|---------------------------------------|
| 1. <i>Ê wîn çûbûna Heskîfê,</i> | 2. <i>Ê ez çûbûma Heskîfê,</i> |
| (Ê hûn çûbûn Heskîfê,) | (Ê ez çûbûm Heskîfê,) |

2.4.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyînî yên ku Biresera Wan Cihnav Paşnûsek e

Di dema borîya dûr da bireserên ku piştî lêkeran tên eger cihnav bin carinan bi dawîya lêkera xwe ve dibin. Ji van ra cihnavên paşnûsek (enclitic pronoun) tê gotin. Wekî nimûne hevoka *Elî zarok biribûn parkê* dikare bi tercîha axiver wiha jî bê gotin: *Elî zarok biribûnê* Di vir da *êya* ku di forma duyem da bi paşîya lêkera *birinê* ve bûye cihnav paşnûsek e û cihê navdêra *parkê* digire. Ji bo vê nimûneyê mirov dikare hin sedemên bikaranîna vê formê wiha destnîşan bike: Eger ji peywendê bê zanîn ku behsa *parkê* tê kirin yan cihê ku *Elî* zarok birinê ne ewqas girîng be bikaranîna vê formê derdikeve pêş. Ev rewş bi tenê ji bo bireserên ku yekjimar in derbasdar e. Eger cihnav pirjimar be, wekî *wan* û *van*, ev rewşa bider pêk nayê. Divê bê zanîn ku ev form çendî ku ji alîyê morfolojîya xwe ve cuda be jî dem heman dema borîya dûr e. Li jêr di xala ayê da eger mirov morfema *êyê* ji lêkerê biavêje û kesê muxeteb wekî cihnav bikar bîne dikare bibêje ku *gotibû wî/wê*. Di xala byê da jî bi heman awayî dikare bibêje ku *kiribû wî/wê*. Lê ji ber ku di hevoka berê da behsa çakêt tê kirin û ew jî nêrza ye bi tenê vebijêrka *kiribû wî* di destê mirov da dimîne. Ji alîyê morfolojîya xwe ve li herêmê kêşanên wiha tê bi destxistin ku ji nav MVXYê hatine girtin:

(42) a. Bavê mi **gotibûyê** gotibû: (1/11)

(Bavê min gotibûyê gotibû:)

b. çakêt li xwa nekirya ha. Zendik **kiribûyê** û (1/204)

(çakêt li xwe nekiriye ha. Zendik kiribûyê û)



BEŞA SÊYEM: DEMA NIHA


3.1. MORFOLOJÎ Û ERKA DEMA NIHA (PRESENT CONTINUOUS TENSE)

Morfema di-yê + Reha dema niha + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) di + kev + im

Dema niha di kurmancîya nivîskî da li ser reha dema niha bi morfema *-diyê* û qertafa kesane çêdibe. Lêkera vê demê ji ber ku dewam dike ji aliyê xuyangê ve berdewam e. Mirov dikare dema niha li ser xeta demê wiha nîşan bide:

Fîgur 7: Nîşandayîna Dema Niha li ser Xeta Demê




BTRYên ku di wextê niha da pêk tên bi dema niha tên ragihandin. Taybetîya herî girîng ya BTRYên dema niha ew e ku dest pê kirine û neqedîyane. Ev taybetîya berdewambûnê ji aliyê xuyangê ve cudahîyeka mezin dixe navbera dema niha û hin demên borî yên wekî têdeyî, tamam û dût. Li aliyê din taybetîya destpêkirinê cudahîyeka mezin dixe navbera dema niha û bê. Dema niha li ser xeta demê di nivî da tê nîşandan. Li aliyê wê yê çepê dema borî û li aliyê rastê dema bê cih digirin. Di hevokeka ku bi dema niha hatiye kişandin da nîşaneyên sereke ev in: Reha dema niha û morfema *di-yê* ku bi pêşîya lêkerê ve dibe. Dema niha bi vê taybetîya xwe ya reha dema niha ji demên borî vediqete. Mirov dikare ji bo dema niha li van hevokan binêre: *Elî diçe bênderê, Fatê firavînê dixwe*

Digel BTRYên ku di dema axaftinê da pêk tên yanî neqedîyane yên ku di demeka fireh da dubare dibin jî bi dema niha tên ragihandin. Yanî BTRYên ku berê jî, niha jî û di dema bê da pêk tên jî bi dema niha tên ragihandin. Zal ev rewş wekî demeka serbixwe şayesandiye.⁹⁷ Li gor Sönmez û Geyîk li herêma Semsûr û

⁹⁷ Azad Zal, *Zimanê Kurdî*, J&J, Ankara 2015, r. 222.

Behdînan formên cuda ji bo dema niha hene.⁹⁸ Di hin zimanan da jî ji bo van lêkerên ku di demeka berfireh da dubare dibin formeka serbixwe heye. Wekî di îngilîzî (simple present tense) û tirkî (geniş zaman) da. Çendî ku wekî navborîyan, di hin zimannas û lêkolîneran da meyla cudakirina van BTRYên ku dubare dibin ji dema niha hebe jî li gorî ku di vê xebatê da jî hat çespandin ji aliyê morfolojîya xwe ve dem heman dema niha ye. Lê lêkerên wiha ji aliyê xuyangê ve ji lêkerên dema niha yê asayî vediqetin. Lêkerên ku wiha dubare dibin dikevin nav beşa xuyanga adetî. Her du komên BTRYan yê navborî bi bikaranîna hokerên demê û peywenda hevok û metnan ji hev vediqetin. Ji ber ku her du awa jî ji aliyê morfolojîya xwe ve yek in û demên serbixwe bi hoker û peywenda hovekan ava nabin cudanekirina her du awayên dema niha duristtir xuya dike. Piranîya zimannas û lêkolîneran jî ev yek pêk anîye. Li jêr her du erkên navborî li ser xeta demê hatine nîşandan. Mirov dikare dema niha li ser xeta demê wiha nîşan bide:

Fîgur 8: Nîşandayîna Du Erkên Dema Niha li ser Xeta Demê



B1 bûyera dema niha ya asayî ku dest pê kiriye lê neqedîyaye temsîl dike. B2 jî bûyera dema niha ya ku di demeka fireh da dubare dibe temsîl dike.

Dema niha ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe di kurmancîya nivîskî da bi bêjeyeka ku ne lêker e û qertafa kesane çêdibe. Mirov dikare morfolojîya dema niha ya bi lêkera *bûnê* wiha bide naskirin:

Bêjeya dijîlêker + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) xwendekar im

Bêjeyên ku di eslê xwe da ne lêker in (navdêr, rengdêr, cihnav û hwd.) jî dikevin nav sîstema kêşana lêkerî. Eger bêjeyên navborî bi lêkerên alîkar ra nebûbin

⁹⁸ Nesim Sönmez û Resul Geyik, “Xebateka Berawirdkarî (Komparatîf) û Dijberawirdkarî (Kontrastîf) li ser Demên Îngilîzî û Kurmancî”, Nûbihar Akademî 2 h. 5 r. 82-110., 2016, r. 93.

lêker yanî bi serê xwe bin, di nav sîstema kêşana lêkerî da bi lêkera bûnê (copula) tên kişandin. Piştî ku ev bêje lêkera *bûnê* digirin êdî wateya dem, kes, rawe, erênî û neyînîyê li wan bar dibe. Wekî nimûne dema mirov dibêje *Zarok baş in* tê dîtîn ku di bêjeya *başê* da ji wateyên navborî dem, kes û erênî hene. Ev jî bi saya *inê* yanî lêkera bûnê ya di dema niha da çêdibe.

3.2. BIKARANÎNA DEMA NIHA DI DEVOKA TORÊ DA

Bikaranîna dema niha ya li herêmê ji aliyê morfolojî û erka xwe ya sereke ve bi giştî wekî ya kurmancîya nivîskî ye. Forma neyînî (negativ form) ya dema niha ji bilî lêkerên *karîn* û *zanînê* (Ev lêker bi *ni*-yê tên neyînîkirin.) bi morfema *na*-yê çêdibe. Ev morfem dikeve şûna morfema *di*-yê. Ev taybetîya kurmancîya nivîskî li herêmê jî heye. Di kêşana dema niha da li herêmê digel morfema *di*-yê formên wekî *ti*-, *d*- û *t*-yê jî ku di nav MVXyê da hene pir xuya dikin. Li jêr ji nav MVXyê hin nimûneyên dema niha hatine dayîn.

(43) a. Ji bavê yî ra **dibêjê**. (1/286)

(Ji bavê wî ra dibêje.)

b. Wela e jî **nizanim** çi ya. (2/42)

(Wele ez jî nizanim çi ye.)

c. Ez şûrê Eduwê Kor **dixwazim**. (4/14)

(Ez şûrê Eduwê Kor dixwazim.)

Li jor du awayên dema niha hatibûn destnîşankirin û li ser xeta demê hatibûn nîşandan. Dema mirov li lêkerên nimûneyên jêrîn dinêre heman forma dema niha dibîne. Lê dema ku bala xwe dide peywenda hevokan erka din tê dîtîn. Li jêr ji bo BTRyên dema niha yê ku di demeka fireh da dubare dibin hin nimûne ji nav MVXyê hatine derxistin.

(44) a. E **nabêjim** ti cara. (1/138)

(Ez nabêjim tu caran.)

b. Ev av **diherikê diçe**, ji wî gundî **diçe** gundekî dî. (2/37)

(Ev av diherike diçe, ji wî gundî diçe gundekî din.)

c. Her şev çil şivê hinarî'î vê jinikê **dişkênê**. (3/54)

(Her şev çil şivên hinarî li vê jinikê dişkîne.)

Dema niha ya ku bi lêkera bûnê çêdibe ji bilî formeka taybet ku dê di xala jêrtir da bê danasîn bi giştî wekî ya kurmancîya nivîskî ye. Bikaranîna dema niha ya ya bi lêkera bûnê li herêmê li ser van nimûneyên ku ji nav MVXyê hatine derxistin dikare bê dîtin.

(45) a. Lawo, win çar keçik **in** û birakî we **ya**. (1/4)

(Lawo, hûn çar keçik in û birayekî we ye.)

b. Ez pîrik **im**. (2/23)

(Ez pîrik im.)

c. Şivano, şivanê mala bavê min **î** (7/15)

(Şivano, şivanê mala bavê min î)

Dema mirov balê dide MVXyê tê dîtin ku di dema niha da bikaranîneka ne wekî forma giştî heye. Di vê formê da *î* wekî morfemeka serbixwe yan berî bikerê û yan jî piştî bikerê lê her berî lêkerê xuya dike. Divê di serî da bê gotin ku di nav MVXyê da ev form di dema niha da bi tenê du caran bi lêkerên asayî ra xuya kir. Ew jî ev e: a. *Em hatin go hema xwîn î di dev û bêvila va **tavêjê***. (1/242) b. *Hin î lê **dxin***, (1/266) Lê bi lêkera bûnê ra ev form gelek caran xuya dike. Di nimûneyan tê dîtin ku ji bo bikerên pirjimar û yên mêza wekî *a* û ji bo kesên din yê yekjimar jî wekî *î* derbas dibe. Îcar dema mirov li cudahiya *Elî î rihet e* û *Elî rihet e* dinêre dikare bê gotin ku di forma yekem da axiver bêhtir serwextî rewşa Elî ye. Agahîya wî ya derheqê Elî da teze ye û di wextê axaftinê da jî teqez dewam dike. Mirov dikare bibêje ku morfema *îyê* di nav firehî û nediya dîya dema niha ya ku bi lêkera bûnê çêdibe da sînordine tam nezelal dide demê. Baş ne zelal e lewra axiver çiqas serwextî wan sînordî di hişê xwe da jî da be guhdar bi qasî wî ne serwextî wan e. Helbet divê di cihên wiha da bikaranîna hokerên demê û paşxaneya hevok û metnan jî li ber çavan bên girtin. Amêdî vê istîsnaya dema niha wekî Dema Niha Berçav bi nav dike

û ji bo dema niha du cûreyan terîf dike.⁹⁹ Kurdo jî di bin navê Wextê Nihayî Berçavan da vê rewşê şîrove dike û balê dikişîne ser wextê axaftinê. Ew jî dema niha wekî du cûreyan terîf dike û di bin navê Wextê Nihayî Dirêj da behsa kirinên ku demeka dirêj digirin dike.¹⁰⁰ Ebdulfettah ji bo vê rewşê balê dikişîne ser xwecîbûnê û bi yên din ra alava îyê di nav peywira agahdarîyê da bi lêkerên ku destpêkirine ra girê dide.¹⁰¹ Divê bê gotin ku di şayesandina her sê xebatên navborîyan û di vê xebatê da jî ev morfem ji alîyê dengên xwe ve ne tam wekî hev e. Herwiha divê bê gotin ku navborîyan ev rewş hem bi şîroveyên xwe hem jî bi nimûneyên ku pêşkêş kirine ji bo lêkerên asayî destnîşan kirine. Di nav MVXyê da tê dîtîn ku hem *î* hem jî forma *ayê* di serê hevokê da û bê biker jî tê bikaranîn. Li jêr hin nimûne ji bo vê rewşê hatine dayîn.

(46) a. Roja dî tê, kurik î'l mal a. (2/173)

(Rojê din tê, kurik li mal e.)

b. Çavê vî zîlamî a'd berîkê wî de na. (4/104)

(Çavên vî zîlamî di berîkên wî da ne.)

c. A sabîr a û a feqîr a û qerebalix nekîrîya (1/427)

(Sabîr e û feqîr e û qerebalix nekîrîye)

Li gor Bedirxan û Lescot morfema *diyê* ya dema niha li hin herêman (Tor Abdîn, Hevêrkan)¹⁰² di kêşana lêkerên lêkdayî da wekî lêkerên xwerû tevdigere. Di van devokan da jî dêvla “radibim” ve “dirabim” tê gotin.¹⁰³ Ev tesbîta Bedirxan û Lescot di MVXyê da jî careka din hat dîtîn û piştrastkirin. Li jêr hin nimûne ji bo vê rewşê ji nav MVXyê hatine dayîn.

(47) a. Şeveqê **dirabin**, dibê: Ya heywanê Xwedê Teela (4/12)

(Şeveqê radibin, dibêjin: Ya heywanê Xwedayê Teela)

b. Piştî go hatiya malê, jinik **divekê**. (2/44)

⁹⁹ Sadiq Bahaeddîn Amêdî, **Rêzimana Kurdî Kurmanciya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî Hevberkirina Kurmancî-Soranî**, Diwan, Îstanbul 2012, r. 216.

¹⁰⁰ Qanatê Kurdo, **Zîmanê Kurdî Rêzîman**, Komkar, Frankfurt 1981, r. 97.

¹⁰¹ Ebdulfettah, **Kar (Lêker)**, r. 159.

¹⁰² Herêma vê xebatê jî dikeve nav vê herêma ku navborîyan bal kişandiye ser.

¹⁰³ Bedirxan û Lescot, **Kürtçe Dilbilgisi**, r. 214.

(Piştî ku hatiye malê, jinik vedike.)

c. Têr dixûn, têr **divexwin**. (6/15)

(Têr dixwin, têr vedixwin.)

Heman rewşa morfema *di-yê* ya ku di forma erênî ya dema niha da xuya dike ji bo forma neyînîyê ya dema niha jî derbasdar e. Morfema neyînîyê *na-* li herêmê di dema niha da berevajîyî kurmancîya nivîskî tê serê lêkerê. Wekî nimûne hevokeka wekî *Fatê venaxwe* ya di kurmancîya nivîskî da li herêmê wekî *Fatê navexwê* xuya dike.

(48) a. dikê wû nakê qeremê wî **narabê**, (4/59)

(dike û nake qeremê wî ranabe,)

b. serê mi di vir va bibirin yanî xêlîfî'j devê min **naderkevê**, (1/435)

(serê min di vir ve bibirin yanî xêlîfî ji devê min dernakeve,)

Dîsa li gor Bedirxan û Lescot mirovên van herêman di lêkerên ku cihnavên kelijandî digirin pêşîya xwe da jî bi heman awayî lêkeran saz dikin û bikaranînen wekî “dilêxim” derdikevin holê.¹⁰⁴ Ev agahî di orijîнала berhemê ya fransîzî da jî hat venêrîn û dîtin ku bi heman awayî ye.¹⁰⁵ Lê dema ku mirov guhê xwe dide kesên herêmê ku hin ji wan vebêjerên MVXyê ne, xala dawî ya ku Bedirxan û Lescot destnîşan kiriye ji nav MVXyê qet nayê çespendin. Di van mînakên jêrîn da, ku ji wan mînakan di MVXyê da pir hene, tê dîtin ku li herêma Torê *di-*ya ku morfema dema niha ye nayê pêşîya cihnavên kelijandî. Bêyî ku tiştek bikeve navbera wan û lêkerê bi pêşîya lêkerê ve dibin. Dema mirov li nimûneya cyê ya ku lêkerekî bipêşgir û di dema niha da kişandî jî di xwe da dihevwîne careka din dinêre cudahîya her du bikaranînan li cem hev dibîne. Hingê jî tê famkirin ku li gor MVXyê Bedirxan û Lescot¹⁰⁶ di tesbîta xwe da tenê ji bo lêkerên bipêşgir mafdar in ne ji bo lêkerên ku

¹⁰⁴ Bedirxan û Lescot, **Kürtçe Dilbilgisi**, r. 214.

¹⁰⁵ Emir Djeladet Bedir Khan û Roger Lescot, **Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)**, Librairie D'amérique Et D'orient, Paris 1970, r. 186

¹⁰⁶ Piştî vê tesbîta di pirtûka Aydoğan da hat dîtin ku Lescot beşên dawî yên rêzimana Bedirxan û Lescot, ku ev beş jî yek ji wan e, nivîsîne û di pêşgotina berhemê da ev gotiye. Bnr. Aydoğan, **Guman-1** r.120. Ev rewş di berhema orijînal da jî bi hûrgilî derbas dibe. Bnr. Khan û Lescot, **Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)**, r. VI-VII.

cihnavên kelijandî digirin pêşîya xwe. Li jêr ji nav MVXyê hevokên ku ji vê rewşa ra dibin nimûne hatine dayîn.

(49) a. Cila lê **dkin** û diedilênin. (2/268)

(Cilan lê dikin û diedilînin.)

b. Hin î lê **dxin**, li dêrî dixin. (1/266)

(Hin lê dixin, li derî dixin.)

c. wê'd ava zîv û zêr ddakê, çarçefekê lê **dkê** (6/26)

(wê di ava zîv û zêr dadike, çarçefekê lê dike)

Herwiha di mijara navborî da lêkera *bangkirinê* jî bi taybetîya xwe derdikeve pêşberî mirov û biderekê pêk tîne. Digel ku *bangkirin* ne lêkerekê bipêşgir e lê lêkdayî ye jî di vir da dijberî lêkerên lêkdayî û wekî lêkerên dariştî yên bipêşgir morfema dema niha girtiye pêşîya xwe. Lêkera *berdanê* jî ku li ser sazkirina wê fikirên ji hev cuda hene (bipêşgir, lêkdayî) li herêmê wekî lêkera *bangkirinê* tevdigere û formên wekî *Elî diberdê* xuya dikin. Li jêr ji bo lêkera *bangkirinê* hin nimûne hatine dayîn.

(50) a. av zelal dibê û dikeviyê û **dibakê** (2/198)

(av zelal dibe û dikevê û badike)

b. dihilênê û **dibakê**. (2/199)

(dihilîne û badike.)

c. **Dibakê**, dibê: Ka wera. (2/221)

(Badike, dibêje: Ka were.)

3.2.1. Dema Niha ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe

Di nav MVXyê da tê dîtin ku carinan lêker ne di forma dema niha da jî be wateya dema niha dide. Di nimûneyên wiha da tê dîtin ku di navbera deman da pevguherîn pêk hatiye. Li jêr sê nimûne hatine dayîn ku her sê jî di forma dema bê da ne lê wateya dema niha didin.

(51) a. Hema her sibbeh ez ê hewşê **malim**. (6/8)

(Hema her sibeh ez dê hewşê bimalim.)

b. He ro keçîkek **wê** xwa edilênê wû **ê**, (2/104)

(Her roj keçîkek dê xwe bîdilîne û bê,)

c. Îsal, vêga hema ez **ê** meraqê **kim** (1/380)

(Îsal, vêga hema ez dê meraqê bikim)

3.2.2. Lêkerên Berpêbûyinî di Dema Niha da

3.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyinî yên ku Biresera Wan Bêjeya Serbixwe ye

Hin lêkerên ku bi dema niha hatine kişandin hene ku bi hebûna morfemê ji kêşana asayî ya dema niha vediqetin. Di devoka Torê da ev lêker morfema –ayê bi dawîya xwe ve digirin. Taybetîyeka lêkerên wiha ew e ku piştî xwe biresereka nerasterast digirin. Digel vê taybetîyê peywenda hevok û metnê lêkerê jî ji bo naskirina van lêkeran alîkarîya mirov dike. Ev morfem li ser dem û xuyanga lêkeran tu guherînan çênake. Yanî di vê formê da dem dîsa dema niha ye.

(52) a. Rojekê **diçina** nav zaroka. (2/59)

(Rojekê diçin nav zarokan.)

b. Piçikkê **ddina** ber bêvla wî. (3/40)

(Piçîkekê didin ber bêvla wî.)

c. **Divegerina** ba Eduwê Kor. (4/73)

(Vedigerin bal Eduwê Kor.)

3.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyinî yên ku Biresera Wan Cihnav Paşnûsek e

Di MVXyê da bireserên nerasterast eger cihnav bin carinan tîn, bi dawîya lêkera xwe ve dibin. Ji van ra cihnavên paşnûsek tê gotin. Divê bê gotin ku bireserên navborî bi tenê eger yekjimar bin ev rewş derdikeve holê. Bi gotineka din cihnavên *wê* û *wîyê* dibin cihnavên paşnûsek lê cihnav *wanê* wekî wan nabe cihnav paşnûsek. Ev cihnav di kêşana lêkerên dema niha da wekî lêzêdebûna dengê –êyê

xwe nîşan dide. Divê bê gotin ku di devoka Torê da kesên yekjimar yê duyem û sêyem di piranîya formên deman da wekî hev tevdigerin û lêkerên wiha jî di dema niha da bi *êyê* diqedin. Îcar dema ku ev lêker cihêna paşnûsek digirin cudahîyeka wiha derdikeve ber mirov. Ji dêvla *-êyê* ve morfema *-iyê/-îyê* li koka lêkerê zêde dibe. Di encama danberhevê da tê dîtîn ku çendî ku li herêmê ji aliyê morfolojîya xwe ve cudahî di navbera kêşana lêkerên wiha û lêkerên asayî yên dema niha da hebe jî dem dîsa heman dema niha ye. Ji aliyê morfolojîya xwe ve kêşanên wiha tên bidestxistin:

(53) a. Wextê **dikevîyê** da xelatê navekê, (1/240)

(Wextê ku dikevê xelatê venake,)

b. Ziha **têyyê**. Wextê go tê, şûr jî pê re ya. (2/112)

(Ziha têtê. Wextê ku tê, şûr jî pê ra ye.)

c. ga textor **dibêjiyê** dibê: Hera xwa bişo, (1/266)

(va ye ku textor dibêje dibêje: Here xwe bişo,)

3.2.3. Xuyanga ku di Dema Niha da bi Bêjeyan Çêdibe

3.2.3.1. Lêkera Çûnê

Wekî tê zanîn xuyang ji bilî qertafên lêkeran bi bêjeyan jî çêdibe.¹⁰⁷ Lêkera *çûnê* jî yek ji wan bêjeyan e ku carinan taybetîyeka xuyangî li lêkera bingehîn bar dike. Derheqê awayê pêkhatina lêkerê da fikirekî dide guhdar. Di hevokên wiha da mirov bi saya lêkera *çûnê* ya xuyangî fam dike ku lêkera bingehîn çawa pêk hatiye. Di MVXyê da lêkera *çûnê* ya xuyangî ji bilî dema borîya têdeyî di dema niha da jî bi heman awayî xuya dike û tê dîtîn ku ji wateya xwe ya ferhengî dûr dikeve. Li jêr mimûneyên lêkera *çûnê* ya xuyangî yên ku bi dema niha hatine kişandin hene. Bûlbûl vê lêkera *çûnê* ya ku di dema borî da hatiye kişandin wekî lêkera *çûnê* ya espektîf¹⁰⁸ bi nav dike. Dûra dibêje ku lêkera *çûnê* ya espektîf wateya bidawîbûnê (terminative) anku temambûnê li lêkera bingehîn zêde dike. Loma jî ev cûre lêker ne

¹⁰⁷ Bnr. Beşa Dem û Xuyang

¹⁰⁸ xuyangî

lêkerên bingehîn in.¹⁰⁹ Di nimûneyên jêrîn da ku ji MVXyê hatine derxistin xuya dike ku ev lêker di dema niha da jî roleka xuyangî digire. Lê di vir da wateya ku li lêkerê bar dike ne bidawîbûn e. Lewra lêkerê temam nebûye. Dikare bê gotin ku lêkera *çûnê* ya xuyangî ya di forma di dema niha da biryardarîyê û teşebusekê (attempt) ji bo wextê niha li lêkera bingehîn ya hevokê bar dike. Dema mirov bala xwe dide MVXyê tê dîtîn ku ev lêker pir xuya dike. Wisa tê texmînkirin ku sedema sereke ya pîrbûna vê lêkerê taybetîyeka çîrokbêjîyê ye ku dema niha bi erka dema borî wekî pevguherîna deman pir xuya dike. Li jêr ji nav MVXyê ji bo vê rewşê hin nimûne hatine dayîn.

(54) a. Pîrek tçê dbêjê wê (2/164)

(Pîrek diçe dibêje wê)

b. Diçê xwarinê ddeynê ber hemmûwa (2/237)

(Diçe xwarinê datîne ber hemûyan)

c. keçikê ewk dikê û çê dkevê cihê wê da. (6/35)

(keçikê ewk dike û diçe dikeve cihê wê.)

3.2.3.2. Lêkera Rabûnê

Herwiha lêkera rabûnê ya xuyangî jî di MVXyê da di forma dema niha da pir tê dîtîn. Sedema pîrbûnê ya sereke wiha xuya dike ku wekî lêkera *çûnê* ya xuyangî di çîrokbêjîyê da pevguherîna deman e. Bûlbûl behsa du alîyên vê lêkerê dike û wiha dibêje: Alîyê wê yê espektîf ew e ku destpêkirinekê nîşan dide û alîyê wê yê modal jî ew e ku helwesta biryardarîyê û teşebusekê (attempt) îfade dike. Yanî hem destpêkirinek heye û hem jî di wê destpêkirinê da biryardarîyek û îradeyeka ku teşebusekê dike heye.¹¹⁰

(55) a. Dirabin qesrekê çêdikin û xweş dikin. (3/18)

(Radibin qesrekê çêdikin û xweş dikin.)

b. Dirabê, ew diçin bûkê xwa dbina malê. (4/15)

¹⁰⁹ Bûlbûl, Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêzîya Wan (Di Dîyalekta Jorî Ya Zimanê Kurdî Da - Devoka Mêrdînê), r. 116-117.

¹¹⁰ Bûlbûl, Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêzîya Wan (Di Dîyalekta Jorî Ya Zimanê Kurdî Da - Devoka Mêrdînê), r. 118.

(Radibe, ew diçin bûkên xwe dibin malê.)

c. Dirabê cîbhê xwa tavêjyê (5/39)

(Radibe cîbhê xwe tavêjê)

3.2.4. Lêkerên ku Mesdera Wan bi -andinê Diqede di Dema Niha da

Altunışık bal kişandiye taybetîya lêkerên ku -andinê digirin dawîya xwe li herêma Torê.¹¹¹ Mesderên lêkerên têper yên ku bi -andinê diqedin dema ku dikevin forma dema niha wekî lêkerên din li ser reha dema niha tên kişandin. Di reha dema niha da erka têperîyê wekî demên borî ne bi -andinê di kurmancîya nivîskî da bi -îyê pêk tê. Lê ev morfem wekî ku navborîyê jî destnîşan kiriye li herêmê ne bi -îyê lê bi -êyê derbas dibe. Wekî *dikelîne* (kurmancîya nivîskî) û *dikelênê* (kurmancîya devoka Torê). Ev taybetî di MVXYê da jî tê dîtin. Ev rewş ji bo demên borî ne derbasdar e.

(56) **a. Cila** lê dkin û **diedilênin**. (2/267)

(Cilan lê dkin û diedilînin.)

b. Dimeyizênin ga yekî li wê dê dirêjkirî ya (3/34)

(Dimeyzînin va ye ku yek li wê derê dirêjkirî ye)

c. Her kes keça xwa dbê **dixemilênê** û ziha **dqurpênê** (2/128)

(Her kes keça xwe dibe dixemilîne û ejdeha diqurtîne)

3.2.5. Lêkerên Awarte di Dema Niha da

3.2.5.1. Lêkera Gotinê

Di nav MVXYê da lêkera *gotinê* di dema niha da pir tê dîtin. Hate çespendin ku lêkera *gotinê* carinan ji wateya xwe ya ferhengî dûr ketiye. Vê dûrketinê bi xwe ra dema lêkerê jî jê biriye. Dema mirov di nav peywenda hevok û metnan da li wan dinêre dikare bibêje ku ev lêker bi forma “Dibê” wekî hêmaneka çîrokbêjî û vegotinê wateyeka wiha dide: (*Dibê*)jin ku... Divê ev form û forma ku di wateya xwe ya ferhengî da ye neyên tevlihevkirin. Lewra forma *dibêjeyê* ya ku bi erka veguhestinê

¹¹¹ Elif Altunışık, *Cihêtiyên Kişandina Lêkeran Li Herêma Torê*, Projeya Lîsansa Bêtez, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2015, r. 14.

tê bikaranîn di devoka Torê da gelek caran kurt dibe û ew jî dibe *dibê*.¹¹² Li jêr ji bo *dibêya* ku ji wateya xwe ya ferhengî dûr ketiye hin nimûne ji MVXyê hatine derxistin.

(57) a. **Dibê**, wextê go vêce dîse zilam diçê ber dewarê xwa (2/52)

(Dibêjin ku, wextê ku îcar dîsa zilam diçe ber dewarê xwe)

b. **Dibê** keçik tê, keçik tê. (2/100)

(Dibêjin ku keçik tê, keçik tê.)

c. **Dibê**, ew jî diçê û tabyê çêdkê û dikeviyê. (2/195)

(Dibêjin ku, ew jî diçe û tabyê çêdike û dikevê.)

3.2.5.2. Lêkera Meyzandinê

Li herêmê lêkera *meyzandinê* pir tê dîtin. Di nav MVXyê da jî lêkera *meyzandinê* digel dema borîya têdeyî di nav forma dema niha da pir caran bi wateyeka cuda xuya dike. Çendî ku wateya *meyzandinê* ya bingehîn wekî wateya lêkera *nerînê* be jî di vê rewşa bider da bi wateya *dîtinê* derbas dibe. Ev taybetî rewşeka bider pêk tîne. Ev rewş bi pevguherîna deman ra jî têkildar e. Lewra MVX ji çîrokên gelêrî û serpêhatîyekê pêk tê. Metnên wiha jî wekî ku tê zanîn qala bûyerên wextê borî dikin. Li jêr ji bo vê rewşê hin nimûne hatine dayîn.

(58) a. **Dimeyizênê** ga va marek li qurmê guhîjê xwa dpêçê. (4/18)

(Dimeyizînê va ye ku marek li qurmê guhîjê xwe dpêçe.)

b. şev nîvê şevê dirabê, **dimeyizênê** ga ne heval û ne tiştak (7/8)

(şev nîvê şevê dirabe, dimeyizîne va ye ku ne heval û ne tişteke)

¹¹² Li gorî ku di MVXyê da hat çespandin ev kurtkirin bêhtir dema ku veguheştina axaftina yekî, rasterast tê kirin pêk tê.

BEŞA ÇAREM: DEMA BÊ

4.1. MORFOLOJÎ Î ERKA DEMA BÊ (FUTURE TENSE)

Amraza dêyê Morfema bi-yê + Reha dema niha + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) dê bi + kev + im

Dema bê di kurmancîya nivîskî da bi morfema *bi-yê* li ser reha dema niha û bi amraza (partikul) *dêyê* çêdibe. Lêkera vê demê ji ber ku neqedîyaye û dest pê ji nekiriye nakeve nav her sê cûreyên xuyangê (temam, berdewam û adetî). Mirov dikare dema bê li ser xeta demê wiha nîşan bide:

Fîgur 9: Nîşandayîna Dema Bê li ser Xeta Demê



Lêkerên ku hêj pêk nehatine lê pêkhatina wan ya di wextê bê da tê ragihandin bi dema bê tînin. Di kêşanê da nîşana sereke ya dema bê morfema *serbixwe* ya *dêyê* ye û bîyê wê kêşana lêkerên dema bê pêk nayê. Helbet ev rewş ji bo forma erênî derbasdar e. Ev mofrem wekî ku di nimûneya *Zarok dê biçin* da xuya dike berî lêkerê û bi piranî piştî bikerê tê. Di dema bê da tiştekî ku li herêmê derdikeve pêş ev e.

Dema bê ya ku bi lêkera bûnê çêdibe di kurmancîya nivîskî da bi amraza *dêyê*, bêjeyeka ku ne lêker e, reha dema niha ya lêkera bûnê û qertafa kesane çêdibe. Mirov dikare morfolojîya dema bê ya ku bi lêkera bûnê çêdibe wiha bide naskirin:

Amraza dêyê Bêjeya dijleker + Reha dema niha ya bûnê + Qertafa kesane

Wekî: (Ez) dê xwendekar bim

Bêjeyên ku ne lêker in (navdêr, rengdêr, cihnav û hwd.) eger bi lêkerên alîkar ra nebûbin lêker, di nav sîstema kêşana lêkerê da bi lêkera bûnê ku wekî kopulayê ji tê naskirin tînin. Piştî ku ev bêje lêkera bûnê digirin êdî wateya dem, kes, rawe, erênî û neyînîyê li wan bar dibe. Wekî nimûne dema mirov bibêje *Elî dê saleka*

din mamoste be tê dîtîn ku di bêjeya mamosteyê da ji wateyên navborî dem, kes û erênî hene. Ev jî bi morfema beyê çêdibe.

4.2. BIKARANÎNA DEMA BÊ DI DEVOKA TORÊ DA

Li herêmê formula navborî ji bilî bikarneanîna morfema *bi*-yê bi giştî bi heman awayî ye. Lêkerên dema bê li herêmê morfema *-biyê* bê bider nagirin pêşîya xwe. Ji dêvla wê jî tu qertafan nagirin. Yanî lêkerên dema bê ji bilî qertafên kesane tu qertafan nagirin li herêmê. Cegerxwîn jî vê taybetîyê ji bo vê herêmê (Hevêrka) destnîşan dike.¹¹³ Taybetîyeka din jî ew e ku di morfema *êyê* da derdikeve pêş. Lewra li herêmê tu carî morfema *dêyê* xuya nake û li herêmê ji dêvla wê ve forma wê ya kurt yanî *ê* heye. Ev taybetî û bikarneanîna morfema *bi*-yê dibin nîşana dema bê li herêmê. Muhammed hebûna vê rewşê ji bo kurmançîya zaxoyî¹¹⁴ destnîşan dike.¹¹⁵ Di nimûneyên jêrîn da bikaranîna dema bê ya li herêmê xuya dike.

(59) a. Em ê xênî **ava kin**. (1/140)

(Em dê xanî ava bikin.)

b. Ez ê vî şûrî **xima** devê wî û ez ê wî **kujim**. (2/109)

(Ez dê vî şûrî bixim devê wî û ez dê wî bikujim.)

c. Birakê'm ez ê çîrokekê ji we re **bêjim** (3/1)

(Birakê min ez dê çîrokekê ji we ra bibêjim)

Li jêr ji bo dema bê ya ku bi lêkera bûnê çêdibe du nimûne ji nav MVXyê hatine dayîn. Di her du nimûneyên jêrîn da tê dîtîn ku morfema *beyê* ya ku di kurmançîya nivîskî da heye li herêmê ji alîyê deng ve cuda ye. Dengdêra morfema *beyê* wekî *êyê* ye li herêmê.

(60) a. Dibê: De bere **bê** lawo. (2/132)

(Dibêje: De bila be lawo.)

b. Bê kî **bê** belkî ew ji dil va çûbê (3/39)

¹¹³ Cegerxwîn, *Awa û Destûra Zimanê Kurdî*, Camîa Bexda, Bexda 1961, r. 150.

¹¹⁴ Muhammed di vê gotara xwe da devoka zaxoyî wekî devokeka di navbera Botan û Behdînan da dide naskirin.

¹¹⁵ Huseîn Muhammed, “Taybetmendîyên Devoka Zaxoyî”, *Zend h. Rêzepirtûk* 22 r. 101-104., 2014, r. 104.

(Bê kî be belkî ew ji dil ve çûbe)

Xaleka din heye ku di forma neyînîya dema bê da xuya dike. Lewra di neyînîya dema bê da amraza dema bê yanî morfema *dêyê* nayê bikaranîn. Neyînîya dema bê li herêmê tam wekî neyînîya dema niha ya li herêmê tê sazîkirin. Wekî nimûne: *Fatê naçê*. Cudahîya her du forman bi tenê bi rêya peywenda (context) hevok û metnan tê famîkirin. Bedirxan û Lescot jî bal kişandine ser vê mijarê û wan gotiye ku kêşana neyînîya dema bê tune û neyînîya dema niha cihê wê jî digire.¹¹⁶ Li gor Muhammed jî di kurmancîya zaxoyî da forma neyînî ya dema bê bi qertafa *na-yê* çêdibe.¹¹⁷ Li gor xebata Muhammed û vê xebatê ev dibe xaleka hevpar di navbera her du herêman da. Ciwan vê rewşê wekî taybetîyeka zimanê axaftinê destnîşan dike û dibêje ku loma jî her du form divê wekî bikaranînên rast bînin pejiwandin.¹¹⁸ Li jêr jî nav MVXYê nimûneyên neyînî yê dema bê hatine derxistin.

(61) a. Go ti nexwê e jî **naxum**. (1/333)

(Ku tu nexwî ez dê jî nexwim.)

b. Hema ez **nayêma** ba mala bavê ta îşev. (2/120)

(Hema ez dê neyêma ba mala bavê te îşev.)

c. ez kurkê xwa **nazewicênim**. (4/4)

(ez dê kurikên xwe nezewicênim.)

Li herêmê lêkerên dariştî yê ku bi pêşgirî (prefix) wekî *ve-*, *da-*, *-hil* û *-rûyê* saz dibin di kêşana dema bê da morfema *bi-yê* nagirin. Li jêr jî nav MVXYê nimûneyên wiha hatine bidestxistin. Divê bê gotin ku ev taybetî di nivîsan da jî bi piranî bi heman awayê li herêmê ye lê kêma caran di nivîsan da forma dijberî vê tê dîtin. Wekî: **Fatê dê derî vebike*. Ev form li herêma Torê tune. Di nav MVXYê da jî nehat çespendin. Li jêr jî nav MVXYê ji bo vê rewşê hin nimûne hatine dayîn.

(62) a. ma ez ê çilo vêca xelefa qencîya wê **vegerênim** sala îsal? (1/181)

(ma ez dê çawa îcar xelefa qencîya wê vegerînim sala îsal?)

¹¹⁶ Bedirxan û Lescot, **Kürtçe Dilbilgisi**, r. 199.

¹¹⁷ Muhammed, **Taybetmendiyên Devoka Zaxoyî**, r. 104.

¹¹⁸ Mûrad Ciwan, **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Rêzimana Kurdî bi şîrovekirina Tirkî**, Zekisan Matbaa, Diyarbakır 2014, r. 169-170.

b. Ez ê xwa lê kima, wilo **veşêrim**, belkî hema biştexilê. (5/45)
(Ez dê xwe lê bikim, wisa veşêrim, belkî hema biştexile.)

c. ka tê'l ku **rabê**'j mi ra. (1/219)
(ka tu yê li ku rabî ji min ra.)

Di mijara navborî da tê dîtîn ku li herêmê lêkera *çêkirinê* jî wekî lêkerên dariştî yên bipêşgir tevdigere. Digel ku li gor piranîya zimannas û lêkolîneran lêkera *çêkirinê* ne lêkereka dariştî ye, ev lêker wekî yên dariştî û li dijî yên lêkerên lêkdayî, ku bi lêkerên alîkar û bêjeyeka dijlêker saz dibin, morfema *bi*-yê nagire. Li jêr jî nav MVXYê nimûne hatine pêşkêşkirin.

(63) a. Em ê çin îşê wî **çêkin**. (1/336)
(Em dê biçin îşê wî çêbikin.)

b. Wê Xwedê şî te ra **çêkê**. (2/50)
(Dê Xwedê ji te ra çêbike.)

c. Dibê: Lawo, ez ê **çêkim** vêga tenûra'm bhûrîya. (2/72)
(Dibêje: Lawo, ez dê çêbikim vêga tenûra min bihûrîye.)

Taybetîyeka din ku li herêmê di dema bê da xuya dike ev e: Di her sê nimûneyên jêrîn da tê dîtîn ku amraza *dêyê* bi bikera xwe ve bûye ku nimûneyên wiha di MVXYê da gelek caran tê dîtîn. Rizgar vê rewşê destnîşan dike û dibêje ku di kesê yekjimar yê duyem da û di kesê sêyem hem yekjimar hem jî pirjimar da carinan peyv û amraza dema bê radicivîn û dibin yek peyv. Di encamê da bikaranînen wiha derdikevin: "Tê bixwî", "Wê rakeve".¹¹⁹ Li jêr di nimûneya cyê da tê dîtîn ku amraza *êyê* carekê bi bikera xwe ve ye û carekê jî cihê ye.

(64) a. Heydê bi xatirê wa. Wela **zê** çim. (3/46)
(Heydê bi xatirê we. Wele ez dê biçim.)

b. Me digo: **Mê** çilo va cama tişî kin? (1/83)
(Me digot: Em dê çawa van caman tije bikin?)

¹¹⁹ Baran Rizgar, *Uygulamalı Kürtçe Dersleri Dersên Kurdî*, Doz, İstanbul 2012, r. 172.

- c. Ez ê dima ta. Keça xwa **zê** dima ta. (2/148)
(Ez dê bidim te. Keça xwe ez dê bidim te.)

Dîsa di MVXyê da hat dîtîna ku ji bo kesên sêyem ku di nimûneyên jêrîn da cih digire forma *wêyê* bi taybetîya xwe ji forma *zê* (ez ê) û *mê* (em ê) vediqete. Lewra di MVXyê da tê dîtîna ku ev rewş ji bûyerên dergan ku carinan pêk tên derbas bûye êdî cihê forma *êyê* girtiye. Lewra di vê xebatê da awayê cihê bi tenê sê caran derbas dibe. Ji bilî her sê caran tim bi awayê lêkdayî derbas dibe. Ji bo awayê lêkdayî hin nimûne ji nav MVXyê hatine dayîn.

- (65) a. **Wê** dûv ra ê. **Wê** davikê xwa deynê. (2/188)
(Ew dê dûra bê. Ew dê davikê xwe dayne.)

- b. Dîbê: Î'l kû bê **wê** belî bê. (2/139)
(Dibêje: Li ku be dê belî bibe.)

- c. wextê go îlac û tiş tê hebê **wê** pisîka te'd ceh da beecê. (2/257)
(wextê ku îlac û tiştek tê da hebe dê pisîka te di cih da bibeece.)

Di mijara navborî da taybetîyeka din heye ku kesê yekjimar yê duyem ku di nimûneyên jêrîn da derbas dibe, di dema bê da her car bi vî awayê jêrîn yê lêkdayî tê bikaranîn. Di MVXyê da tu bider ji bo vê nehat peydakirin ku amraza *êyê* bi cihnavê yekjimar yê duyem ve nebûye.

- (66) a. ti'b çî maqsedê hatiya **tê**'b çî maqsedê çê (4/27)
(tu bi çî maqsedê hatiyî tu dê bi çî maqsedê biçî)

- b. Xweha'm, hera, newa. Ma **tê** ê çî kê (1/305)
(Xweha min, here, neyê. Ma tu dê bêyî çî bikî)

- c. **tê** nanê sêlê vêga'j me ra çêkê. (2/73)
(tu dê nanê sêlê vêga ji me ra çêbikî.)

4.2.1. Dema Bê ya ku bi Pevguherîna Deman Çêdibe

Carinan tê dîtîna ku lêker ne di forma dema bê da jî be wateya dema bê dide. Di nimûneyên wiha da tê dîtîna ku di navbera deman da pevguherîn pêk hatiye. Yanî di

van hevokên wiha da form ya demekê û wate ya demeka din e. Li jêr sê nimûne hatine dayîn û her sê jî di forma dema borîya têdeyî da ne. Lê dema mirov bala xwe dide wateya wan dibîne ku bi erka dema bê hatine bikaranîn.

(67) a. berî hingî ti bikevê şikeftê da wela te qizînç **kir** (4/47)

(berî hingê tu bikevî şikeftê wele te qezenc kir)

b. Go ti pora Biskhîzarê ji mi re neênê't şixwa ti **çûyî**. (4/52)

(Ku tu porê Biskhîzarê ji min ra neînî tu jixwe tu çûyî.)

c. Wellehî e jî çûm û ti jî **çûyî**. (2/165)

(Welehî ez jî çûm û tu jî çûyî.)

4.2.2. Lêkerên Berpêbûyinî di Dema Bê da

4.2.2.1. Lêkerên Berpêbûyinî yên ku Biresera Wan Bêjeyeka Serbixwe ye

Di MVXyê da hin lêkerên ku bi dema bê hatine kişandin hene ku bi hebûna morfemekê ji kêşana asayî ya dema bê vediqetin. Ev lêker morfema –eyê bi dawîya xwe ve digirin. Lêkerên wiha piştî xwe biresereka nerasterast digirin. Ji van lêkeran ra lêkerên berpêbûyinî tê gotin. Digel vê taybetîyê peywenda hevok û metnê lêkerê jî ji bo naskirina van lêkeran fikir dide mirov. Divê bê gotin ku digel cudahîyên vê formê û forma asayî ya dema bê ji alîyê dem û xuyanga BTRyan ve tu guherîn pêk nayê. Dema ku morfema navborî ji dawîya lêkerê digel biresera piştî xwe bê avêtin lêker vedigere ser kêşana dema bê ya asayî. Ev morfem li herêmê kêr caran wekî –eyê derbas dibe.

(68) a. Lawo, ez ê **çime** mala xalo (7/24)

(Lawo, ez dê biçim mala xalo)

b. Ez ê xwa lê **kima** diz. (6/50)

(Ez dê xwe lê bikim diz.)

c. Em ê te'j dêlê va **kina** mektebê (1/5)

(Em dê te ji dêlê ve bikin mektebê)

4.2.2.2. Lêkerên Berpêbûyinî yên ku Biresera Wan Cihna Paşnûsek e

Di MVXyê da bireserên nerasterast eger cihnav bin carinan bi dawîya lêkera xwe ve dibin. Ji van ra cihnavên paşnûsek (enclitic pronoun) tê gotin. Ev cihnav di kêşana lêkerên dema bê da wekî lêzêdebûna dengê –êyê xwe nîşan dide. Divê bê gotin ku bireserên wiha bi tenê eger yekjimar bin ev rewşa jêrîn derdikeve holê. Bi gotineka din cihnavên *wê û wîyê* dibin cihna paşnûsek lê cihna *wanê* nabe cihna paşnûsek yanî wekî qertaf bi dawîya lêkerê ve nabe. Çendî ku ji alîyê morfolojîya xwe ve cudahî di navbera kêşana lêkerên wiha û lêkerên asayî yên dema bê da hebe jî dem dîsa dem dema bê ye. Li herêmê ji alîyê morfolojîya xwe ve kêşanên wiha tên bi destxistin:

(69) a. Em ê îro bêtine diya xwa. Em ê tiştekî **bêjinê**. (2/65)

(Em dê îro bibêjin dêya xwe. Em dê tiştekî bibêjinê.)

b. Ez ê em **bêjimê** da. (1/166)

(Ez dê bêm bibêjimê.)

c. em ê çin serîkî **dinê** da. (1/199)

(em dê biçin serîyekî bidinê.)

Di vê mijarê da li herêmê di kesên yekjimar yê duyem û kesê yekjimar yê sêyem da di lêkerên dema bê da, ku ew lêker bi *êyê* diqedin, cudahîyeka wiha derdikeve pêşîya mirov. Morfema *-iyê/-îyê* li koka lêkerê zêde dibe. Wekî nimûne eger lêkerên di nimûneyên jêrîn da bi rêzê wekî li herêmê bi kesê yekjimar yê yekem û kesekî pirjimar ve bîn sazîkirin dê formên wiha derkevin holê: a. *Ez ê xwa zer kimê*

b. *Zarok dê tîfekê dinê*

(70) a. wê xwa zer **kiyê** û wê qurpênê. (2/105)

(Dê xwa zer bikê û dê biqurtîne.)

b. her yekî ê go'd be ra çû wê tîfekê **diyê** (2/251)

(her yekî yê ku di ber ra çû dê tîfekê bidê)

4.2.3. Xuyanga ku di Dema Bê da bi Bêjeyan Çêdibe

4.2.3.1. Lêkera Rabûnê

Lêkera rabûnê ya ku xuyanga ku bi bêjeyan çêdibe li lêkera bingehîn ya hevokê zêde dike di MVXyê da di hevokên ku bi dema bê hatine kişandin da jî pir tê dîtîn. Wekî nimûne dema mirov bibêje *ez dê rabim telefonekê bidim dêya xwe* bi rehetî dibe ku rûniştî yan jî ji pêyan be. Yanî ev lêkera *rabûnê* her car ne bi wateya dijber ya rûniştinê tê bikaranîn. Dikare bê gotin ku axiverê hevoka jorîn dixwaze bi guhdar bide zanîn ku ew dê bi îhtîmaleka mezin telefonê ne piştî demeka dirêj û bide dêya xwe lewra xwedîbiryar e. Dikare bê gotin ku ev biryardarî bûyera ku dê di wextekî bê da pêk bê nêzî wextê niha dike. Di van nimûneyên jêrîn da tê dîtîn ku lêkera rabûnê wateya biryardarîyeka xurt ji bo wextê bê li lêkera hevoka xwe bar dike.

(71) a. ez ê **rabim** çîrokekê'j we ra bêjim. (5/1)

(ez dê rabim çîrokekê ji we ra bibêjim.)

b. Em ê **rabin** çîna Batmanê. (1/115)

(Em dê rabin biçin Batmanê.)

c. Sê kurkê me na, ez ê **rabim** di sêva bim (5/44)

(Sê kurikên me ne, ez dê rabim du sêva bibim)

4.2.3.2. Lêkera Çûnê

Di MVXyê da lêkera *çûnê* ya xuyangî di nav forma dema borîya têdeyî¹²⁰ da ji bilî dema borîya têdeyî bi lêkerên ku bi dema bê hatine kişandin ra jî tê bikaranîn. Li jêr mimûneyên lêkera *çûnê* ya xuyangî yên wiha hene. Ev her du nimûne ji hin alîyan ve pir balkêş in. Wateya ferhengî ya lêkera *çûnê* ya xuyangî û lêkera bingehîn di her du nimûneyan da yek e. Yanî heman lêker in. Di vir da lêkera *çûnê* bi erka xwe ya xuyangî derdikeve pêş. Di van mînakên jêrîn da lêkera *çûnê* li lêkera bingehîn wateyeka wekî *va ye, aniha* bar dike. Yanî wateya lêkera *çûnê* ya nimûneya ayê *Va ye ez ê herim*. Di nimûneya byê da jî wateyeka gelekî nêzî ya jor heye û hevok dikare wiha bê şîrovekirin: Wateyên wekî *Em ê vêga biçin*, heta *Em vêga diçin*

¹²⁰ Bnr. Beşa Xuyanga ku di Dema Borîya Têdeyî da bi Bêjeyan Çêdibe

yan *Em yê çûnê ne, niha û ne dereng*. Loma jî divê li ber çavan bê girtin ku xuyanga ku lêkera *çûnê* dide lêkerên bi dema borîya têdeyî kişandî û demên din ne wekî hev in. Di nimûneyên jêrîn da tê dîtin ku lêkera *çûnê* ya xuyangî wateya bidawîbûnê (terminative) nedaye lêkera piştî xwe. Lê lêker ji nav wextê bê yê berfireh (bêdawî) girtiye û nêzî dema niha kiriye. Bi gotineka din îhtîmala pêkhatina wê bilindtir kiriye.

(72) a. Hecî go: Ez ê **çûm** herim. (1/311)

(Hecî got ku: Ez dê çûm herim.)

b. Go: Xweha'm, de em î **çûn** herin (1/335)

(Got: Xweha min, de em dê çûn herin)

4.2.3.3. Lêkera Gotinê

Ev bikaranînen ku li jêr hatine dayîn ji alîyê morfolojîyê ve wekî lêkerên ku bi dema bê hatine kişandin xuya dikin. Lê dema ku mirov baş bala xwe dide wan dibîne ku ev lêker êdî bi xwe ra tu demê terîf nakin û wateya wan ya ferhengî jî têk çûye. Lêkerên wiha tevî fonksîyona xwe ya dema bê ji wateya xwe ya bingehîn dûr ketine û wateyeka wekî “*Ji bo nimûne ..., Ferz bike ku ...*” didin. Li jêr nimûneyên ku ji MVXyê hatine girtin hene.

(73) a. **Ez ê bêm** heşt in, deh in werhasil. (4/3)

(Ez dê bibêjim heşt in, deh in werhasil.)

b. **Ez ê bêjim** ji Dêrdîlê heta bi Xerabê Bena. (4/9)

(Ez dê bibêjim ji Dêrdîlê heta bi Xerabê Bena.)

c. **ez ê bêjim** bira weka Nisêbînê. (4/99)

(ez dê bibêjim bir wekî Nisêbînê.)

4.2.4. Lêkerên ku Mesdera Wan bi -andinê Diqede di Dema Bê da

Heman taybetîya lêkerên têper yê ku bi -andinê diqedin digel dema niha di dema bê da jî tê dîtin. Dema ku ew lêker dikevin forma dema bê li ser reha dema niha tên kişandin û erka têperîyê di kurmancîya nivîskî da bi -îyê pêk tê. Lê ev

morfem wekî ku navborîyê jî destnîşan kiribû¹²¹ li herêmê ne wekî -îyê wekî -êyê derbas dibe.¹²² Wekî: (*wê*) *bîqulibênê* û (*ew dê*) *bîqulibîne*. Ev rewş ji bo raweyan jî derbasdar e. Li herêmê ji alîyê morfolojîya xwe ve formên wiha tên bikaranîn:

(74) a. naxwa ez ê çilo xeleva wî **vegerênim**? (4/25)

(nexwe ez dê çawa xeleva wî vegerînim?)

b. ez ê te **şîyênim**. (1/274)

(ez dê te bişînim.)

c. wê xwa **edilênê** wû ê, wê xwa zer kiyê û wê **qurpênê**. (2/104)

(dê xwe biedilîne û bê, dê xwa zer bikê û dê biqurtîne.)

¹²¹ Bnr. Beşa Dema Niha Lêkerên ku Mesdera Wan bi -andinê Diqede di Dema Bê da

¹²² Altunışık, *Cihêtiyên Kîşandina Lêkeran Li Herêma Torê*, r. 14.

ENCAM

Di dawîya vê xebatê da bi giştî encamên li jêr hatin bidestxistin. Ji bilî demên ku di vê xebatê da hatine çespendin, demên din yên ku di pirtûkên rêziman da xuya dikin di vê xebatê da cih negirtine. Lewra ew di nav metnê vê xebatê da nehatin çespendin. Ne ku ew dem tunin yan jî dem bi tenê yên di vê xebatê da ne. Divê di serî da bê gotin ku hewce ye ku hem hejmara deman û hem jî encamên din di nav sînore vê xebatê da bên nixandin. Ev xebat jî li ser devoka Torê, bi mînaka gundê Xerabê Bena, hatiye kirin.

Demên devoka Torê yên ku di vê xebatê da hatin çespendin ev in: dema niha, dema bê û demên borî. Demên borî di nav xwe da dibin çar cûre: dema borîya têdeyî, dema borîya temam, dema borîya domdar, dema borîya dûr. Li jêr ev dem û îngilîzîya wan di tabloyê da li bal hev hatine dayîn.

	Demên Devoka Torê	Ev Dem di îngilîzî da
1.	Dema Bê	Future Tense
2.	Dema Niha	Present Continious Tense
3.	Dema Borîya Têdeyî	Simple Past Tense
4.	Dema Borîya Temam	Present Perfect Tense
5.	Dema Borîya Domdar	Past Continious Tense
6.	Dema Borîya Dûr	Past Perfect Tense

Piştî ku demên navborî li ser xeta demê hatin bicihkirin hat dîtin ku sîstema sê parçeyî (borî, niha, bê) li demên devoka Torê tê û ev dem bi awayekî zelal di vê sîstemê da cih digirin.

Demên di devoka Torê da ji alîyê xuyangê ve hatin pênasekirin. Di vê xebatê da sê cûreyên xuyangê hatin çespendin: xuyanga temam, xuyanga berdewam û

xuyanga adetî. Di navbera dem û xuyanga lêkeran da têkilîyên xurt hatin çespandin. Wekî nimûne: Carinan dem û xuyang bi heman morfemê ava dibe: Wekî –*diya* dema niha. *Ez diçim*: (dema niha-xuyanga berdewam)

Piştî ku demên navborî ji aliyê morfolojîya xwe ve hatin şayesandin û ji aliyê erka xwe ve hatin danasîn, hat dîtîn ku ji bilî çend rewşên bider demên di devoka Torê da ji aliyê morfolojî û erka xwe ya sereke ve wekî demên kurmancîya nivîskî ne.

Rewşên bider yên erk û morfolojîya deman di devoka Torê da hatin çespandin. Di van tesbîtan da yên ku herêmî ne, hatin destnîşankirin. Hat dîtîn ku ji aliyê erkên xwe ve gelek rewşên bider yên deman di devoka Torê da hene.

Di têkilîyên deman da di çarçoveya metnên vê xebatê da hat dîtîn ku di devoka Torê da pevguherîna deman bi awayekî têrbelav xuya dike. Dîsa hat dîtîn ku pevguherîna deman ji bilî çend bideran di navbera demên ku li ser xeta demê nêzî hev in çêdibe.

Demên ku bi lêkera *bûnê* tên bidestxistin ku bi bêjeyên ku di eslê xwe da ne lêker in çêdibin di devoka Torê da di van deman da xuya dikin: Dema niha, dema bê, dema borîya têdeyî.

Amraza *îyê* di devoka Torê da bi awayekî berbelav heye. Hat dîtîn ku amraza *îyê* di dema niha da û di dema borîya têdeyî ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe da xuya dike.

Di vê xebatê da hat dîtîn ku di devoka Torê da di dema niha, dema bê, dema borîya temam û dema bê ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe da kesên yekjimar yê duyem (tu) û sêyem (ew) ji aliyê morfolojîya lêkerên xwe ve wekî hev tevdigerin. Li aliyê din di dema borîya têdeyî, domdar, dûr û di dema niha ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe û borîya têdeyî ya ku bi lêkera *bûnê* çêdibe da ji hev vediqetin.

ÇAVKANÎ

- ABI, Abdulmenaf, **Di Kurmancîya Jorîn û Kurmancîya Nawerast de Qertafên Lêkeran**, Zanîngeha Wan Yüzüncü Yılê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Wan 2018.
- AHANOV, Kaken, **Dil Bilimin Esasları**, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2013.
- AHMAD, Baîz Omar, **Têns Le Dîyalektî Jorî Zimanî Kurdî da Govarî Badînî**, Kolecî Edabî Zankoyî Selahaddîn, Selahaddîn-Hewlêr 1999.
- AKSAN, Doğan, **Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim**, Türk Dil Kurumu, Ankara 2009.
- AKTUĞ, Halil, **Gramera Kurdî - Kürtçe Gramer**, Avesta, İstanbul 2013.
- ALTUNIŞIK, Elif, **Cihêtiyên Kişandina Lêkeran Li Herêma Torê**, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2015.
- AMÊDÎ, Sadiq Bahaeddîn, **Rêzimana Kurdî Kurmancîya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî Hevberkirina Kurmancî-Soranî**, Diwan, İstanbul 2012.
- AYDOĞAN, İbrahim Seydo, **Guman-1**, Lîs, Ankara 2013/a.
- AYDOĞAN, İbrahim Seydo, **Medyatîf di kurdî kurmancî de: Vejîneke sîstema deman** Zend, h. Rêzepirtûk / 20: r. 34-61, 2013/b.
- BALCI, Ayla, **Biçimbilim-II: Sözcük Yapısı** Di Genel Dilbilim-I da, nivîskar A. Sumru Özsoy, Ayla Balcı û Ümit Deniz Turan, edîr. A. Sumru Özsoy û Ümit Deniz Turan, r. 94-118, Anadolu Üniversitesi, Eskişehir 2017/a.
- BALCI, Ayla, **Biçimbilim-III: Çekimsel Biçimbilim**, nivîskar A. Sumru Özsoy, Ayla Balcı û Ümit Deniz Turan, edîr. A. Sumru Özsoy û Ümit Deniz Turan, r.121-149, Anadolu Üniversitesi, Eskişehir 2017/b.
- BARAN, Bahoz, **Rêzimana Kurmancî**, Belkî, İstanbul 2012.
- BEDÎRXAN, Emîr Celadet û Roger Lescot, **Kürtçe Dilbilgisi**, Doz, İstanbul 2011.
- BOZKURT, Aynur, **Kesandina Lêkerên Kurmancî**, Doz, İstanbul 2008.
- BÜLBÜL, Mîkaîl, **Rader (Mesdar)** Zend, h. Rêzepirtûk 10: r. 103-104, 2008.
- BÜLBÜL, Mikail, **Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêziya Wan (Di Dîyalekta Jorî Ya Zimanê Kurdî Da - Devoka Mêrdînê)**, Teza Doktorayê, Zankoya Zaxoyê Fakulteya Zanistên Mirovayetî Pişka Zimanê Kurdî, Zaxo 2017.
- CEGERXWÎN, Awa û Destûra Zimanê Kurdî, Camîa Bexda, Bexda 1961.

- CİBO, Nezîr, **Havêkan Sultanları-1**, Komal, İstanbul 2010.
- CÎWAN, Mûrad, **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Rêzimana Kurdî bi şîrovekirina Tirkî**, Zekisan Matbaa, Diyarbakır 2014.
- COMRIE, Bernard, **Aspect**, Cambridge University Press, Cambridge 2001.
- COMRIE, Bernard, **Tense**, Cambridge University Press, Cambridge 2000.
- DEHQAN, Mustefa, **Gramerek Kurdî ya Garşûnîxet ji Bexdadê** edit. Mehmet Şirin Filiz. Nûbihar, h. 146 r. 6-11, 2019.
- DEMİR, Nurettin, **Ankara Örneğinde Ağızların Belgelenmesi**, Türk Dil Kurumu, Ankara 2013.
- EBDULFETTAH, Deham, **Kar (Lêker)**, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2011.
- EBDULFETTAH, Deham, **Mistek Ji Hêvî û Arîşeyên Zimanê Kurdî (Kurmancî)**, Lîs, Ankara 2018.
- ERGİN, Muharrem, **Türk Dil Bilgisi**, Bayrak, İstanbul 1998.
- ERKANAL, Hayat, **Mezopotamya'ya Açılan Kapı: Nusaybin** Di Makalelerle Mardin I (Tarih-Coğrafya) da, nivîskar Hayat Erkanal, edit. İbrahim Özcoşar, r. 1-16, 2007.
- FARQÎNÎ, Zana, **Ferhenga Kurdî-Tirkî**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2010.
- GIVÓN, Talmy, **Syntax Volume I**, Cild 1. Jhon Benjamins Publishing Company, Amsterdam 2001.
- GÜNEŞ, Hüseyin, **Tûr Abdîn Yöresinin İslamlaşma Süreci** Şırnak Üniversitesi İlahiyat Fakültesi İslâm Tarihi Anabilim Dalı 3, h. 6 r. 71-101, 2012.
- KARAHAN, Leylâ, **Anadolu Ağızlarının Sınıflandırılması**, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2017.
- KARTAL, Lokman, **Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tûr Abdîn/Torê De (Kercos/Gundê Xerabêbena)**, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2013.
- KESKİN, Necat, **Tûr Abdîn'de Bir Kimlik ve Anlatım Biçimi: Mıtırblar ve mıtırplık** Cyprus International University 21, h. 4 r. 57-72, 2015.
- KHAN, Emir Djeladet Bedir û Roger Lescot, **Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)**, Librairie D'amérique Et D'orient, Paris 1970.

- KURDO, Qanat, **Rêzimana Kurdî Kurmancî û Soranî**, Wer. Zülküf Ergün., Nûbihar, İstanbul 2013.
- KURDO, Qanat, **Zimanê Kurdî Rêziman**, Komkar, Frankfurt 1981.
- MEHMÛD, Berzo, **Kopyûle û Paşkok di Rista Kurdî û Hindo-Ewropî de**, Sham 2012.
- MEHMÛD, Berzo, **Rênivîsa Peyva Kurdî Likan û Nelikan**, Beyrût 2005.
- MUHAMMED, Husein, **Rêzimana İnglîzî Bi Zimanê Kurdî English Grammar In Kurdish**, çapa elektronîk:
<https://zimannas.files.wordpress.com/2015/07/rezimana-inglizi.pdf>, 2013-2014.
- MUHAMMED, Huseîn, **Taybetmendîyên Devoka Zaxoyî**, Zend h. Rêzepirtûk 22 r. 101-104, 2014.
- ÖZKILINÇ, Ahmet, Ali Coşkun, Abdullah Sivridağ û Murat Yüzbaşıoğlu., **998 Numaralı Muhâsebe-i Vilâyet-i Diyâr-i Bekr ve 'Arab ve Zü'l-Kadiriyye Defteri (937-1530) I. Arşiv**, T. C. Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü Osmanlı Arşivi Daire Başkanlığı, Ankara 1998.
- ÖZSOY, A. Sumru û Ümit Deniz Turan. **Genel Dilbilim-1**, Anadolu Üniversitesi, Eskişehir 2017.
- PARROT, Jean, **Dilbilim**, Dost, Ankara 2006.
- RÎZGAR, Baran, **Uygulamalı Kürtçe Dersleri Dersên Kurdî**, Doz, İstanbul 2012.
- SAUSSURE, Ferdinand De, **Genel Dilbilim Yazıları**, İthaki, İstanbul 2014.
- SÖNMEZ, Nesim û Resul Geyik. **Xebateka Berawirdkarî (Komparatif) û Dijberawirdkarî (Kontrastîf) li ser Demên İngilîzî û Kurmancî** Nûbihar Akademî 2, h. 5 r. 82-110, 2016.
- TAN, Altan, **Turabidinden Berriyêye Aşiretler Dinler Diller Kùltürler**, Nûbihar, İstanbul 2015.
- TAN, Samî (I), **Du Xebatên Destpêkî Yê Bi İngilîzî Yê Rêzimana Kurmancî: Analîzeke Zimanzanî û Rêzimanî**, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2018.
- TAN, Samî (II), **Hevrûkirina lêkerên xwerû û bingehîn ên kurdî û farisî** Zend, h. Rêzepirtûk 19 r. 96-104, 2012.

- TAN II, Samî, **Hinek taybetiyên lêkerên kurmancî** Zend, h. Rêzepirtûk 13 r. 52-58, 2010.
- TAN II, Samî, Rêzimana Kurmancî, **Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê**, Istanbul 2015.
- TAŞ, Çetin, **Dengsazîya Devoka Çaldiranê**, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2015.
- ÜÇÖK, Necip, **Genel Dilbilim (Lengüistik)**, Multilingual, İstanbul 2004.
- YAŞAR, Şükran, **Mor Loozor Manastırı** Mukaddime, h. 2 r. 119-130, 2010.
- YILMAZ, Ferhat, **Teşenasî (Morphology)** Di Gotarên Zimannasîyê da, nivîskar Barzo Mahmoud, Ferhat Yılmaz, Güneş Kan Yokuş û Yê Din, edîr Kenan Subaşı û Resul Geyik, r. 43-53, Nûbihar, İstanbul 2017.
- YOZGAT, Umut, **Dilbilimde Biçimci ve İşlevci Düzlem** Di Dilbilim Kuramları İki Düzlem Beş Kuram da, nivîskar Umut Yozgat, Özgün Koşaner, G. Songül Ercan û Yê din, edîr. Özge Can, 33-83. İthaki, İstanbul 2018.
- ZAL, Azad, **Zimanê Kurdî**, J&J, Ankara 2015.
- ZAXOYÎ, Îbrahîm Remezan, **Rêzman a Kurdî Kurdish grammar**, Çapxaneyê Hawar, Duhok 2007.
- (Nexşe 4), googlemaps:
<https://www.google.com.tr/maps/place/72300+Seki+K%C3%B6y%C3%BC%2FGerc%C3%BC%C5%9F%2FBatman/@37.6303462,41.4390538,11z/data=!4m18!1m12!4m11!1m6!1m2!1s0x400ba6cbbb1e8d45:0x43add4606570fc10!2zU2VraSBLw7Z5w7wvR2VyY8O8xZ8vQmF0bWFu!2m2!1d41.5061912!2d37.6221361> (05 14, 2019).
- (Wêne 1), nisanyanmap: <https://nisanyanmap.com/?yer=24714&haritasi=seki> (05 15, 2019).

PÊVEK 1: METNÊN XEBATÊ

METN 1¹²³

- (1) Ez qey mi deh sal... Na na, ez î piçûçik bûm. Birayê mi jî... Em çar keçik bûn, birakî me bû. Hê birayê me yî dî çênebûbû. Ez piçûk bûm jî. Jixwa muxtar ne'j terefê me bû. 'Ş terefê dî bû. Birayê'm kira mektebê da. Go kire mektebê da, bavê mi go: Lawo, win çar keçik in û birakî we ya. Wê tirsê, mielim, piçûk a,
- (5) nikarê... Ji mi gelekî piçûktir bû. "Em ê te'j dêlê va kina mektebê." E'j dêlê ve kirma mektebê. E'j dêlê ve kirma mektebê û me mekteba xwa xwand û şeş sala çûma mektebê û piçûk bûm. Wela me tade jî dît û me serma jî dît û me rebenî jî dît. Ê meelimê nû bûn û hê nû mekteba vebûbû. Ê piştî go e'j mektebê derketim, bavê'm ez dam vêca. Ez, hina xwa hewce kir, ez dama wa. Ez î piçûk
- (10) bûm jî. Mi yanî hatin go go: Weleh... Cîranekî me bû, hingî î sehîd î avzel bû. Bavê mi gotibûyê gotibû: Namûs ne tê, hema go ti bê çî mi li ber te bê gotin a. Îdî wî çaxî ew camêr daabûna pêşîya xwa wû hatin. Axir ez, ez damê da. Bavê mi go: Go çî bê, mi soza xwa gotiya, ez tê navegerim. Ê vêce'm zarok bûn. Ma me paleyî tkir, me nekiribû, em tikirîn, me paleyî kîr. Me xaniyê go a xalê,
- (15) kurxalê wî xera bû û vêca ew erd hemi em bûna miribayê wî. Ma de vêce wera, îdî erdê di mala, wera vêca wera aşêfa wa, wera paleyîya wa, wera gêra wa, wera hılanîna wa, danîna wa. Ê mi nikarîbû, e zaro bûm û me axir me heta me derbas kîr. Me ewk kir û em rabûn vêca me erdê xwa, zadê xwa hılanî. Me zadê xwa hılanî. Ba îdî me'j xwa ra rezê me nebû, mewîjkka me jî nebû. Min û
- (20) wî her dka me erdna me hebûn, ma, me vewejardin û ma kolan û ajotin û me'j xwa ra di reza xwa danîn. Me mêwê xwa tê da danîn û heta bûna rez û ha îdî me tîreh ji wa tiquraft û me dîms çêtkîr û me mewîj çêtkirîn. Sed pezê me hebû. Çil-pênceh meh bû wilqa mêşin bûn. Çar çêlekê min a zayî bûn. Mi pênc key dew dikeyandin û hê nû ez î vêce rabim çima îş. E tçûma avdanê, e tçûma
- (25) paleyîyê, e diçûma dora pêz. Feqîrîya dinyayê bû, nebû. Ew carna tçû îş, hemi mi tkir. Ez î rabim vêca çima dora avê. Êvara me êvara, xelkê bi ro savarê xwa dikeland. Me êvara tkeland, me digo da'm sibehî herin, dora ma avê ya, em

¹²³ Ev metnê ku jênenîgarîya Adula Turğut e, ji Adula Turğuta ku 72 salî ye wekî deng di sala 2017an da hat tomarkirin.

avdana xwa bkin. Mi dimsa xwa'b şevê çêtkir. Û de de de de heta go me zarokê me... Xwedêwo ê hazira jî bêhlê, ê me jî mezin bûn kom û kufletê... Me rez

- (30) xwa ra danîn, bûne rez. Em bûna xwedîmewîj, em bûna xwedîpez, em bûna xwedîzaro. Û me kîr û û ma rezê xwa, mewîjê xwa didanîn û me îşê xwa hemî tkir, mi tkir. Pezê me li mal wî sibeha derkevê, ez î ez î çim ava wa mi ji kanîyê dikşand, ji camîyê dikşand. Ez î vî sewalî hemikî'b mila av dim. Ez î rîxê bin wa avêjim. Ez î çiloyê wa avêjim, ziblê wa avêjim. Ez î wî pezî av dim, êm
- (35) kim. Û vêce zaro jî a'd stûyê mi da bûn. Kom û kufletî mi jî hebû. Ez'b tenê bûm. Û wilo de heta ew î çê bê: Ez ê çime nêçîrê. Î rajê çifta xwa çê çiyayê Mava û mi mi îşê xwa'y mal tikir. Mi ê derve dikir mi ê hindurû dikir. Ma ne jixwe Xwedê zanê. Çûma ber dewrê pêz, dihat, e dçûm ê karika, ê dewêr. Mi tkirin. Mi îşê derve jî tkir, ê hindurû jî tkir û'm ê mala bavê xwa jî tkir. Mala
- (40) bavê mi, bavê mi, mala bavê mi li Batmanê bû. E'l, e'l gund bûm. Bavê mi dhat îşkê xwa dkir. Mi arî tkir, mi şîva wî çêtkir, mi xwarina wî çêtkir. Mi banê wa dgerand. Mi dmalişt. Mi îşê wa jî tkir û mi yê xwa jî dkir. Êdî diya mi ew dihatin, dihatna ser fêkî havînî. Go dihatin heme î bê: Keça'm de wele lawo va jinbira ta çûya Binkêlbê cilê... Ez î kevima ber cilê diya xwa, şom. Mi ê wê jî
- (45) dşîştin mi ê xwa jî dşîştin. Ez î nanê wê çêkim, ez î ê xwa çêkim. Ez î ava yê bacana çêkim, ez î ya xwa çêkim. Ez î hewdela wê çêkim, mi ya xwa jî çêdkir. Ez î... Hema çi bana, mi jê re jî dkir mi ji xwa re jî dkir. Arî dkir yardim dida wa, îşê wa. Wa jî qewet dida ma. Wa jî çi. Wa jî li me dimeyîzand. Feqîrîya dinyayê bû, nebû. Xwarin halo n'a'b têrayî bû. Feqîrîya dinyayê bû, me's xwa
- (50) ra îdara xwa dkir, nebû. Ma halo ceylan hebû, ma ma sobe hebû, tifika da agir dkirîn. Me'd tifika da agir dkîr. Me çira pêdxist. Me çira pêdxist, li ber çirayê dirûnîştîn. Lampe jî nebûn. Û'b wî halî... De de de de de me heta me me... Bû ferehî. Wileh nan jî nan me nanê ceyî dxwar, me ê nahkî txwar. Weleh me nanê nahkî txwar. Mi dgo... Me ê ce û nahk tevî hev dikir me txwar. Em î'j xwa ra
- (55) elbek di elba xwa genimî her kesî go'b dest wa dket wî hêrin ji paşîvê ra. Bê: Vê miha rojîyê, em ê vî nanê paşîvê, bere î genimî bê. Wekî dî me ce dxwar. Û nebû ne zeytûnik hebû, ne penîrik... Penîrê me hebû. Wextê dewarê me çêbû penîrê me yî zahf bû, pezê me, şîrê me, mastê me... Wele'm beroşa cila da mi rûn diheland. Ê wextê go nebû, nebû. Tişkî me nebû. Wele dibû bihar, mi çav li

- (60) xwarina germ me nedkir. Diya mi dgo: Lawo, vê ha vî savarî êvara îne şî xwa re biba. Mi go: Yadê, savarê me yî zahf a. Ê dgo: Lawo, xwezî te wilo negotibana. Hema biba, êvara îne ya, biba. Halbkî ha tiştik di mala me de nebû. Nebû jî mi netanî. Mi netanî ser, mi nedigo: Ez î feqîr im, nîn a, a wele'm bixwin, a em halo bikin. Wele avîyê ma e'l xwar, qûnaxa heta çî çaxî bûn. Avî,
- (65) bavê mi, ya bavê mi cîranê me bû. Dikirna bacan, dikirna bîber, dikirna ê reş. Digo: Keça'm, gunhê mi'd stûyê te de bê go't neçê têra xwa ji avîyê neênê. Nîzêkî me bû. Devê devera bavê xwa rokê nevekîr û mi neçû çar bacan jê neanîn. Go: Tê çê lawo û mişmişê we hê çênebûna, hera a hûr in darê wa. Hera, têra xwa biba paleyîyê, mişmişa biba, sêva biba, têra xwa biba. E nedçûma
- (70) binê sêvê bavê xwa, nedçûma binê mişmişê bavê xwa. Mi dgo: Çilo ez ê çim, mişmişê bavê xwa ênim û ez ê xum! Mi rojekê... Me nanê xwa wilo ziwa dxwar. Weleh Xwedê zanê. Pîvaza xwa dişkand û mi libik xwê pê ddakir. Ê mi nedçû bacanik ji avîya bavê xwa netanî. Ê ez î xum û ez î xum. Heka misilmana yek da ma, em î'j destê wa girin nedana ma, me nedxwest jî. Me
- (75) nedgo: Ka bacanê me nîn in, ka filan tiştê me nîn a. Ê zahf me rebenî dît. Wele me zahf rebenî dît, me zahf feqîrî dît. Ê'l hemdê Xwedê re şikir. Bû ferehî, va vêga ferehî ya. Em a'l ber ceylanê na. Em a di xaniya de na. Xaniyê betonkirî na. Me sê cara xanî çêkir. Me carekê'b dara çêkir, me carekê'b herîyê lêkir. Me careka dîtirê kire aqir û heta îdî de de de rojê me rêzik lêdkir. Kes nedahta arî
- (80) me. Berberîya gunda bû. Mala bavê mi dgo: Wela zilamê wê neyarê me ya. Ê mala xalê mi dgo, xwedîyê wî dgo: Edûla neyara me ya. Nedhatna arî ma. Me rojekê me rêzik lêtkir. Me rojekê... Belkî belkî mêhkê di meha heta me aqira xwa timam kir. Ê ser jî me çêkir eynî wilo. Me dgo: Mê çilo va cama tişî kin? Kesî zixurik netavêtin, arî me nedkir. Me'b wî halî me xanî çêkîr û me aqir
- (85) çêkîr û me ser çêkîr. Ê mêwik di devê derî de danî û cihê me xweş bû. Ê xwedîpez bûn, xwedîdewar bûn û em xwedîmal bûn. Ê ha kuramê wî'j Edenê hat. Go: Wera wer. Çav li me kir go halê me'y xweş. Gote kuramê xwa go: Wer, wer em ê çîna Edenê. "Heyra, em naçna Edenê. Tiştê me'y go ti'j me re bikirê, tenekek dohn bikira û xwêna ma û sabûnna ma. Her tiştê me'j malê tê.
- (90) Yax a zahf a, penîr î zahf a, mast a zahf a, wela." Me sê dermale digurandin. Ê Xwedê wekîl a, ha vêga em yanî eyd jî tîn, em di kîlokê nakirin naxun, nikarin

- bixun. Nîn a, naqedê go'm bixun. Me sê dermale digurandin. Xwedê wekîl a beranê go me gurand go lê siwar bûba piyê wî nedgihana erdê. Me'w gurand, me conega gurand û me hevûrîk jî gurand. Goştê me maabû havînî. Havînî me
- (95) dibakira... Kuramê mi cîranê me bûn. Me'l êgir fikir, ez î beroşkê'l êgir kim, bê: Mihema Silîm! Bavê wa digo: Wera wer da win me jê xilas kin. Me dîkir û nedîkir goşt jî mala me xilas... Ê de ka vêga welah nîn in û heywan nîn a w'b pera yî beha ya û naqedê. Em ê mirîşka dixun, em ê mirîşka dixun, em serîya dixun. Heta de de de de de me go em ê çîna Batmanê limêjeka paqij kin em ê
- (100) çîna Batmanê. Mê'l Batmanê rûnin. Em hatna Batmanê. Çûna Edenê. Edenê, di sala li Edenê man, şixulîn û me xanî, erse kirî û me pirîket kirîn û me demir kirî, me go em ê xanîyê xwa'l Edenê çêkin. Me hazîrîya xwa kir. Kuramê min û yekî lev dan. Go lev dan zîlamê mi go: Wellehî em ê çîna... Em ê'b wa ra çîn. Hey xelkê, xwedîyê wî gotnê go: Neça, heyra! Ti xerîqî ya, li vir ba. Go:
- (105) Ebeden, go Silêman herê, em li vê rê namênin. Rabû me demirê xwa fîrot û me tûlayê xwa, pirîketê xwa fîrotin û me ersa xwa fîrot û em hatna Batmanê. Go'm hatna Batmanê, perê ma'd destê me de man cohtik bazînî me ma. Cohtik bazînî me ma. Vêca erse jî, zêr ket. Go zêr ket, ê wî go: Wela ez nakirim. Bavê wa go: Ez nakirim. Bavê'm gotiyê go, go: Mihemed, go ti di zêr da bixesirê, tê'd ersê
- (110) de kar kê. Erseka xwa bikira. Me rabû birayê mi hat. Birayê mi Hecî Mihema Salih jî me timama ra erse kirî, ava me anî jî me ra. Yanî Xwedê bidyê da. Zahf yardim dana ma. Ji me ra kirin û me xanî arî hev kir. Me pêşî ê Silêmano çêkir. Me go... Silêmano birîndar bû, lev dan, bêbextî lê kirin, neyar bûn, kêr li qelpê wî dan. Bê çend roja'd yoxinbaqimê da ma. Em hatin. Ê go lev dana'w cîranê
- (115) hev bûn, go:'M hew çavê me'b hev bar dibê. Em ê rabin çîna Batmanê. Em jî hatna Batmanê. Em hatin, kuramê yî hata mala ma, go, go: Na, neçîn. Go: Neçna'b ser Silêmano da. Go: Wa jixwa nexweş bûya. Neçîn. Mi go: Çîma, xalo? Mi go: Wextê go serê we têşê'z berî kuramê we têma serîya ddima wa. Ew jî kuramê min a. Me, me sixêf nekirna kesî, em neçûna pêşîya kesî. Sîleh
- (120) me'b destê xwa negirtna. Me dar bi destê xwa negirtna. Ê dçim pîrsa kuramê xwa dîkim. Ez ê çim wela. Wî jî go: Na. Wela Hecî Fexrî. Em ê çin Xwedê wekîl a go min û kurê mi her sêka di vir da bikujin. Go: Meyzêna! Lêdan heya.

- Kuştin heya. Girtin heya. Go: Bere bê. Ez qîma xwa'b hemika tênim. Go li serê cadê me bikujin, win newna ser cenazê me jî. Nîzêkî me nebin. Bere we
- (125) nekujin. Ê ma me qîma xwa pê anîya. Em rabûn ji Edenê hatin. Go'm ji Edenê hatin birayê mi'l vê rê erse'j me ra kirî. Ji me timmama ra kirî. Em heft heşt mal bûn mel ba hev kirî. Go:'L ba me jî bikra xweha'm. Mi go: Welah birayê'm em tev da hatina. Îro em xwa'j wa veqetênin, wê bê: Wela meyzê, çû mala birayê xwa. Em tev da toplan hatina, em ê tev da kirin. Em ê tev da ersê kirin.
- (130) Xwa'j wa qut nekir. Mi'j wa xwa'j wa qut nekir. Axir me go: Em ê pêşî... Go: Em ê çi kin? Me go: Wela Silêman î'd kirê de ya. Birayê mi hata pêşîya erebê. Em anîna mala xwa. Xweha min a dî jî a li mala wî bû. Em anîna wir, me go: Wela birayê min î piçûk jî hat, go: Xweha'm, werna ba ma. Em ê we bina malê. Mi firax firaxê te birina mal. Werna ba ma. Şikrîya a'l ba birayê me ya.'L ba
- (135) Hecî Mihema Salih a. Win jî werna ba ma. E çûma ba birayê xwa Hecî Evdikirîm. Em neh meha'l wê rê man. Xwedê bidê wa. Xwedê bidê hazira, bidê wa jî. Go em bê'j me ra nekirna ji me ra gelek kirna. Lê hema me jî kir. Ewka ma lev nîn a. Me nedgo: Wela me kiriya û wa halo kiriya. E nabêjim ti cara. E dibê: Wî'j me ra kiriya, wa'j me ra kir. Ê vê carekê îdî rabû em hatin.
- (140) Go'm hatin kurkê me jî... Me'j xwa ra erse kirî. Me go em ê xênî ava kin. Xwedê bidê wa. Birayê mi hatin. Yekî bû kefilê me, dan çimento, ê mazin. Ê çimento, ê wa û ê demir û ê tişt. Ê dîtirkê jî hosta bû. Ji me ra qalib kir û de bê çi kirin dîwar lê kirin û çêkirin. Xwedê bidê wa. Xanîkê me çêkirin. Zilamê min û her'd zarokê xwa çûna Antalya, şixulîn. Perekê xwa dan hev û anîn. Wa
- (145) jî yardim da ma. Me xanîkê xwa çêkir. Ew û kurê xwa her dû çûna Antalya. Go: Bere ê dî jî werê. Ê dîtirê jî me'b wa va şîyand. Her sê şixulîn, anîn, me deynê xwa... Tebla serê bîn ma, me ew tebla serê bîn, perê ma neman. Dane ma, yardim jî dane ma. Me, ma, me çû pêşpelik deyn kir. Me anî betona ser jî me rjand û em wilo hatin ketna xênî da. Xwedê heq a, ax bû. Em hatna ser axê,
- (150) me avreşandî kir û me dewisand. Ê me livînkê xwa'w firaxkê xwa, zarokê xwa tê da danîn. Ne cam bû ne derî bû. Ma tişkî wî nebû, xanîyê vekkirî bû. Rabû, çû gund. Ê gund derî û û demirî û her'd cam û derîyê nava odê jî anî, li ber odekê dan. Em ketna wê odê da. Ê dîtirê vekirî ma, hetta go me go: Bêhna fereh em ê... Hê me xwa neda hev, (Destên xwe lev dixê.) kurkê mi qeza kir.

- (155) Qeza kir, dîse yardım dana ma. Go ne'j xwedîyê mi bana yanî belkî go ez î'l Edenê bana halo yardım nedabana ma xwedîyê wî. Dîsa he ro em çûna Diyarbekir. Birna Diyarbekir, razandin. Axirê wêna ma. E jî çûm. Ez hatim, mi go ez ê çima... Jinama mi go: Wera, em ê çina Qerolê. Ma ti neçûya? Mi go: Na. Go: Maxerabê, ev sê meha çilo't neçûya! Mi go: Jinamê, mêvanê mi hena,
- (160) îşçî na. Bi Arifo ra tçina îş, qûmê ddagirin. Cilkê wa dşom, xwarina wa çêdkim. Zarok a hûr in. Go: Wera, em ê çin. Êvarî jî vêce'm xewna wî dît. Mi xewn dît. Mi ddî, vêya cîranê ma, diya wê hatibû pey. Diya wê mirî bû. Hatibû. Mi dî, hata devê derîyê ma, rûnişt. Go, go: Adûla, Mi go: Ho! Go, go: Ne'z hatima pey Salîhê, Silêmano naşîyênê. Mi go: Hêdî, 't ka hêdî ma... Go... 'P
- (165) Xwedê nizam ne dermale bûn, ne dawet bû û ne çî bû. Mi go: Hêdî, hêdî bê çilo Kekê Silêman naşîyênê. Ez ê êm bêjimê da. Wextê ez rabûm jinik berî mi rabû. Savarê xwa, savarê hişk ji dawa wê keta dawa mi da dawa mi da. Em jî jinama mi hat. Ez û jinama xwa em piya çûna Qereyolê. Vêce demir û demir dçûn. Vêce mi jê re digot. Mi dgo: Jinamê, halo mi xewn dîtîya. Halo bû, halo
- (170) bû, halo bû. Mi jê re got. Em çûn wê şevê me go: Mê vezerin. Mi go: Em ê çina malê. Go: Ma... Kurikkî me, xulamtiyê ji hazira re bikê, î piçûk bû. Ha yî halko bû (Destê xwe bi qasî metreyekê hildide.) Nîhet. Mi'b xwa re biribû. Go: Nîsk bê, savar bê, tişt bin. Kîsik avêtbû milê xwa wû hema'b hindurû da diçû û dihat. Mi go: Em ê çina malê, bes a. Sibehî'v em hatina, em ê çin. Go: Ma
- (175) Mihemed, jinama mi, albay ya, çî ya! Mi go: Jinamê, ne go ew nabêjê, nabê çima ti nehatîya jî, zarokê'm dçina îş. Gorekê wa na, cilê wa na; xwarina wa, taştêka wa ya. Zarok a hûr in. Go ne'z wa biedilênim nikarin. Keçik e hûr bûn. Rabû wê jî wû diya mi jî ewka rûwê'm birin. Mi fihêt kir, e jî rûniştim, e nehatim. Çilo wê şevê, wê roja dî'j nava Antalya Arifo, mixaletîyê mi bû, kurê
- (180) xaltîka mi bû. Ji wê rê didê rê û firaxê xwa, jina yî nadagrê cilê wî, ew tikê çenta. Dibê: Ez ê çim da, ez herma wê rê bişixulim. Ma ne qencîya Edûla, ma ez ê çilo vêca xelefa qencîya wê vezerênim sala îsal? Ev sê meha mêvanê mi bû. Di şeva nehata mala mi. Şevkê çû mala xezûrê xwa, şeva dî jî nizam, di şeva nehat. Ê'b qedr û merîfat. Ê ez î soba darim, ez î êgir kim û ez î xwarina
- (185) wa ênim. Rojekê hat go wî tursîlkka halo (Bi destê xwe nîşan dide.) anîya. E dibê hema tiştî dî... Mi go: Arifo meyzê, go vêga te dilê xwa ne ewk

- nekiribana ez î vê tursîlê kima nav vê herîyê'w pê lê kim. Mi go: Ma cilê te ji boy tursîlê, tursîla... Em ji bo cilê te tursîlê dkin! Roke dî şaş neba, tiştê neêna mala ma. Pirdeqal anîbûn. Kurik go: Yadê, mi pirdeqal kirîna. Axirê
- (190) wêna ji nava Antalya didê rê'w tê. Ji nava Antalya ddê rê, tê. E jî ne yî'l mal im. Tê mala ma. Tê mala ma, dibê: Em ê sibey şevêqê çine qûmê. Hey bavê wî dibê: Heyra, miştrîyê ma nîn in. Ka da'm hina bibînin. Ka'm halo bikin, Edûla jî n'a'l mal a. Zarok in, ewk in. Dibê: Na em ê'ş xwa ra ênin. Em ê'ş Tahiro re ênin. Dikî û nakin mator'j devê dêrî nabê rast. Dikî û nakin xera dibê wû
- (195) naçê. Go: Edula, ma çend gurzîk hejîk jî me kirna bin da û me kiriya wû nekiriya me dahf daya me çî kirya. Go: Mi kir û nekîr bî ya mi nekîrin û çûn, çûn. E jî wê şevê li mala bavê xwa mam. Ez mam lê hema dilê mi ne yî rihet bû. Ez hatma malê. Go'z hatim, sibeyî'z hatim, jinama mi go: Adûla em ê çin, Lûqman birina qîstexanê. Kurkê birayê mi. Go: Birina, em ê çin serîkî dinê da.
- (200) Ê îda ez ê'j Zekî ra telefûn kim, Zekî kurkê wê bû, li Izmîrê bû Izmîtê bû. Ê ti wera mala xwa'w e jî ez ê çima gund. (Destên xwe li hev dixê.) Ê mi go: Jinamê esil tû yî. Em hatna nîvê rê go'm bighîna nîzêkê mala birayê mi, û mi dî bavê wa hat. Ga çakêtê xwa, zendîk kiriyê da û ya dî ber ra tê. Anî ji heycana xwa, çakêt li xwa nekiriya ha. Zendîk kiribûyê û çakêtê'y dî wilo dî ber ra pişt
- (205) ra dihat. Go: Keçê, Adûla çima Mihemed wilo ewk tikê wû tê wû û çakêtê xwa nizam? Mi go:'J ku zanim jinamê? Weka go'z ne'l dinyayê bûm. Yanî hişê'm hingî çûbû. Mi nizanîbû go anî çilo ye jî. Em hatin, gihana nîzêkî mala birayê mi, gehana ma. Go: Wela Enwer qeza kiriya. Enwer, li ku qeza kiriya? Go:'L Girbereşk qeza kiriya. Hey hewar a, hey bî vir da hey bî wê da. Ê birakî'm çûbû
- (210) Heskîfê, meeşçîyê. Ê dîtirê jî'l Qerolê bû. Rabû me Feysel şîyand, birazîkê'm kurê birayê mi me şîyanda pey ê Qerolê. Ê dî çûbûna Heskîfê ew û Feyzîyê Melê'w çûbûna meeşçîkê, çûbûna Heskîfê. Rabû, serê te neêşênim serê we neêşênim, rabû îdî heta ê dî nehatî ê min î ê Heskîfê hat, ê mazin hat. "Çi bûya?" Me go: Enwer qeza kiriya. Go: Raba raba Adûla raba. Mi go:'J ku ra wî
- (215) ya? Go: Serê wî ya. Mi go: Wela, narabê. Em rabûn vêce, bî dilê kul em hatna xeracê. Em li erebê siwar bûn, em çûna Fekûlta. Em çûna Fekûlta. Mi zêde kirin. Ez ber çopê sekinîm. Cilê wî jê kiribûn, avêtbûna ber çopê. Mi go: Hêdî

- ma cilê wî çawa na? Hema weka go ti'd xwînê da bistirê. Mi go: Lawo wekî cil halo na, ka tê'l ku rabê'j mi ra. Heta mi wilo got ez hatim, ew berî mi gihana
- (220) (Destên xwe lev dixê.) gihanê da. Gihana birîndar, gihanê. Xalê mi go, xalê wî gotyê go: Xwarzê, kû ra te têşê? Bavê xalê xwa, kû'r? Go: Serê mi. Bavê wî go: Bavê bavê'm kû ra te têşê? Go: Serê mi. Heta'z hatim ji tevgê ket. (Destên xwe lev dixê.) Mi kir û nekir'b mi re neştexilî. Mi gota ê qapîcî mi go: Mi ber da, da'b mi re biştexlê, meyzêna'z dey nakîm, ez qerebalixê jî nakim. Hema ez
- (225) ê dengê wî kim. Mi go: Enwer! Enwer! Go: Oo (Bi zarî lalan dike.) û hew. Mi dengê wî jî nekir. Ê em mana sekinî'ş xwa ra. Şi xwa ra rûniştî. Em girîn. Ma hezna xwa kişand. Em qeherîn, em hatin. Roja lehdê bû. Ewk jî nebû. Dever e girtî bûn û bilgîseyar û tişt ne weke vêga bû. Birna çarçiyê û carke dî'j çarçiyê anîn û birn kirna qistexanê da razandin. Ê me jî da rê û'm hatna malê. Em
- (230) hatna malê, em. Mi go: Herin, Arifo bînin. Arifo jî şifêrê matorê bû. Wextê'b rê da matorê tajon, matora wa dsekinê, xera dibê. Yeke dî di cadê va tê. Dibê: Bira, wera matora me bajo. Wextê matorê dişixulênê, tajoyê ya xwa wû tajoyê. Enwer dibê: Wela, (Destên xwe lev dixê.) matorê xilas bû, çû. Didê pey matorê. Dibê: Evdîlqadîl, vegera, hera'l çakûç meyzêna. Belkî, ya Rebî, Xwedê
- (235) xera kirbû, yiqîn bika, nemabû, emrê wî wilqa bû. Heta Evdîlqadîr divegerê çakûç, Enwer. Ê mator disekinê. Enwer digihiyê da. Nabê: Ma xwarzê, ka te vekir nevekir? Ma ne'm nizanin vêce ne matora wî ya, ne ya Arifo ya. Em jî yanî Xwedawo... Ne neyarê me ya, mêrik nas jî nakin em nizanin î'j ku ya jî. Dilgêvê, tavêjê fitêşê ssiya, serê wî dkevê (Destên xwe lev dixê.) neqeba her'd
- (240) matora. Wextê dikevîyê da xelatê navekê, şiqkî dvekê, yê dî hê nevekirî ya. Peya dibê mêrik. Ê dibê qerp û li qaldirmê jî dkevê. Evdîlqadîr go: Nîzêk bûm, go digo: Ay, yadê! Go mi go: Ha'p Xwedê xwa kira ber da. Em hatin go hema xwîn î di dev û bêvila va tavêjê. Ne kes, ne kûs... Em her dû mana şilay, ji xwa ra sekinîn. "Xalo, da'm vî kurkî bibin bavêjin qistexanê, derkê." Go: Hê wilo,
- (245) me dî me ereba Girbereşk hat. Go ereba Girbereşk hat go hema peya bûn emele, miştrîyê xwa danîn û Enwer kirnê da'w ajotin. Anîna Sixurta. Xwîna wî sekinandin. Go: Hewaleyî Diyarbekir kirin. Go hewaleyî Diyarbekir kirin, ew çû. Bi teksîyê birin û em jî bi wa da, pey wa da'b teksîyê çûn. Em çûn ga va ser textekî dirêjkirî ya. Ne dev a ne ziman a, ne kes a ne kûs a, ne ay a ne ûy a. Me

- (250) nedît. Em rabûn wê şevê man û em... Axirê anîn, kirna yoxinbaqimê. Em jî hatna malê. Mi go: Herin Arifo bênin, birazî. Textor hewqa'l ba mi gota mi go, go: Sukra wî şikestî ya, Go: Kezeba wî bela gihayyê. Go: Ha'v dira wî çatlemîş bûya. Hecî digo: Ma çima çavê wî navebin? Go: Ji hindurû va çatlemîş bûya. Evqa ji mi ra digotin, mi dgo: Enwer ê rihet bê, wê ê malê. Ê Xwedê Teala
- (255) wilo kir, emrê wî timam bû û sih û sê roja di fakûlta da ma. Ne nan xwar ne av xwar ne ştexilî ne meyizand ne kes dît. Heme hişê wî'l serê wî bû. Go, hemşîra digo: Me digo "Serê xwa hilgêva. Ser çarçefdoşekîyê, xwa dlebitand." Paşî, go: Wela yadê, wê ênina ser yataqê. Pa telefûn jî li va ra nebûn. Tiştik nebû. Çoleka Xwedê bû, me tê da danîbû. Ji Îprexaz kuramekî mi hebû: Hecî Cemîl.
- (260) Ji wê rê zarokê xwa dişîyandin, ew dihat. Kurê wî hat. E jî çûma tenûrê. Hevîrê xwa bir tenûra xwa dara wû'z hatma hêvîr û mi di Hecî Cemîl û bavê wî pev ra ştexilîn. Şitexilîn. Na. Şevkê şev nivê şevê bû carkê, mi di hina'l deryê me da. Em wilo ji xwa ra her yekî bi derkê ketibûn û elektrîka ma şxwa pêketî bû. Soba ma'y daray bû. Me dar ji gund anîbûn, darê go wî kiribûn. Me'l ber xwa tkirin.
- (265) Rabû, mi di mi go: Ti ka raba, ez'b ser devê derî va nabim, bê'v kî ya. Hin î lê dxin, li dêrî dixin. Rabû ga Evdilqadil, ga textor dibêjiyê dibê: Hera xwa bişo, serê xwa bişo, rebeno. Î'l wê salonê gwêhdarê wî bû, vî qasî. (Dikuxe.) Tçê xwa diçê... Me derî vekir. Hata hindurû. Go: Yadê, me anîya ser yataqê. (Dikuxe.) Ez ê, na. Ez hatim, ez ê ser û cilê xwa şom. Ê mê sibeyî çin, em ê
- (270) ênina ser yataqê yadê. Ez ê telefûnê we kim. Em ê'b telefûnê ştexilin. Îdî werna ba Enwer. Wela me, av e kelandî bû, gumgum anî, me cilê wî şîştin. Ê me jê ra bira banyo. Yek keland, wî jî serê xwa şîşt û, û'm cilê wî raxistin'l ber sobê de. Ê axir sibeyî heta îdî bê bûbû çî çax, em razan nerazan em rabûn. Rabû xalê wî çû go: Xalê'm gotiya: Were xeracê, ez ê te şîyênim. Çû. Go çû me go de anî wê
- (275) telefûn kê, em ê çina balê. Go: Me anîya ser yataqê danî yadê. Go mi go: Enwer. Go, go: Şxwa ti nikarê biştexilê. Go textor go digo: Nikarê biştexlê. Bera bi desta îşaretê bidin. Serê xwa jî ber nelebtênê. Serê wî jî, jixwa birîndar a. Bera nelebtênê. Em ê emelyat kin. Go: Her tişt yadê, hazir kirin. Pey da bû, na. Go: Anîna ser yataqê. Go mi go: Ev çixare ya, ew derbik a, ev a halo ya.
- (280) Go: Mi jê ra digot. Go mi: Destê xwa bijdêna. Go: Dijdand. Go mi dgo: Veka. Divekir. Go mi go: Halo, birayê'm ti... Lêbelê hema go tkuxî, belxema wî

- dihat bi mekîne dderanîn. Nikarîbû. Go: Wela hema carekê, xera bû û hema hat rahiştne û dîse birin kirne yoxinbaqimê. Heka naxwa şîr ava goşt, xwarina wî'd xirtûmê de ddanê da. 'B xirtûmê ddanê da. Mi go: Kurê'm, ez hatim. Go wela
- (285) jixwa mi go: Ez ê çim. Go çilo bbê ez ê çim, wî bînim. Mi nedîya. Bi zorê e çûm. Hema îdî go çilo Hecî Cemîl tê. Ji bavê yî ra dibêjê. Mi jî Newîla li balê hişt. Mi go: Keça'm, hera. Go amê te Hecî Cemîl çi got, wera'j mi ra bêja. Bihisê'l wa. Ê hat go: Yadê gotina: Em ê emelîyat kin. Go: Emelîyat kin. Vêce qirûşk perê me jî nema. Go ne'j wa bana û ne wa yardım daba ma... Ê Xwedê
- (290) bidê wa, hê jî Xwedê zahftir bidê wa. Mi rabû, hema nan'b tenûrê ve hişt. E nizam vêga ne'm pê ve da û ne'm dev jê qera. Mala xwedîyê kezebê bê, mi baz da, mi qîsta mala birayê xwa kir, û tineyîyê bê. Go mi baz da, Sedîqo û Henîfa dana pey mi. E çûma nîvê qoperetîfê, mi go: Bavo, ma hema ez ê çim û ew ê'l pey mi ên. Ka da'z biseknim bighine mi, em ê tev de çin weke xelqê û dinyayê.
- (295) Gihana mi go: Ma ecele bû, te wilo te ew hevîrê xwa'l wê rê hişt û ti hatî û...? Mi go: De ka ji kezeba mi bipirsa bê, bê a çilo ya. Em tev da çûn. Go'm çûn, mi go: Birayê'm! Go: Tê çi kê xwa'm, xêr a? Parîkî... Dihatin êvara, çil rojî, sih û sê roja li mala ma, civata wa'l mala ma bû. Hetta hin dirazan, hin li wir dirazan, hin diçûn, hin diman. Birayê mi neçû'j nav meeşçîyê mi nederket, ji
- (300) nav mêvanê mi nederket. Man. Go: Wela... Dilê wa piçkî jev mabû. Şitexalîyê nelhesabêhev gotin. Dilê birayê mi mabû, çûbû. "Birayê'm, de ka bela xwa vekin! Em a'd çi halî de na. Win halê me ewk nakin. Win tçin, miqeresîyê tkîn." Axirê wêna go: Ti hatiya çi? Mi go: Birayê'm, wela gotine: Em ê... Enwer anîna. Wê emelîyat kin û perê me nîn in. Rabû cohtik bazinî keçka mi
- (305) bû, ji destê wê kir û go: Xweha'm, hera, newa. Ma tê ê çi kê? Mi go: Birayê'm, go'z neyê'm ez ê xwa kujim. Sih û sê roja mi nedît. Hema mi rojekê nedît. Go: De naxwa't û Sedîqo herna xeracê. Ê ez ê çim hûr kim û ez ê êm. E nizamim ne bazin bi sed û deha hûr kir ne sed kê'm deh milyona hûr kir. Anîn, anîn em pê çûne Diyarbekir. Heta'm çûna Diyarbekir, bû wextê razana. Dereng a. Bû
- (310) dereng. Me kîr û nekir em nekirna hindurû da. Ê Sedîqo'b mi ra hatiya û Hecî Mihema Salih û ez. Em her sê çûn. Ê go: De naxwa... Hecî go: Ez ê çûm herim. Ez ê perê wî bima jê ra. Nexweşê me yî'l vir a. Ez ê perê wî dimê. Ew

wilo'b pera derbas bû. Ez û Sedîqo mana'l wê rê, li wê salonê man. Em salona xwar man. Birazîya wî jî'd qistexanê de tşixulê, Şefîqa tê de dşixulî. Ew jî hata

(315) 'b me va. Go: Edûla, hema go go mi lezand hema'b qaçaxî ti jî ber mi ra wera. Rabû go wî lezand mi jî ber ra baz da. Em çûna qistexanê û em'b hewa ketna banî.'L wê salonkê ga betanîka Evîlqadil danî ya. Ê'd qurçikka halko de ya, kevanekkê de ya. Em jî'l wê rastê... Go: Xweha'm de vêce... Go... Ne şîv ne xwarîn ne'b vir da ne wê da. "Em ê... Em razin jî, va pêxwasê vir a zahf in, ti

(320) neraza. Gwêhdarê me ba." Ez gwêhdarê wa bûm, e nerazaham. Lê derîyê qistexanê nahta girtin. Hingî gurm û gurm û çûn û hatin çûn û hatin çûn û hatin. Hema'z rabûma'm gotiya: Ma dirûma wî? Gotiya: Eynî nîn a. Go: Dirûm nîn a. Mi go: Xwezî kurê'm Evdîlqadil lawo me biriba ba xwa di rojka li ba ma mabana. Go: Yadê, belkî zû rehmet nekê, wê rezîl bê di nav destê me da. Axirê

(325) wêna e rabûm mi limêja eşayê kîr, ber bi Xwedê çûm û mi xweha wî lê got. Mi go: Rebê alemê, go kurkê mi rabê'z Zibeyda bidma hina feqîr a bêçare, a feqîr. Ez bidma wa, mift û belaş bidma wa. Tewbik çarik bû, mi lê got. Mi go: Hema go qebûl bibê. Ê e'va diayê... Dibê: Serê go hata birînê nayê kirînê. Çênebû, tişik nebû serqa. Bû limêj. Me rabû dey li wa kir. Wa jî rabû, limêjka xwa kir û

(330) û vêce axirê wêna ez hînijîma. Go: Xweha'm, em ê çin. Mi go: Evdîlqadir, raba lawo, a bê şîv in. Şîv nexwarna. Hera piwaçna wa, meyvasûna wa werêne'w bida wa. Bere bixûn. Hecî ya, Sedîq a, tû yî. (Dikuxe.) Axir çû anî. Anî. Hecî go: Go ti nexwê e jî naxum. Mi go: Birayê'm, di qirka mi da naçê xwar. Mi kîr û nekir heqqa piwaça di qirka mi da neçû xwar. Mi nexwar, go: Ti nexwê e jî

(335) naxwim. Mi go: Nikarim bixum, go: Xweha'm de em î çûn herin. Mihemed wê kaxeta ênê wû ê. Em ê çin îşê wî çêkin. Bê ka çilo ya, em ê kaxetê wî û ewkê wî mê ênin. Ew jî hema dirabin narabin Enwer î mirî ya. (Destên xwe li hev dixe.) Wî dibin, diavêjna cihê bûzخانê. E jî hema hînijîma. Êvarî nerazama, hema mitala, û hînijîm. Mi go: Eew, vê ro'l nîroya ha, çi dhînijim li vê'l vê nav

(340) vaqqa mileta da! Ka de'z rabim. Ez rabûma ser xwa. E çûma devê ewkê, qawîşê, mi go: Qurbana te ma! Mi go: Ma dirûma Enwer çawa ya? Go: Xaltîkê ma... Ê ber telefûnê. Ê dîtirkê çû ê go'l wa dmeyizand. Go: Jê ra bêja. Go: Ma çî'y te ya? Mi go: Kurkê min a. Go: Wela, rehmet kiriya. Go: Mirîya. Mi go: Birne ku, ma? Go: Birina cihê cinaza. De vêce ez ê çî kim, ez rebena Xwedê!

- (345) Mi gote vî: Qurbana te ma. Mi gote vî, mi gote vî. Wî go: Nizanim. Wî go: E nizanim. Wî go: E nizam. Wî go: Ma tê çê çî kê? Hina go: Ma tê çî kê? Mi go: Hema e jî ez ê çim cihê devê cinaze bînim. Ma ez ê çî kim? Tişkî go bikim nîn a şxwa. Ha rabû yekî go... Xwedê jê razî bê û hazira jî razî bê. Xwa da ber mi. Go: Wera xaltîkê, ez ê te bim. Ez birma devê cinaza. Î meftekirî, asêkirî. Go:
- (350) Xaltîkê, ha yî di vir da ya. Tê çî kê ma? E rabûm ji wê derkê, çûma oda pîreka go'lmêj tkin û selewatê xwa didin. Ê e çûma wê rê. Mi'lmêja xwa kir û mi selewatê xwa dan lêbelê na, naxle'l derûwê. Em çûna salonê. Em çûna wir ga Evilqadil digirî. Em girîn'ş xwa ra. Mi dî bavê wa hat. Ew jî girî. Go: Çî ya? Go: Çî qewimîya? Ew jî rûnişt û girî. Go: Ev der yasaq a. Li vê rê negirîn. Em
- (355) rabûn çûn. Ew rabûn. Go: Xweha'm. Me go: Nelebta, em ê ên te bin. Heta em îşê wî çêkin em ê ên te bin. Mi go: Herê, birayê'm. Werhasil, em çûma wê odekê, rûniştim. Lêbelê mi gota bavê wî, mi go: Go te Enwer anî ez ê êm Enwer bînim, ez ê lê meyizênim. Hey'b saxitî nedya ez ê bi mirîtayî bêm... Go: Bere bê. Wela'm man. Qederekî'm man. Hezirê nîrokî wa, piştî nîro, go. Mi
- (360) dî'l dêrî dan. Ez derketim, go: Wera, va me anîya. Va me anîya. Çûm. "Pa Enwero!" Ha serkê wî halko (Bi destan nîşan dide.) bûbû. Ê mi go: Jarê, Enwero. Ew piyê haqa. (Bi destên xwe pîvana pêyên gir nîşan dide.) Ê ti't di halê wî da nemabû û hema ha'j vîr û hetta bi vir. Hema sirûm ser sirûmê. Bi sirûma yaşemîş dibû, yiqîn bika. Em î he ro heqa qarton, di qarton, sê qarton...
- (365) Sixurta nebû. Yeşilqert nebûn. Tiştik nebû. Hemi me'b pera dikirîn. Ê me dbirin ddana wa. Îdî xêr û guneh di stûwê wa de bê. Heka dixwar, difrotin, heka çî tkirin û çî netkirin. Me teslîmî wa tkir. Me dda wa. Em î êna mala xwa. Her şev çar zîlamê ma, sê zîlamê ma, heft zîlamê ma'l Diyarbekir bûn. Mi dgo: Xwedê bkê, hema kes qeza nekê ser riwê ma. Tiştik'b xelkê newê vêce.
- (370) Werhasilê wêna, axir Xwedê çêkir. Em mana'l wê rê. Go m mana'l wir çûn, tabuta wî çêkirin û anîn, kar kirin û go: Werin, em ê bin. Nayîfê Reşît û Hecî Cemîl erebe'j Batmanê anîn û û hatin û mi go: Em ê bina malê. Êvara îne ya, em ê bina mal. Go: Xweha'm, tê bê mal çî kê? Hewqa millet î'l ser ceban a.'L ser mezel a. Wê ji vê îne sipêrna vê, ji vê sipêrna vê, ji vê sipêrna vê, hetta roja
- (375) qiyametê haşerê. Tê bê malê çî kê jê! Em ê, me hema bi ya wî kir. Em jî çûna ser mezela. Axir me wî bi ceh kîr û emrê yê hazira î sax bê û ê wî jî. Xwedê

- rehma Xwedê xwa li mirîya hemika bikê, li wî jî bikê efû bikê. Xwedê me bidê xatrê wî jî. Ew jî me'b ceh kir û'm hatna mala xwa. Em hatna mala xwa. Îdî mehekê heta meeşçîyê me çûn û hatin. Xwedê Teala wilo sebrîk da mi, go hew
- (380)** tê gotinê. Îsal, vêga hema ez ê meraqê kim û ez ê girîm û ez ê girîm. Hingî nedigrîm. (Destê xwe li çoka xwe dide.) E rabûm, xelkê digo: Ber kurê xwa nakevê. Heta mêvanê xwa jî me'b rast kirîn. Meeşçîyê me jî çûn û hatin û. Xwedê bidê wa û Xerabenî jî hatin. Mi go: Meyzêna vî miletî serîk nedaya Enwer. Go meeşçîyê wa jî bin, perê mala Etmên negra. Neraja perê wa. Rojekê
- (385)** Tahiro çûy gotiya: Ma ka î çilo ya dirûma wî? Ê hew. Ê go jina Arifo gotiya: Çar hezarê me çûna. (Destê xwe li çoka xwe dide.) E rabûma. Go: Ê meeşçîyê na. Pa tev da anîna alyê mala Feqeh daya. Ma e çi bkim? Mi rahiştîyê da. Me da heqê conegayê Hecî Evdikirîm. Me conegayê wî gurandbû. Me dayê. Mi go: Bida Hecî Evdikirîm. Perekê wî na. Bida wa. Me da wa'w... Heta ma axir
- (390)** mêvanê xwa jî'b hal kirîn û diyam hat. Go: Yadê. Go: Keça'm. Birayê mi hat go: Xwiha'm xasûmê nekin nebê ti, me tiştik jî'j te ra neanî, nebê ti û nebê ew, ew nebê ew. Meyzê qedereka Xwedê ya, hatiya serê we. Go, zîlamê mi go: Ez ê, ez ê çim tê bûrim. Mi go: Meyzêna. Go: Xwarzîyê Hecî Mihemed a. Mi go: Meyzê, Hecî Mihemed kurkî nadê mi. E jî xwarzîya wî ma. Em ê'l gora dirûma
- (395)** wî... Bê çi dirûm çêbû em ê'l gora wê em ê ew kin. Pey mi da Silêmano (Destên xwe lev dixe.) dibê: Wera, Bihemed! Çin, wî axir ewk dîkin. Ê dîse jî me gileh nekir, em ne gilehçî bûn. Mi go: Qedera Xwedê ya, ti sucê wî jî tê da nîn a û Xwedê xera kiriya û emrê wî nebû. Go ne'y kin bana wî hey ewk bê. Emr î kin bû. Me dîse na nîfîrik kir, me ne sixêfik kir, me ne xebîrik got.
- (400)** Xwedê zanê. Mehek qedaya. Çûya, mehek qedaya xesûwa xwa'w daya pêşya xwa û hatiya meeşçîya mi. E jî, mi ev soqaq dimalîştin, devê deryê xwa û ew der dimalîştin. Mi dî Hecî Cemîl hat. Xwedê wî efû bikê, bikê cinetê, mirîyê hazira jî. Go: Xweha'm çi tkê? Ti va ra qewet bê'j te ra. Mi go: Xwedê'j te razî bê, rehma Xwedê... Mi go: Va ra dmalim. Ma ez ê çi kim, melkeskî dma va.
- (405)** Go: Xwea'm! Arifo hatya dikana mi, mi anîya. Ti dey nekê. Mi go: Na, birayê'm. Ez ê çima dey kim! Ez hatima mi'bxêratin daya wa. Mi taştîya wa... Em rûniştina, girîna qederekî. Ê'm rabûna mi taştîya wa çêkiriya me daaya wa.

- Mi go: Meyzêna, birayê mi, gelek emek di ber mi da dîtina. Go win neêna ba me jî herna ba birayê mi. Go: Wawiyîlê, em ê xwa gihêna hav û em ê çin weka
- (410) xelkê û dinyayê, herna balê. Bê ma ka dilê we' b ç î xweş a. Jixwa em narajna ti tiştî. Mi go: Go malê vêqqa dinyayê bidna mi' b neynoka wî avêtî nedda. Vêca piştî go kurê mi çûya ma ez ê vêca rajima tiştê! E ê çî kma' j tiştê! Nehatin, bi darî me jî neketin. Ê çûna mala xwa, rûniştin. Mala xwa rûniştin. Ê go: Gilhê me jî kirina. Ê me gileh nekirbû. Hîç me gileh nekir. Hatna eydê me, em
- (415) nedçûn. Hatna meeşçiyê me, em nedçûn. Ê go "Çime tîn?" bavê wî. Go: Gunhê xwa tkina stûwê me da. Em naçina malê wa, em naçina malê wa. Vêce va îsana... Ew jî her dû mirin. Yekî îstanson rabûn, xwîn di bêvilê ve avêt. Ê dî jî ewkê lê da, qansêrê lê da. Rehma Xwedê' l wa jî bê û miriyê me tev de bê. (Dikuxe.) Meeşçiyê xwa jî me' b hal kirîn. Diya mi halo got, go: Lawo. Go: Vê
- (420) Edûla qenc lawo. Go: Dengkî nego "Birawo" û nego "Weled lawo". Go: Yekî min î sêmihi mir. Mi xwa hetikand. Mi kir go vêqqa dinyayê hisa mi kir. Go: Meyzêna, 'b mêvanê xwa va, 'b çûna xwa va, bi ewka xwa va... Mey Xwedê sebir da mi. Xwedê wilo sebreka wilo da mi go nayê gotinê. Sê rojê wî qedahn, sê çar rojê wî. Mi dî bavê wî hat, go: Adûla. Mi go: Ho! Go: Mi şevê dî, ti dîtî.
- (425) Go: Ber destê ta hemmi Quran bûn. Hetta' l ber devê te wilo a bilind bûn, ser hev bûn. Go: Mi dgo: Em ê çina ser Enwer, Quranê' l ser xwênin. Me pirsî. Mele Hiseyn go, go: A sabîr a û a feqîr a û qerebalix nekîrya û li ber sebra Xwedê xwa sekinîya. Ê Xwedê xelat ev Quran xelat jê ra şîyandya. Ê' l hemdê Xwedê ra şikir. Piştî wêna jî dîse mi dît: Ez î' l Binê Bîka bûm. Ber devera
- (430) Hecî Elî rûniştî bûm. Wêya xwar a ber bestikê... Ê ewkê wî, somyankê wî jî li binê wê wê benka Xalê' m Hecî Şêxo bin avya mala Hecî Sîrac ra. Somyanê wî' l wir bû, Enwer î' l ser bû. Ez î' l vir bûm. Mi dî yeka çarçefkirî di bestikê va derbas bû go bê. Mi dgo: Newa, newa, newa, newa. Mi wilo dgot. E nizam ne tîrseham ne sehwe dgirtim ne mi nedxwest go werê. Mi dî hat, ber mi sekinî.
- (435) Xwedawo! Wela e' ş te ra dibêjim. Zanê go vêga dinyayê da go serê mi di vir va bibirin yanî xêlfî' j devê min naderkevê, zarok im jî û heta vêga jî. Mi dî devrûka xwa ser rûwê xwa dhilanî. Pa vêca Lûqman, ji hekmê Rebê alemê ra... Sor û spî, sor û spî, sor û spî û denanê wê ji vir zêrkirî, camkirî û noqikka wê halo, zarok bû. (Destên xwe li hev dixê.) Ê mi dî ber mi ra îdî bûrî, çû gweh da

(440) Enwer. Bin serê wî, bin lingê wî ra, dora wî... Mi go: Li mi korê! Bûka mi bû, mi erza wê bir. Mi go: Newa, newa. Li mi korê, bûka mi bû, li mi korê. Ti xew da. Ê vêce'l hemdê Xwedê ra şikir, dana halo Xwedê ddê kê? Vêce oxirsizîk îsal ketiya ber mi. Rebî, bê ecibî! Sebrê çêkê. Îda a ha... Hetta... Em çilo bkin? Ma'm çilo, çilo çêkin?

METN 2 ¹²⁴

- (1) Hebû nebû, sê keçik çûna hejika. Hevalê hev bûn. Bi hev ra çûna hejik dana hev. Hatin milê xwa çêkirin. Hatna ser avekê. Hatna ser avê. Vêce sê zilam jî ser wa ra'd cade ve dçin. Sê zilam diçin. Keçik şî xwa ra dibêjin. Li ba hev dibêjin her sê. Yek dibê: Xwezî'z jina vîyê ha ba, wî axayê ha ba, ez î nexş û
- (5) nemûşa jê ra kim. Ya dîtirê: Xwezî ez jina wîyê ha ba, ez î tevn û teşîyê jê ra çêkim. Yê dîtirê, ya dîtirê gotiya: Xwezî e jina wîyê dî bana, ez î cohtik zarokê guharkzêrînk jê ra ênim. Wextê, wextê vêca her dûka gotiya: Wela ev ev zahf baş in. Lê yê dîtirê gotiya: Na wela, ev a go zarokê guharzêrînk bênê... Zarokê mi nîn in, ez ê wê's xwa ra ênim. Ew'l derba min a. Ew jî rojekê tîn dîse tîn,
- (10) diçina wê riyê da. Dîse tîn, dipirsin. Dibê: Hal û meselê, yeka halo heya. Ma win nas tîkin? Gotiya: Keçka mala filankes e. Ji wa ra gotina. Wî jî çûya wê derê, gotiya: E txwazim qewl û resûlê Xwedê, win wê bidne min. Ez ê's xwa ra xwazim. Rabû ew jî didinê. Bavê wê ew didin. Xwedê qismet kiriya, dana. Go daanê, biriya. Jina wî jî heya. Vêca a bihemle ye. Bihemle bûya. Bihemil bûya.
- (15) Vêca jina wî heya. Vêce yeka pîrik e di gund de ya. Carê dçê ba pîreka. Dçê ba pîreka heta doxim dîkin. Dibê, vêce wê gotiya. Wê pîrikê wextê go, wextê doxima wê hatya, welidandna wê hatiya wextê welidandna wê hatiya, vêce gotiya: Her bakna pîrikê. Çûne bakirî. Dibê, vêce wê jina wî nexwestiya go zarokê wê çêbibin. Ê gotiya: Wê vêce gwêh nadê mi û hij mi nakê. Gotiyê da:
- (20) Divê't çarekê pkê. Gotiye pîrikê. Wî jî, çûye bajêr. Çûye bajêr. Yek daniye, nobeçî daniye ber derî. Daniye ber derî, gotiye: Ti nehêlê kesik herê hindirû. Ji xeynî pîrikê. Wî jî go nobet wilo li ber derî sekinî ya. Gotiya: Ez nahêlim kes

¹²⁴ Ev çîrok jî Hemdîya Kartala ku 63 salî ye wekî deng di sala 2017an da hat tomarkirin. Hemdîya Kartal ev çîrok jî Safya Turğut girtiye.

- herê. Gotiya: Ez pîrik im. Çûya qasekek, di cewrikê sa xistinê û anîna. Gotiya: Ez ê çima balê. Ez pîrik im. Wî jî, destûra yê daya, çûya hindirû. Çûya, ew
- (25) cewrikê sa danîne ber, zarokê yê birina. Piştî zarokê yê birina jinikê gotiya negotiya bi ya wê nekiriya wû biriya. Û vêce biriya avêtya avekê. Av çem a. Di ber mala wa di ber wa ra dçê. Çûya avêtyê. Piştî go avêtyê zilam hatiya, jina wî gotiyê gotiye: Te gotiya te gotiye “Wê jina mi zarokê guharzêrînk ji mi ra ênê.” Wa di cewrikê sa’ş te ra anîya. Gotiya: Ev ne wilo ya. Ev we çare jê kirina.
- (30) Ka hêdî ez ê bêjima ê ber derî. Dibêjiyê, dibê: Ma kesik hata hindirû? Dibê: Wela, mi kir û nekir, bi ya mi nekir. Yeka êxtiyêr hat. Go:’Z pîrik im. Çû hindurû. Ê dibê: Tişteke pê ra hebû? Dibê: Wela weka tişteki bû. Weka pakêtkê bû, ’d destê wê de bû. Şanî mi neda. “Fîraxê min in.” Piştî, piştî wê dirabê dibê: Vêce wela dêmekî we çaren kirina. Dibêjê jinikê: Zû bêja bê we çi kiriya. We
- (35) tiştin kirina. Nabêjê. Jinik nabêjê. Piştî wê zilam disekinê. Pîrek dibê: Heyra, wela ev... Pîrik: Wela ev anîna. E çûma balê, ’m pîrkayya wê kiriya, ev anîna. Ji pîrikê bawer dikê. Piştî’j pîrikê bawer tkê... Ev av diherikê diçê, ji wî gundî diçê gundekî dî. Wilo av diherikê avêtnê. Yek jî gavanê gund a. Diçê ber dewêr, gavantiyê tikê’w î feqîr a wû zariwê wa nîn in. Piştî zariwê wa nîn in. Diçê
- (40) dayîm torê tavêjê avê, masîya digrê. Şi xwa ra tînê. Qefûk mefûka tînê ji boy êgir, wilo. Hema çi jê ra lazim bê, tînê. Rojekê ew jî dibînê wê qasekê dibînê, pakêtkê tînê. Dibêjê: Wela, hermet mi tişteke anî. Dibê: Çi ya? Dibê: Wela e jî nizanim çi ya. Hema mi tora xwa avêtyê’w hatiya, mi gotiya ka bê ev çi na. Ga heywan li wir hiştiya wû hatiya malê. Piştî go hatiya malê, jinik divekê. Va di
- (45) zarok in. Yek keçik a, yek kurik a. Ga va hewqa weka ewkkê dibêjê. Weka ewkekê li ba wa ya. Gotiya: Mihemed Yeman û Pelikman. Dibê: Wela yek keçik a yek kurik a. Dibêjê, jinka wî jî dibêjê: Ji mi nayê wa xwedî kim. Ne çêleka mi heya. Mesela ne şîrê çêleka mi ne sînga mi heye’z sîngê sînga xwa bidma devê wa. Û ez ê çilo kim? Dibê: Hema tê’b pilor mîlorê... Hewdelê wa
- (50) çêka’w bide wa. Wê Xwedê şî te ra çêkê. Dirabê. “Hema meyzê zarokê me nîn in û halo ya.” Ew jî dibê: Bere bê. Xwarinkê didê wa. Û eynî rojê dibê: Raba serê wa bişo. Wextê go serê wa dişoyê avê dirjênê hewşê. Dirjênê hewşê. Dibê, wextê go vêce dîse zilam diçê ber dewarê xwa jinka cîranê wa dibêjê dderkevê dibê, dibê: Maleva, mala gavên, hevşîya wa yî tişî zêr a. Ma çima zêrê xwe

- (55) nadna hev? Ew jî nizanin, nedîtina. Tê, dbakê, dibêjiyê, dibê: Keçê jinxalê, hevşiyê we tişî zêr a. Ma çima win zêrê xwa nadna hev? Çê dmezyênê ga va vêce yek zêr e yek zîv a. Ya kurik dibe zîv ya keçikê dibe zêr. Dirabê wa ddê hev, tê. Û hema serê rojê vêce wa dşoyê jina gavên. Wa dşoyê û zêr û zîvê xwa dhilênê. Zarok mazin dibin. Digihine dehsalî wilo dehsalî wilo dibin. Rojekê
- (60) diçina nav zaroka. Ew û zarok lev dixin. Dibêjina, diya wa dbêjê: Ma win bê ji ku derê qefûk mefûka anîna. Win hatin, serê zarokê ma bûna bela. Ew jî dibêjê: Na, diya ma wû bavê ma ev a. Bavê me gavan a, diya me jî heya. Dibê: Na. Dibê: Gavên win ji ber avê anîne. Bê kê win avêtna avê, tora xwa anîya. Avêtye, win anîna. Rabê dibêjê. Kurik keçik dibêjê kurik. Dibê: Ka bisekna
- (65) birayê mi. Em ê îro bêjine diya xwa. Em ê tişteki bêjinê. Go: Em ê çi bêjinê? Dibê: Zanê... Keçik wilo aqillî ne, şareza ne. Dibê: Em ê bêjinê da “Tê vêga nanê sêlê ji me ra çêkê.” Wextê go bê... Em ê... Bê: Ez çênakim. Em ê bê “Tê çêkê.” Em ê... Wê sêlê deynê ser êgir û agir dê bin. Wextê go danî bin, ti raja vî milî, e rajma vî milî. Em ê ser êgir re girin. Em ê bê: Ti dbêjê, tê bêjê, ti
- (70) nabêjê em ê te şewitênin. Ew jî dirabê kurik dibê: Bere bê. Rojekê diya wa hevîr kiriya. Jina gavên hevîr kiriya û çûya tenûr daraya go herê hevîrê xwa bbê. Tê digrîn. Dibê: Na dilê ma dçê. Yadê nanê sêlê ji me’r çêka. Dibê: Lawo, ez ê çêkim vêga tenûra’m bhûrîya. “Bûrî nebûrî tê nanê sêlê vêga’j me ra çêkê” Ew jî dibê: De ka’z herim nan lê xim, ez ê êm. Dibê: Na. Dibê: Na, tê vêga
- (75) çêkê. Ew dirajê vî milî, ew dirajê wî milî, dibin. Dibê: Em ê te vêga ser sêlê deynin. Ew jî wextê dibê “Em ê te ser sêlê deynin.” ew jî dtirsê. Tirsê dibê: Ez ê çêkim ka bela xwa’j mi vekin, dibê: Na. Dibê: A tê navê diya ma û bavê me’j me ra bêjê... Dibê: Win zarwê me na. Dibê: Na, em ne zarwê we na. Me wû zarwê yekê lev daya. Wê gotiya,’j me ra gotiye: Win ne zarwê wa na. Win ji
- (80) ber çem anîna. Çinkû win’ d pakêtekê de na. Ew gavan û jina xwa win ji ber çem anîna. Qefû ewkê avêtya qefûwa, ewka xwa avêtna qefûka, win anîna. Ew jî dibêjê: Na lawo, heneka tkin. Dibê: Na, tê rast bêjê. Ê dibê: Wela rast a lawo, wilo ya. Dibê: Naxwa îro çû, bere bavê me jî werê. Teb we’b me ra diya. Rabû tê dibêjê wî jî, dibê: Hal û meselê we ev a. Dibê: Erê lawo, wela halo ya. Wilo
- (85) ya. Em çûbûma ber garanê û e dayîm wilo mi ewka tora xwa tavêta masîya wû tiştê û qefûwa û tiştê. Û wela mi avêtyê, ewk ketyê da. Pakêtek ketyê û mi anî

ga va win in. Me win şuştina. Serê we şuştiya me rijandiye hevşî ga va hemû yek bûye zêr yek bûye zîv. Vêce ya Mihemed Yeman zîv e ya te jî zêr a. Û me jî gotiye: Zarokê me nîn in em ê wa xwedî kin şî xwa ra û me win xwedî kirna.

(90) Dîbê: Yabo, qewlê ma a'y îro ya û'b xatrê ta û heqê xwa helal kin li ma. Û em ê çin hetta em bigihine cih û warê bavê xwa. Em ê çin, em ê... Hingî wilo bû'b piya dçûn. Diçin diçine ewkê. Wextê go derdkevin diçin bi piya bi rê ve dçin. Bi piya bi rê ve dçin, diçin heta medekê diçin, leqayî gundekî dibin. Diçina gundekî. Wî gundî jî ava wa nayê. Kanîyeka wa heya ziha di serê wê de ya.

(95) Wextê... Dîbê: Ew gund serê malê her sibeh qîzekê, keçîkekê dibin. Û dibine wir û wextê go xwa zer dikê diqurpênê wê keçîkê, peşîk av'd be ra tê. Ê go's xwa ra anî materek di matere ê dî wê wilo dimênê. Wilo ava wa'd wê sorinê de ya, di wî wextî de ya. Û piştî wê vêca diçin dighine wî gundî, dighine wî gundî. Dimeyzênê go wilo avek li wir a û wilo ya û hemmû wilo tîkin. Dirabê diçê.

(100) Dîbê keçîk tê, keçîk tê. Dîbê: Ma xêr e? Dîbê: Îro... Dîbê: Wela xêr a. Dîbê: Dora min a. Ê dîbê: Çima dora te ya? Ji boy çî? Dîbê: Wela'z keça axayê vî gundî ma. Ya maznê wî gundî ya axayê vî gundî... Dîbêjê: Sira dora mi hatiya. Ya her kesî kirine. Ev îro dora min e,'z mecbûr im werim. Dîbê: Ji boy çî ya? Dîbê: Wela zihak di serê kanya me de ya. Em bê av in. He ro keçîkek wê xwa

(105) edilênê wû ê, wê xwa zer kiyê û wê qurpênê. Û ew ava'd be ra hat îca wê xelk ê'j xwa ra ênê. Ê go gihayê gihayê. Ê negihayê, tina. "Ê tamam." Dîbê: Ez ê wî marî kujim. Wera. Wera ti wera wû e jî ez ê êm. Wextê go tilya xwa halo bika. (Tilya xwe dirêj dike.) Go wextê xwa zer kê tilya ta şxwa ê te qurpênê. E jî ez ê ewkê... Şûr şûr î pê re ya. "Ez ê vî şûrî xima devê wî û ez ê wî kujim." Dîbê:

(110) Na, xwa nexe bela mi halo. Dîbê: Na. Ti were wû hew. Ew, keçîk û xweha xwa dçin. Wê keçîkê jî dibin. Xweha wê'l wê derkê dirûnê w ew jî dçê ber kanîyê. Keçîk ddê avê. Dçê ba wir. Ziha têyyê. Wextê go tê, şûr jî pê re ya. Ew jî pê re dçê. Didê avê û dçê wir. Wextê go şûr ser devê wî re digrê, go devê xwa zer dikiyê ew hema dixê devê wî û diqelêşê. Werhasil devê yî dqelêşê. Ziha

(115) dimrê. Keçîk tê malê. Keçîk tê malê. Ew dîbê: Keça axê ma'w halo û halo. Destê xwa jî wextê go ziha dimrê destê xwa'l xwînê dxê dîbê: Ti xwiha... Dîbê: Vêga vê kêlîyê ti weka xwiha min î. Li nav pişta yê dxê. Li tazîyê wê dxê ne'l

- ser cila dxê. Jixwa wilo'l nav pišta yê dxê. Dibê: Ji boy go xel ew ê bê "Mi kuştiya." Ew ê bê "Mi kuştiya." Daqena... Ê yekî jî li milê xwa dxê. Tê bêjê
- (120) bê: Hal û mesela ev a. Yekî halo, halo kuştiye ziha. Dibê: Temam. "Hema ez nayêma ba mala bavê ta îşev." Dibê: Temam. Dibê: Bera. Ew diçê, keçik tçê malê. Ew jî dibê: Ka em ê'l malekê gerihin, maleka go wilo feqîr bê û me bihewênê. Wextê go diçin yeka yextîyar dibînin. Bi tenê ya. Xanîkekî piçûk a. Diçine ber, li derîkê yê dxin. Pîrê dirabê dibê: Ma lawo, win kî na? Win şî kû
- (125) na? Win şî kû tîna? Dibê: Ma yadê pîrê, 't mêvana dhewênê? Dibê: Lawo, mêvan mêvanê Xwedê ne. Ser çavê ma wû ser serê mi. Bere werin. Dibê: Em îşev mêvanê te na. Dibê: Lêbelê em a yadê em zahf tî bûna. Dibê: Law ûûû lawo, ne ava mi nîn a. Her kes keça xwa dbê dixemilênê û ziha dqurpênê heta avê tîna. Avka mi nîn a. Werhasil... Ê dibê: Ne mi ziha kuşt. Dibê: Bi ra? Dibê: A.
- (130) Dibê: Wela sira dora keça axê bû, a hatibû. Ê e çûm. Mi ew mi ziha kuşt û av a zahf a. Bere xweha'm harê materek avî te bîna. Dibê: De wûûû, qencîka halo win bikin... "Îşev em mêvanê te na û sibey em ser oxira xwa na." Dibê: De bere bê lawo. Win jî weka zarokê min in. Dibê: Ez tenê ma. Kesî'm nîn a. Ez tenê ma. Ew, keçik diçê materek av tîna. Ê ew jî xwarinka wa, bê Xwedê çî qismet
- (135) kiriye, tixwun. Sibey dirabê diçê mala axê. Kurik dibê: Mê çin ka çî'j vê meselê çêbû. Diçina mala axê. Piştî go diçina mala axê, vêca li gwind her kes dibê: Me kuştiya. Ew dibê: Mi kuştiya. Ew dibê: Mi kuştiya. Ew dbê: Mi kuştiya. Diçina mala axê. Keçik dibê: Ne yek ji we ya. Ez nas tikim wîyê go kuştiya. Ez wî nas tikim. Dibê: Ma î'l kû ya? Dibê: Î'l kû bê wê belî bê. Dibê:
- (140) Destê xwa'l nav pišta mi daya'l xwîna daya wû lê daya û li ya xwa jî daya. Li milê xwa daya ya xwa'l mil daya ya mi'l nav pišta mi daya. Dibê: Ew însan wê belî bê. Bavê wî jî dibê: Rast a. Dirabê ew û xweha xwa dçine wê derê. Çina wê dê. Dibê: Ma ma win mêvana dhewênin? Axa jî dibê: Em... Mêvan mêvanê Xwedê ne. Ser çavê me wû serê ma. Dirabê wa dhewênê. Keçik çav lê dkê.
- (145) Zanê go ew a. Wî dbîna, nas tikê. Diçê bavê xwa ra dibêjê. Dibê: Yabo ha vî bû, ha vî ziha kuştiya. Dibê: Lawo ti'j ku zanê.'V mêvan in, rêwingî na. Dibê: Yabo kî ya, vî kuştiya. Ez wî nas tikim. Ka milê wî hilda. Dimeyzênê ga va lepê wî lê ya. Dibê, dibêjiyê, dibê: Keça mi helala te ya. Ez ê dima ta. Keça xwa zê dima ta. Piştî go ziha wî xwê wa te ziha kuştiya. Ê ez ê vêca dima ta.

- (150) Kurik jî dibê: Bera. Kurik jî dibê: Bera. Keça xwa ddiye da û dibê: Bi xwa ra biba. Eyn wilo. Bi xwa ra tênê û tê. Rojekê vêca wextê go tênê dibêjê: Wela em ê çin welatê xwa. Tê welatê xwa, tê welatê xwa, keçikê'b xwa ra tênê. Ew, xweha xwa'w ew tên. Dibê: Ez... Dipirsê dibê: Ma welatê ma ku der a? Wilo wilo li gunda dpirsê dpirsê. Dibê: Win ji filan derê na. Ew jî tê qambilî gwind
- (155) xanîkî çêdkê. Xanîkî çêdkê. Vêca nêçîrvan a kurik. Nêçîrvan e'w bavê wî jî nêçîrvan a. Diçina çiyê kewa wa dikuji wilo kêroşka, tiştê. Nêçîrvan in. Diçê rojekê li çiyê leqay hev tên. Wextê tçine çiyê her dû hev dibînin. Dibînin, dibêjê: Welleh xwîna mi ser te ttevizê. Ma ti'ş kû yî? Halo, filan. Dibê: Mi'l vir bbîna. Kurik wilo dibêjiyê. Dibê: Mi'l vir bbîna. Ew'j dibê: Wela ez maznê vî
- (160) gundî ma wû halo ya. Werhasil hev nas tîkin. Kurik wî nas tikê ema zîlam wî nas nakê. Wextê go tên wilo pirsîya'l devera pirsîya. Wilo jê ra şitexalî hatina gotin. Kurik jî wî zemanî piçûk a. Dirabê, diçê li mal dibêjê. Dibêjê jinikê, jîna xwa. Dibê: Min îro yek il çiyê dî. Xwîna mi zahf ser tevizî. Weka go kurê min a. We çaren di pîreka mi kirîna. Dibêjê ew jî. Pîrek tçê dibêjê wê vêce
- (165) pîrikê. Pîrik jî pîra sehr a. Dibê: Divê ti çarekê bkê. Wellehî e jî çûm û ti jî çûyî. 'P Xwedê çûya'l çiyê dîtiya. Pîra sehr tê wê dê. Kurik dîse çûya nêçîrê. Xweha wî'l mal a wû jîna wî. Tê malê. Tê dibêjiyê dibê: Wextê go... Ka semyanê wa? Dibê: Semyanê me çûye nêçîrê. Dibêjê: Ma... Wextê go hat, bê: Xorto xweş xorto, qîzê xweş qîzê û bûkê xweş bûkê lê kevoka mîrê cîna'j we
- (170) kêma a. Ew jî dibê. Werhasil birakê wê tê. Jê ra dibêjê. Dibê: Yeka yêxtiyar hatibû, halo got. Halo gotya me, birayê'm. Ew dibêjê. Dibê: Dev jê berdin. Dibê: Dev jê berda. Belkî pîlanek e çêtkê. Sibey dîse tê. Sê roja tê. Sibey tê dîse kurik ne'l mal a. Roja dî tê, kurik î'l mal a. Tê, çavê wê lê ya go serê wî bixê teşqela da. Dibêjê: Xorto xweş xorto, qîzê xweş qîzê û bûkê xweş bûkê
- (175) lê kevoka mîrê cîna'j we kêma a. Şi te kêma a. Dibêjê: Ez ê çilo kim? Dibê: Tê çê wê'j xwa ra ênê. Ew jî tkevê rê. Dikevê rê. Go yek ji boy Xwedê ya Xwedê jî ji boy yekî ya. Dikevê rê, diçê, leqay Xocê Xizir dibê. Leqay Xocê Xizir dibê, dipirsê, dibê: Ya sofîyê delal! E tiştêkî bêjma ta, tê çî'j mi ra bêjê? Dibê: Hema çawa ya, çilo ti bixwazê û çilo bê ez ê wê bêjim. Dibê: Wela hal û meselê mi
- (180) ev a. Ez hatîma serê çiyakî qarşê gundê bavê xwa. Mi xanî çêkiriya. Ê pîreka yixtiyar a, tê dibêjê: Xorto xweş xorto, qîzê xweş qîzê û bûkê xweş bûkê lê

kevoka mîrê cina ne tê de ya. Xanîyê te hewqa xweş a. Mi jî gotiya: Piştî go sê roja hatiya mala mi wilo'j mi ra gotiya. Hema mi di roja nedîtiya, roja ssiya hatiya'j mi ra jî gotiya. Mi gotiya: Ez ê çim. Ka ez ê çawa... Ez ê çilo çim?

(185) Dîbê: Zanê xortê delal, tê çilo çê? Dîbê: Ê. Dîbê: Tê çê, tê çê ber çemekî. Tê çê ber çemekî û kevokê ên, kevina avê. Hemmû wê xwa'l avê xin û firin. Bê: Kevoka mîrê cina wê paşî bi tenê ê. 'P kesî ra nakeviyê. Heta av jî temîz nebê, gerebol a nakeviyê. Wê dûv ra ê. Wê davikê xwa deynê. Wê davikê xwa deynê wir. Û ti jî hera, tabîka xwa bikola. Erdê bikola û bikeviyê. Hama çavê te xuya

(190) bkin. Lêbelê go berî hingî te bibînê wê te kujê. Kevoka mîrê cina. Lêbelê tabyê bikola, bikeviyê û çavê te xuya bkê. Lê wextê keta avê gereka ti nizêk bê, davikê wî ba xwa da bînê, ti hilênê. Wê bêjê, wê bê: Bi soza mîrê berê, bê ti ins î ti cins î, davikê mi bîna, e's te ra. Wê sê cara, heta cara çara hê nû davikê wê jê ra bêja. Go sê carê xwa got, heq li sê car in ya sê cara got, cara çara got

(195) davikê wê bîdyê. Şxwa dîbê ya ta. Dîbê, ew jî diçê û tabyê çêdkê û dikeviyê. Û kevok hemû tîn. Tenê çavê wî xuya dkê û hew. Ha wilo cihê çavê xwa qûl hiştiya. Wilo erd kolaya, qûl hiştia û dibêjê... Ew dikevinê wû diçin. Ew tenê tê xwa'l avê, ka av zelal dîbê û dikeviyê û dibakê dîbê: Ew davikê wê dîbê, dihilênê û dibakê. Dîbê: Ti ins î, 't cins î. Ez kevoka mîrê cina ma. Davikê mi

(200) bîna, e's te ra. Sê cara dibêjê, wilo dibêjiyê, dîbê: T ins î, 't cins î. Kevoka mîrê cina ma. Davikê mi bîna, e's te ra. Cara ssiya jî dibêjê, dîbê: Ti ins î, cins î. Bi soza mîrê berê, davikê mi werê. Ez kevoka mîrê cina ma, e's te ra. Cara çara sozê jê distênê. Piştî go wê jî dibêjê hêdîka dîbê: Davikê te va na. Dirabê, tê. Dîbê: Ti çî'j mi dxwazê, bêja. E te bibme ser heft tebeqê azmên a te bibme ser

(205) heft bixme bin heft tebeqê erdê. Dîbê: Ez derekê'j te naxwazim. Ez ba mala bavê, ez mala te dxwazim. Tê'm bê mal. Ê şixwa tê mi bê û ez ê êma ba diya ta'w bavê ta. Ê dîbê: Temam. Dîbê: Na, sê birayê mi hena. Zahf weka zalim in. Wê te kujin. Wê behna te kin. Dîbêjin: Behna Hiseynîya tê. Wê te kujin. Qetla te ê kevê stûwê mi. Dîbêjê: Na, ema mi bikujin nekujin tê mi bê. Ez ê êma ba

(210) mala we. Dîbê: Temam. Dîbê: Ez ê te bime ba diya te wa û îdî em ê bi hev ra îdî êne mal, em ê ên. Dîbê: Temam. Diçê wê ser perê, wî dbê. Dîbê heft tebeqê binê erdê. Piştî go dîbê wê derê vêca diya wê dîbê: Çima te wî anîya lawo?

- Birayê te'y wê kujin. Bêhna Hiseynîya tê, halo ya. Dibê: Yadê, mi soz pê ra daya. Birayê mi nikarin bikujin. Bavê mi, birayê mi yek û dido bikin, ez ê
- (215) avêjma ser perê xwa, çima... Ez ê çim heft tebeqê azmên. Ez ê çim dinya gewrik. Ez mi soz pê ra daya. Ez bûma ya wî. Dibê: Bi ra, lawo? Dibê: A. Dibê: De ka bere bê. Berî go birayê te werin, va baş a te'j mi ra got. Go birayê te hatin em ê berê wa dina odeke dî. Wextê go... Wera ba wa, sozê'j birayê xwa wa bistê. Ê ji wa ra bêje bê bê te çî soz daya tê wê soza xwa bêjê. Dibê:
- (220) Temam. Piştî birayê wê tîn, dibêjina diya xwa, dibê: Yadê, bêhna Hiseynîya tê. Dibakê, dibê: Ka wera. Ew jî tê. Dibê: Birayê min, hevalê min a. Mi soz pê ra daya û mi wî anîya. Win me qebûl dikin jxwa'm hatina, win me qebûl nakin jî em ê çin. Dibê: Piştî go te ecibandye, me qebûl kiriya. Lêbelê oxira we xêr bê. Ew jî dirabê, wî'l ser perê xwa dkê û tînê, tînê wê derê. Kevoka mîrê cina tê
- (225) wir. Dibê kebanîya wî û jinka wî jî heye'w xwiha wî jî heye û xanyê wî jî heya. Dibêjê dîse dçê zîlam tçê nêçîrê, bavê wî. Dîse'l çiyê wî dbînê. Dîse'l çiyê wî dbînê. Dîse tê'j jinê ra dibêjê. Jin jî pîra sêhr ra dibêjê. Illeh berê wî ddê kuştinê. Xwedê îşê wî bi rast tînê û bela nabînê. Dirabê dîse dçê dbêjê jina xwa ra. Jinik jî ya sêhr ra dbêjê, tê dibêjê: Ez ê em ê wî ezimênin. Kevoka mîrê cina
- (230) dibêjê kurê wî dibê: Bavê te'l vî gundî ya, axayê wir a. Ê meyzêne diya ta vêga xistiya eyarekî berêz, danîye sêrê, serê sê riya. Ji wir ve tê,'j wir ve tê,'j wir ve tê. Ê gotiya: Heççî go di be ra herê, darekî lê xê wû tîfekê bidê. Ev wilo gotiye bavê ta. Ê mazzê wir a û em ê wî ezimênin. Dibê: Temam. Ê vêce xwarinê çêdkê. Çil xulamê wî heya ê bavê wî. Dibêjê: Em ê xulamê yî hemika jî
- (235) ezimênin. Bi wa ve, bi hespê wa ve, bere hespê xwa jî wê ênin û ên. Dibê: Bere bê. Drabê, xwarinê çêdkê, hemmû tiştî çêdkê'j wa ra û hespê xwa jî tînin û tîn. Diçin hespê, jinik ba ne ya kevoka mîrê cina ya. Diçê xwarinê ddeynê ber hemmûwa, hestîya deynê ber. Xwarina kizirî ya binê beroşê û hestîya jî deynê ser, deynê ber, ber bavê yî. Diçê hespê wî jî ê hemmûka ka wû cê dxîyê û ê wê
- (240) tişî kevir tikê. Ne cin a, pê zanîya. Dirabê, dibêjê: Ez filan axa ma û ez hatima vir. We mi ezimandiya, we hestî danîne ber min û xwarina. Dibê: Ev, layiqê te ya. Dibê: Ev, layiqê te ya. Dibê: Ez, bûka te ma. Dibê: Ev, bûka te ya. Dibê: Ev, kurê te ya. Ev, keça te ya. Dibê: Ka diya wa? Dibê: Te diya wa çima xistiya eyarê berêz? Te danîya sêrêjê. Cihê sê riya, serê sê riya. Dibêjê: Ev, jî heqê te

- (245) ya. Wextê wilo dibêjê, wilo ji erda Xwedê dkevê. Dibê: Vêce dêmekî ev kurê min a. Diçê darî hespê xwa jî, ga va kevir tê de na. Dibêjê: We ka wû ce xistiya alifê hemi, ciherê hemi kesî. Ê mi kevir a. Dibê: Ew jî li gora te ya. Ma te dîtiya, însana cewrikê sa anîna? Heka te dîtiya cewrikê sa anîna, me jî ev kevir nedixiste ciherê. Dibê: Ma we dîtiye go hespa kevir xwariya? Dibê: Ma te
- (250) dîtiye go însana cewrikê sa anîya? Wextê go cewrikê sa anîba wê ev jî kevira xwê. Dibêjê: Te pîreka xwa biriya serê sê riya û te gotiya her yekî ê go'd be ra çû wê tîfekê diyê wû darekî lê xê û dibêjê: Pîra sêhr halo'l te kirya. Cewrikê sa anîye balê. Ê meyzê kurê te ye, 'v keça te ye wû'z bûka te ma û ev jî bûka te ya. Ez kevoka mîrê cina ma. Her tiştî zanim. Wilo. Wilo dibêjê. Hêdîka vêce tê
- (255) malê. Dibê: Ez ê te ezimênim. Dibê: Ez ê te ezimênim, wera. Dibêjê kurê xwa. Dibêjê: Pisîka me'b xwa ra biba. Zanê fêmkî, ne kevoka mîrê cina ya. Dibê: Heyra, pisîkê'b xwa ra biba. Pêşî çênîyê goşt deyne ber pisîkê, wextê go îlac û tiş tê hebê wê pisîka te'd ceh da beecê. Wextê tê de nebê şxwa tê xwê. Drabê pisîkê'b xwa ra dibê. Dibê: Me nedî go axa hatna şîva û pisîk anî. Dibê: Me
- (260) nedî go misilmana însana cewrikê sa anî. Kur jî wilo dbêjiyê. Dirabê, wextê go xwarinê tîne ber dibê: Pisîka, hij pisîka xwa dîm. Çênî pêşî ddeynê ber. Dixwê, dibê: Pilt û dpeqê pisîk. Nabê îlaç kirya daqena ew jî bîmrê, kur bîmrê. Hêdîka pisîk dipeqê, ew xwarinê naxwê û îdî tê malê. Ew vîca ew zîlam tê balê. Bavê wî bavê wî tê balê. Dibêjê: Ti bûka min î'w kurê min a û keça min
- (265) a. 'W pîra sêhr heqsizî'l mi kirya wû'l jîna mi kirya. Ê mi'j bo xatrê wilo mi wê anîbû û jîna min. Dibê: Hê, gelî gundîya! Her yekî teneka qazyaxê û barê çilo bînin. Ê îca wa her diwa dşewitênê û pîreka xwa tîne û wê dişon û dixina. Cila lê dîkin û diedilênin. Ê ha ev a. Çîroka mi xilas, serê te sax.

- (1) Ya Ellah ya Xwedê. Birakê'm ez ê çîrokekê ji we re bêjim, çîroka Stîya Erebi. Go hebû nebû, go yek bû. Go hema dayîm digota kurkê xwa, digota kurê xwa digo: Tî bênamûs î. Tî'j min î bêwêrt î. Go: Tî'j min î bêwêrt î. Go rabû kurkê wî çû'b çolekê ket. Go, ez ê bêjim, weka çû Mêrga Rezê Kurê. Xwa kira binê
- (5) pezekî da. Tûrikê xwa kişanda qahfê xwa û'd binê wir da xwa ew kir. Go meyizand siwarek î'j wir ve tê. Ji wir ve tê dibê: Heydê em şer kin. Go dibê: Heyrîk, şixwa'l vê dirkê ma, ti zerara mi nedaya ta. Ti dewa çi dkê? Go dbê: Îlleh em ê şer kin. Dirabê, dirabê dibê: Meyzêna bi wî şertî: Kî karibê kê wê serê wî jê kê. Dibê: Temam. Serê wî jê dibê. Dibê: Em ê serê hevdu jê kin. Sê
- (10) şeva û sê roja lev dixin. Yek yekî nadê erdê. Dibê: Heydê em ê'b efra çina hev. Em ê'b efra çina hev. Bê kî keta ser dilê kê em ê serê wî jê kin. Navê wî Mîrza Mihemed e, Mîrza Mihemed a. Dikevê ser dilê Stîya Erebi. Stîya Erebi zîncîra pêşîra xwa dvekê, sînga xwa dvekê. Dimeyzênê, ga pêrek. Dibê: Wey wey! Wela bavê mi dgo: Tî bêwêrt î'j mi, ji te'y bêwêrt îm. Dêmekî, mi xwa niheq
- (15) fikir, mi dgo çima bavê mi wilo dibêjê. Dêmekî rast a, ev şitexalya bavê mi rast a. Dirabê Stîya Erebi dibê: Wela mi'd heyatê şixwa kesî'z nedama erdê. Mi gotiya'“L mi heram go'z kesî nekim ji xeynî yê go'm bidê erdê.” Dibê: Heydê em bûne şixwa ewkê hev. Dirabin qesrekê çêdikin û xweş dikin. Dikevinê da, diedilênin, her tiştî çêdikin. Dimeyzênin pêrek tê, dibê: Wela ez ji hecê, mîletê
- (20) me çûye hecê xwedêgiravî. Em ji wa gêç mama, nîzam çîlo bûma. Ma ka win mêvana nahewênin? Stîya Erebi dibê: Pûşt keça pûşt, heydê siktir ba hera! Çi pêşê te'l vir heya! Mîrza Mihemed dibê: Heywan, gunêha ya. Stîyê, bere werê. Hema gezik nanî ma'j ber çênabê. Hema ew jî weka diya ma bera'l vê dirkê rûnê. Heka heftîkê heka deh roja çiqasî li nav mala wa da dimênê. Dibê: Stîyê!

¹²⁵ Ev çîrok ji Eytan Turğuta ku 56 salî ye wekî deng di sala 2013an da hat tomarkirin. Eytan Turğut ev çîrok ji bavê xwe Mehmet Turğut girtiye. Ev çîrok û yên ku piştî vê tên (Metn 3, Metn 4, Metn 5, Metn 6 û Metn 7) ji xebatekê hatine girtin. Bnr. Lokman Kartal, “**Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tûr Abdîn/Torê De (Kercos/Gundê Xerabêbena)**”, Projeya Lîsansa Bêtez Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2013, r. 9-20.

- (25) Dibê: Hê. “Lawo!” Dibê: Stîyê! Dibê: Hê! Dibê: Wela şûşekik, nizam werhasil tişteki baş. Ha’j te vî tiştî, vê şûşa ewkê, bida Mîrza Mihemed. Mi’j bîra kiriya. Jê ra zahf baş a. Ew jî ddê Mîrza Mihemed. Mîrza Mihemed ji dilê xwa ve dçê. Ji dilê xwa ve diçê. Dirabê, dirabê, dirajê pora Stîya Ereba û li ser dolapka xwa sêr ewk dikê û dibê bajarê Şahê Acem. Dibê wê dê. Ew birakê wî jî, birayê
- (30) Mîrza Mihemed dibê: Waweylê bavê me çû, birakê ma jixwa çû. Bavê me wilo gota birayê ma. Ka’m pey da herin. Ne rojek ne ddo, ma hema em li birayê xwa nepirsin? Têna bîna qesrê. Dibê: Ka em ê çin ji vê qesra ha pirsin ma ka kî ya tê de heya, çilo ya, çawa ya, bê ma rêwingî bi vir va neçûna. Diçê hindurû, dimeyizênin, diçin kes nîn a. Dimeyizênin ga yekî li wê dê dirêjkirî ya û tişteki
- (35) nîn a. Di heb mişk li wir hena. Tak genim î di wir da di nivê her dik, her dika da çinî ya. (Destê xwe li çoka xwe dixê.) Wilo çandî, çêbûya. (Destê xwe li çoka xwe dixê.) Diçin wî, ew yekî dkujê, diçê libekî ddê ber bêvla wî. Dibê pişk û ewk dikê. Ew birayê wî piçûkê jî nizanê go birayê wî ya. Dibê: Wela hema ez ê libekî dima ber bêvla vî însanî jî. Bê kî bê belkî ew ji dil va çûbê
- (40) rihet bibê. Piçikkê ddina ber bêvla wî. Dibê pişk û ew jî dipişikê. Dêmekî’j dil va çûya. Dirabê, dibê: Stîyê! Dimeyizênin ga birayê wa ya. Poleka dexmeka poleka reş jî, di ber polê vê dira navmilê Mîrza Mihemed a. Bi wê polê birayê xwa nas, şixwa yanî wilo, şixwa birayê xwa nas tîkin. Anî ew zanê go Mîrza Mihemed a û birakê xwa nas tîkin. Dibê: Stîyê? Dibê: Stîyê kî ya, birayê’m?
- (45) Dibê: Birayê’m, mala we hezar carî ava. Win min halo we, şixwa lê, we’z halo ewk kirim. Heydê bi xatirê wa. Wela zê çim. Hespê xwa siwar dibê, dçê. Siwar dibê, diçê. Dibê: Wela go derîyê... Dibê: Hespê min derîyê xwa li derîyê kê dê, ez ê çima wê malê. Diçê bajarê Şahê Ecem. Ew mal, ew bajar tev gawir in. Maleka misilman, pîreke misilman tenê’ d wir da heya. Diçê’l derîyê wêya
- (50) misilman dixê. Diçê’l derîyê pîreka misilman dixê. Dibê: Xatî. Dibê: Hê. Dibê: Mêvana nahewênin? Dibê: Lawo, mêvan mêvanê Xwedê na. Wela ti halê mi dbînê bê çîqa teng a û rê nîn a. Zêrekî didiyê, dibê: Xaltîkê hera filan tiştî bêna, bêvan tiştî bêna, bêvan tiştî bêna. Didiyê jinik, pîr bi eşq diçê. Tçê, tênê xwarina wî ewk dikê. Dibê: Ma ev daweta’l vî gundî çî ya, li vî bajarî çî ya?
- (55) Dibê: Lawo, Stîya Ereba a. Pîreka Mîrza Mihemed a. Jinikka sêr halo, hal û meselê wê ev a. Çûya ji wê drê anîya bi fiêla. Anîya jê ra. Her şev çil şivê

- hinarî'l vê jinikê dişkênê. Dibê: Ma ti nikarê ti'b nûekî tişteki me bigihênê hev. Dibê: Hera, hera sitilek mast bikra û ez ê gustîlka xwa kima nav. Wê gustîlê jî biba, her biba devê derî. Bê: Heme Stîyê ti nexwê jî heme mastê mi tevda. Û
- (60) wê tiştî'j te ra bêjê. Drabê pîr diçê. Dibê: Xweha, lawo çima't wilo tkê? Ka hema ti vî mastî nexwê jî heme't qulka derî va mastê mi tevda. Ti nebê jî tişteki nabê, nexwê jî nexwa. Mastê wê tevdidê, fêr dikê. Dibê: Hera, cilna pîreka lê ka, wî bêna. Îda qedrê jinikê digrin, dibê: Wela ev jinik ê vê jinika ma hir kê. Qedrê wê digrin qîmet dîkin. Heka carekê heka ddiwa, ssiya dçê balê hino hino
- (65) hino hino. Dibê: Here bêja wî xwedîyê vê ewkê, gustîlê ti bigihênê mi. Li... Cila lê tkê, tîkê. Cilê pîreka lê tkê, dibê ewk tkê bin somyanê wê da. Dibê: Mîrza Mihemed, tê di vir de bê. Lê hetta ez nebê "Hewara min û Mîrza Mihemed!" ti nerabê, ti dey nekê. Dirabê êvarî şazdeh şivê hinarî lê dişkênê, pazdeha dişkênê ya şazdeha dibê: Hewara min û Mîrza Mihemed. Dirabê serê
- (70) wî jê tîkin yê mîrikê kurê Şahê Ecem, wê pîrê û, û vê pîrê. Û pîreka xwa tev da li hespê xwa siwar dibê wû tê. Tê welatê xwa, tê qesra xwa. Çîroka mi xilas, serê we sax. Rehme'l dê wû bavê gwêhdarîya.

METN 4¹²⁶

- (1) Ya Ellah ya Xwedê. Gelî civatê, ez ê vêga rabim çîrokkê'j we re bêjim, çîroka Eduwê Kor û Bîskîzarê. Go hebû nebû, go yek bû. Go ez ê bêjim heşt keçîkê wî bûn. Ez ê bêm heşt in, deh in werhasil. Go vêca gotiya: Go ne yekî go heşt keçê wî jî bin e'j va heşt kurkê xwa re bînim, ez kurkê xwa nazewicînim. Go
- (5) rabûya rojekê erbanecî heya berê. Hatina gotiya derwêş. Dibêjiyê da, dibê: Ma ka maleka halo go ewkê wa hebin nîn in? Gotiya: Wela'l filan bajarî, 'l filan deverê, filan gundî ê her kî heşt in. Wî jî eyn weka te gotiya. Rabin diçin, dixwazin. Dixwazin. Qûnaxo qûnaxo tîn, tîn. Bêjim. Ez ê bêjim weka vêga neqeba Dêrdîlê. Ez ê bêjim ji Dêrdîlê heta'b Xerabê Bena. Il nîvê wê riyê
- (10) danîna. Nîvê ba, ba Ziyaretka Bpaçîk, werhasil. Li wê dê ddeynin û dbê şev li wa. Li wê dê ddeynin yek, dimeyizênin serê şeveqê dirabin ga va marekî'l dora çadîra ê piçûkkê danîya, pêçaya. Şeveqê dirabin, dibê: Ya heywanê Xwedê

¹²⁶ Ev çîrok ji Eytan Turğuta ku 56 salî ye wekî deng di sala 2013an da hat tomarkirin. Eytan Turğut ev çîrok ji bavê xwe Mehmet Turğut girtiye.

Teela, ti çi bxwazê em ê dina ta. Heme serê xwa raka. Dibê: Wela ez çi dixwazim? Ez şûrê Eduwê Kor dixwazim. “Ê, team.” Dibê: Em ê dina ta.

- (15) Dirabê, ew diçin bûkê xwa dbina malê. Û pîreka wî dbina malê, mala bavê wî û kurik divegerê. Diçin, diçin, diçin weka, zê bêjim, kurik dibetilê, dibetilê diçin. Diçin binê dareka guhîjê. Dirazê, dikevê, dibetilê, li wê derkê xwa gêr dikê. Dimeyizênê ga va marek li qurmê guhîjê xwa dpêçê. Hêlîna Teyra Sîmir jî’l serê wê ya. Go diçê çêlikê wê go herê bixwê. Rabê dikujê, dikê çar parça. Sê
- (20) parça ddê çêlikê wê û yekî jî’j diya wa ra dihêlê û heta tê. Teyra Sîmir tê, medê xwa tkê, dibê: Wela’v heft sala’z zarokê xwa çêdkim li serê vê darê. Wê gihina devê min û te dî go mar hat, ev îsan bê ka çi ya, dixwê. Dirabê çêlikê wê’j diya xwa’r dibêjin. Dibê: Yadê ne ew bû, va duşmanê, ewkê ma, neyarê ma kuştina. Kuştîya va ya’d vir da, parçê wî jî va ya’l vê dê ya. Dirabê, dibê: Ez ê çi kim
- (25) naxwa ez ê çilo xeleva wî vegeerînim? Hema perekî xwa ji Mîrza Mihemed ra tkê ewk, tikê seh û yekî’j zarokê xwa ra dikê seh hetta’j xew şiyar dibê. Dibê: Ka ti’b çi maqsedê hatiya tê’b çi maqsedê çê, gereka ez vê ewka ta ji bîr nekim. Ew dibê: Wela şûrê Eduwê Kor ji mi xwestina. Dibê: Şûrê Eduwê Kor ji mi xwestina. Dibê: Xwezî heft salî dîtirkê çêlikê min xwaribana û te şûrê Eduwê
- (30) Kor ji mi nexwestibana. Dibê: Wera em ê çin, ez dîse jî em ê çin. Hera heft kun av û heft dûvê berana hazir bika. Kêlîya go, neşxwa, teqlê mi şist bûn ti bidê min, bidê min. Diçin, diçin, diçin, diçin. Dibê: Mey ti vê dara ha... Serê diyarekî disekinin. Dibê: Ma ti vê, vê ziyareta ha dibînê? Wê da reş. Dibê: A. Dibê: Ma ew çi ya? Dibê: Lawo pîreka sêhr e, ’l wir a. Ew pora, ew pora wê ya
- (35) serê wa dara. Bazinekî di bin çengê wê de ya. Tê ji vir va çê, dey nakê. Tê xwa çend kê wî bazinê bin çengê wê û destê xwa jî kê sînga çepê da. Kê sînga wê, îda nikarê tiştêkî bkê. Tê wî bazinê bin çengê yê derxê. Wî bazinê bin çengê wê dçê’b wî miqamî tênê. Ew, Biskiyê ewkê navê wê çi ya, Teyra Sîmir wî bazinê tkê piyê xwa da, tikê piyê xwa da. Diçin, diçin, diçin, diçin. Carekê
- (40) dimeyizênê go ewkê dûvê wî xilas bibê Mîrza Mihemed parçekî’j paqa xwa jê tkê dikê devê wî da. dikevê devê Teyra Sîmir da. Dirabê kêmbê anî ewkê wê nemênê, namênê. Parçekî’j paqa xwa jê dkê, dikê devê wê. Çina serê diyarekî. Dimeyizênin şikeftê a. Dimeyzênin go dinya dihejijê, dihejijê, dihejijê, dihejijê. Te dî go carekê hema kaxetîk bê çi bê te dî go çû hema hemmi keta

- (45) şikeftê da. Wextê go Eduwê Kor bêhna xwa diberdê dinya dihejijê. Û wextê go dikşênê bi nava xwa da ewqa ewk tiçê, dkevê şikefta wî da. Go: Lawo! Wela go wextê go dinya bihejijê berî hingî ti bikevê şikeftê da wela te qizînç kir heka ewk nebû wela't çûyî. De, de, de, de, de, de, de d vir ra di wir ra vir ra di wir ra di wir ra wextê dinya dihejijê hema bi lez diçê. Wextê diçê jî acele dkê. Go şûr
- (50) li ser kaboka Eduwê Kor a şixwa î kor a. Wextê go şûr, (Destê xwe li çoka xwe dixê.) dirajê şûr kalan bi destê Mîrza Mihemed ve tê û şûr li ser kaboka (Destê xwe li çoka xwe dixê.) wî dmênê. Go: Welah, xilasîya te ji lepê mi nîn a. Go ti pora Biskhîzarê ji mi re neênê't şixwa ti çûyî. Dirabê tê. Ê dibê: Em ê çilo kin? Diçîn, diçîn, diçîn, diçîna bajarê bavê Biskhîzarê. Dimeyizênin. "Biskhîzarê,
- (55) dibê, wa ha ya. Di wê ew bînayya ha ya ew, ew aperdumana hanekê, ew xanî, ha ew qesr, qesra wê ya. Tê çê heft micêrî li ber destê ber nobetçiyê Biskhîzarê hena. Heka razay bîn wela tê çê. Û heka nerazay bin wela't çûyî." Diçê bi tafîqê Îlahî ga timam a razay na. Diçê ser, heft desmal jî bi ser rûkê wê de na, çarik. (Destê xwe li çoka xwe dixê.) Dirabê her hefta ser dihlênê, ya heşta dikê
- (60) wû nakê qeremê wî narabê, ruwê Biskhîzarê maç tikê. Go maç tikê ew cihê maçkirina Mîrza Mihemed dibê kewî. Dirabê tê ew jinik ew Biskhîzar jî rabê, dibê: Çilo, win cêrîyê min in. Win a'l ber win a ewkê min in. Win çûya we ev, ev, ev rû, ruwê min halo bûya. Win naxwa win bekçiyê çi na! Dirabê tê. Teyra Sîmir jî bazin kiriya destê, piyê xwa da û dirajê gakî'j yê garana bavê wê û ber'
- (65) b azman dikê. Ew jî hingî şkencê ddê wa cêrîyê xwa cêrîke wê, ew ewkê cêrîyê ber destê wê, ew jî dçê go herê xwa'd balqonê de bavêjê, bavêjê. Dimeyizênê, dibê: Biskhîzar! Dibê: Hê. Dibê: Bajarê bavê te xera bû. Ti çûwa ketiya heyra maçkirina ruwê xwa. Ka hera meyzêna. Tê balqonê, dimeyizênê. Ga ber'b azman dibê, diberdin. Û ha ewqa millet pev ketiya û ha qîr û qiyamet a. Dirabê
- (70) Teyra Sîmir jî'd dora xanîyê Biskhîzarê re tçê wû tê. Çavê Biskhîzarê lê ya go wî bazinê piyê Teyra Sîmir derxê û çavê ewkê Teyra Sîmir jî lê ya go wê brevênê, bibê. Dirabê xwa çend dikê Biskhîzarê û li ser perê xwa dkê wû dibê. Têne, divegerina ber ba Eduwê Kor. Divegerina ba Eduwê Kor. Dibê: Va ya, me Biskhîzarê, pora wê hingî dirêj a. Dikê destê yî da dibê: Ha's te ra! Mi
- (75) Biskhîzarê bineqş's te ra anî. Ew jî'j eşqa dibê pilt û dpeqê. Pora wî jî wextê hima por dikevê destê Eduwê Kor da, ew jî ewkê lê didê kêrê li pora wê dixê,

- jê dkê. Por di destê wî de dimênê. Ew tên, diçin. Tên, divegerin, divegerin. Bavê vî kurkî jî dibêjê, bavê Mîrza Mihemed jî zahf jê ewk dibê. Jê wilo ewk dibê. Sê jinê wî çêdbin. Vêca ew xwiha wîyê mar û jinka go anîbû dawetê
- (80) şixwa daweta wî û Biskhîzar jî ev jî sê. Sê jinê wî çêdbin. Qesrek çêkirin û nizanim bê çilo dkê. Rabû bavê wî go: Lawo, wera şîva ma. Wera'm şîva te çêkin, wera. Jinka yî go: Meyzê, go ti herê pisîka xwa'b xwa ra biba. Pisîka ta tiştik pê nehat, ti jî xwarina bavê xwa bxwa. Ji wa ra ew hefrîtê mîrê cina, anî wilo berê, ilmê sêrê û mêra zanin. Zanin bê kî ewkê wa ya kî ne ewkê wa ya.
- (85) Îda dibê wela pisîk, pisîkê'b xwa ra dbê. Pisîk'd ceh da piçkê dixwê ceh da dbê pilt û dpeqê. Dimirê, ew naxwê. Rojekê tajîya dîtirkê diçê. Dîse dibê tajîya xwa'b xwa ra dbê. Dibê: Tajîya te pê'l ku dê kir ti jî tê pê'l wê kê. Ew jî wilo jî xilas dibê. Roja dîtirê dibê: Lawo, ka bê ti'b çi tê girêdan ji me ra bêja. "Bi çi têma girêdan? Bi bi zîncîra ereba têma girêdan." Zîncîrê lê girê dîin. Dibê req,
- (90) diqetênê. Dibê: Lawo, mêranîya xwa şanî me neda. Bêja bê ti'b çi tê girêdan, asê dbê wê'j me ra bêja. Dikê wû nakê xilasîya xwa'j bavê xwa nakê. Dibê: Herin, sê muwa'j dûvê haspê mi jê kin û'd nav mîza wî da bikelênin û bên li tilîka min a qelîçkê bipêçin. Ez wî çaxî nikarim biqetênim. Wilo dikin û di ceh da tên, wî çavê wî diderxin bi saxîtî û nakujin jî, tavêjna birekê. Ev tajîya wî jî
- (95) ser mixarê hema tkê kewtekewt û'l wê dê sekinya. Dimeyzênê (Destê xwe li çoka xwe dixê.) karwanik tê. Diçê pêşîya karwan û tê ser devê bîrê û hema dikê kewtekewt. Dirabê, diçin, meyzênin, dibê: Wela hewaleka vê heywanê heya. Ka'm herin bê ma'v çilo ya. Diçin, dimeyzênin ga va î'd bîrê de ya. Derxin, dimeyzênin ga bûrayê jin, ê jxwa ê jina wî birayê jina wî ya. Dibê ez ê
- (100) bêjim bira weka Nisêbînê. Birin textorik, deverik, tiştik nema negera rihet, rihet nebû. Rabû go: Ti'b mi ra jî talan bûyî. Xem nîn a. Hema hera'm biba deyna binê kanîkekê û binê dareka bîyê.'J mi ra deyna wir û jê qera. Ti'b mi ra xeremal bûya. Ya mi'b Xwedê ket. Dibê, ddeynê wê dirkê. Di kevok jî dibê: Yadê. Dibê: Hê. Dibê: Çavê vî zilamî a'd berîkê wî de na. Go vêga em herin
- (105) niklê xwa'l ava heyatê xin û bênin ser navika wî deynin û ew jî hema ewkê xwa'j berîkê xwa derxê û bikê çavê xwa da, berîkê wî... çavê wî'd berîkê wî de na, derxê, bikê çavê xwa çavê wî yê rhet bin. Ew jî fêr dikê bi zimanê

heywana. Dirabê ew jî wilo dikê. Dimeyizênê çavê wî vêca wextê berîkê wî çavê wî wilo şaş kirina. Ê vê berîkê kirina, ê vî çavî kirina vê berîkê ê vê berîkê
(110) kirina vî çavî. Her dûk anî wilo ewk kirina. Dirabê çavê wî hewl çêdbin, hewl çêdîbin. Dirabê îda tê mala bavê xwa. Tê mala bavê xwa. Dibê: Ma'v çi şer a? Dibê: Halo bi vê pîrekê, 'b me ra şer dîkin. Dibê: Ka welah... Xwa wilo piçekî ewk dikê vir da ewk dikê. Haspekî dîdîna da. Dibê: Wela ev î qenc a, ev siwarekî baş a. Wê wa ewk kê, wê karibê wa. De de siwarkî, haspekî qenc dîdîna.
(115) Çê alîyê pîrekê xwa û şerê xwa îjxwa dewam dîkin û îşê wa rast dibê. Ê hezar rehme'l bav, li dê'w bavê gwihdara. Ê çîroka mi xilas, serê we sax.

METN 5 ¹²⁷

- (1)** Go hebû nebû. Birakê'm ez ê rabim çîrokekê'j we ra bêjim. Dibê çîroka Keçikê Keçika Jinewkê. Keçika Jinbavê. Weka mesela Keçikê wû Jinbavê ez ê'j we re bêjim. Go hebû nebû. Go rabû keçik keçik û diya, jinbava xwa go çûna paleyîyê. Paleyya xwa kirîn. Tî bû, çû sewîlkê avê'b ser xwa dakir. "Weka..."
- (5)** Go: Yadê, wela weka dasîkî keta qîrka mi da. Nekira tiştê. Çû, çîqa ewk kir jî çû. Rabû ewk kirin. Çend çîqa çû heka di meh heka sê meh heka çîqas wilo ma. Keçik hino hino gir bû. Rabû çavtengayî vê jinbava wê jê kir jê kir û gilê wê'l ber wilo ewkê wê'l ber bavê wê kir. Fesadîya wê'l ber bavê wê kir, keçikê. Go bavê wê jî çûbû coht. Ji coht, coht hatiya û hatiya werhasil çûya îş yanî çûye
- (10)** çiyê. Çûye çiyê, hatiya. Hespê xwa danîya wê derkê. Çûya dara bê ka çûya çi. De hatiya anîya hewşê, ewkê xwa danî. Ê rabû hinik nanê şikeva kira bin parsuwa xwa. Wextê bavê yê hat xwa da ser wî nanê şikeva. Go qerp, qerp, qerp. Qerpênî jê hat. Go: Hermet çi bûya? Go: Wela keçika te'l mi daya. Parsuwê mi şkandîna. Go: Parsuwê mi şkandîna. Rabû jinikê, mêrik gota keçka
- (15)** xwa go: Lawo, raba em ê çîna çiyê da, em ê çîna gerê, em ê çîna gerê. Go rabû. "Bexçika xwa dagira lawo." Go bexçikê, keçikê bexçika xwa dagîrt. Çûna navsera çiyakî. Li wê dirkê danî. Go: Lawo wela mi qotîya xwa'j bîra kiriya, ez ê çim ênim. Go: Yabo ez ê çim qotîya te ênim. Go: Ne keça'm na wela. Go çû keçikê çû qotî anî. Go dayê da. Go: Wî, lawo, ne'm çeçmeqê xwa'j bîr kiriya.

¹²⁷ Ev çîrok ji Eytan Turğuta ku 56 salî ye wekî deng di sala 2013an da hat tomarkirin. Eytan Turğut ev çîrok ji bavê xwe Mehmet Turğut girtiye.

- (20) Go çeçmeq anî dayê da. Go dgo: Wî lawo, mi titna xwa'j bîr kiriya. Keçikê fêm kir, fêm kir go anî naxwazê pê ra herê malê. Go rabû keçik çû serê darekê ji xwa ra rûnişt û girî û çû serê darekê. Go: Rebî yabo, ez ti nifirê'l te nakim lê hema rebî, tiştey bikevê piyê te go ne der bbê'w ne zer bbê. Belak wilo bikevê piyê te de go ne der bbê'w ne zer bbê! Go rabû keçika reş li wê derkê ma. Go li
- (25) wê dê ma. Go vêca bû şav, go kanîkek (Dikuxe.) kanîkke li wir a. (Dikuxe.) Çîman a, wilo xweş a. Geya ya, xweş a. Ê nava wê, keçikê jî gir bûya. Go rabû marê ser devê kanîyê (Dikuxe.) bakirna wî ewkî, bakirna wî marî. Go:'T çi tkê? Di nav ûr û pizûra da çi tkê? Vê, vê çîmana xwaş vê ewka xwaş, (Dikuxe.) wera. Go mi dî erq hata keçikê. Ê mi dî marê reş ji devkê wê verişa verişaha û
- (30) hat. Keçik baş bû, keçik baş bû û çû serê darê. Wî ê gezik nan heka wa dirka heka pelin, çilin, tiştin, geyan meyan xwariba dîsa çê serê darê serê darika xwa. (Dikuxe.) Go keçikê xwa kira... Go meyizand hinek va na tîn. Tajî bi wa ra na û hatina wilo kêroşk û mîroşka'w tiştê wilo. Go keçikê jî xwa kiriya nava bişikî da. Xwa kira nava bişî go daqena mi nebînin. Go hema kûçik diçîna dora wê.
- (35) Dibê: Ewt ewt ewt ewt ewt ewt. Go dibê: Ya rebbî, wela tiştik di vî de heya. E nizanim bê çi ya. Go ew jî dibê Şêxê Şamara ya. Go dibê: Wela meselekik di vir de heya. Dibê: Ma çima ev kûç, ev tajîyê ma dkê ewteewt? Ka'm herin bê ma çilo ya. Go tçê, dmeyizênê tiştik şexsek tê de heya. Fihêt dikê herê. Pîrek a. Zanin pîrek a. Ew jî, cil û milê wê qetana. Tiştik di halê wê da nemaya. Dirabê
- (40) cibhê xwa tavêjyê, dibê: Ber li xwa pkê. (Dikuxe.) Go ewka xwa cibhê xwa tavêjê jê ra. Li xwa tpêçê lê keçik naştexilê. Hîç ne ştexalîya wê nîn a. Dibê malê, li xwa mahr tikê. Ê sê zarokê wê çêdibîn. Hîç ev keçik naştexlê. Dibê: Ya rebî, em çilo bkin çilo nekîn? Dibê: Wela hema em ê îro di sê kurkê me na. Sê kurkê me na, ez ê rabim di sêva bim, ez ê di sêva bim. Go: Ez ê di sêva bim,
- (45) belkî hema... Ez ê xwa lê kima, wilo veşêrim, belkî hema biştexilê. Ez na ka wela nizam hîç neştexilîya. Go rabû go digo: Xwedê ji bavê mi ra nehêlê go'z kirma vî halî û Xwedê'j bavê te ra jî nehêlê go di sêv anîn, nekirna sisê. Ya mala bavê xwa jî got. Go rabû go: Hermetê, wela'm hisa te kêr. Tî ne yî ker î, ti ne'y lal î, wera. Go rabû go ewkê xwa pê ra kar kir. Go: Raba, serîkî hera mala
- (50) bavê xwa. Xulamê xwa pê ra kar kir. Go çû, weka zê bêjim, çûna çolekê. Êvarî xulam ewk kir. Tem berda jinikê, berda jinikê. Rabû go: Meyzê go ti mi ne, ti

- neyê ba mîn, ez ê serê kurê, ez ê guhê kurê te jê kim. Go serê wî, go guhê wî jê kir. Yê mezin jê kir. Go rabû go jinikê go guhê kurkê xwa kirna berîka xwa da. Go ê dî, ê navê go: Meyzê, ê dî jî jê kim. Go serê wî jî jê kir. Ew jî go guhê wî
- (55) kirna berîka xwa da. Bûna dido. Go: Meyzê, hermet ez ê vî jî, wî jî ewk kim. Go: Wî jî ewk bika. Go ew jî ewk kir. Ê go: Ka vêca... Go dor hata ser jinikê. Go dor hata ser jinikê go, go, go: Ya rebî... Go: Ka hema werîsekî bavêj destê min. Ez ê çima derka ha destmêj, destmêjeka xwa ewk kim. Mi jî pkuja. Go rabû çû weka ewkekê. Hema werîsê wî hêdîka' b devîyê va girê da û baz da.
- (60) Baz da. Baz da go çû. Ê ew jî dibê: Da... Heka nîv saet diçê heka saetek a nîv saet diçê hema bê ka dimeyizênê, dçê dûv werîsê xwa. Dçê ga va werîsê wî bi ne'y bi devîyê ve ya. Ê jinik jî baz daya. Ê diçê. Ew diçê, tê mala vêca dêw, xwa dkê weka... Cilna keçeloneka' l xwa dkê ew keçîk û tê devê derîyê mala bavê xwa. Tê devê derîyê mala bavê xwa. Diçê pêşî dibê: Wella hema
- (65) Xweddê' j we razî bê... A. Diçê devê derîyê mala bavê xwa. Dibê: Wela belak li piyê vî zîlamî ketiya, keçelonek. Ê' m dîkin û nakin ne der dibê û ne zer dibê. Ma ti dbê ti ti nizanê, ti enîsî gelo bela vî piyî çî ya? Go tê, go rojekê îda dimeyizênê Şaxê Şamara na, ew jî tê' b ser da tê wê dê. 'B tafîqê îlahî timmam têne wê dirkê' j xwa' r dirûnin. Ev keçelûlok dibê: Wela ez ê, ez ê ewkê bêjim.
- (70) Ev keçîk, xwa kirya weka keçelonekkî. Dibê: Ez ê meselekkê' j we re bêjim. Dibê: Diya' m nebû. Jinbavê çû bêbextî li mi kir. E çûma paleyîyê. Ewk dana min. Wextê mi av vexwar çêlîka mara keta qirka mi. Bêbextî' l mi kir go: Tî biheml î. Rabû go ew bebek ew, çî ya ew mar... Bavê mi ez birma çolekê. E li wê dê hiştim. Ew mar, erq hata mi, ew mar hemmi' d devê mi ra derket, çû. Ê
- (75) piştî wê e' d nav bîşî de mam. Şêx Şaxê Şamara û tajîkê xwa anîn bûn. Ew û xulamê xwa hatibûna nêçîrê. Wa jî' z birim. Sê zarokê mi çêbûn. E neştexlîm. Piştî wê... Wilo nabêjê. Dibê... Mesela wî dbêjê. Pêşî mesela nabê "Ez im.". "Ê piştî wênakê ez rabûm..." Ew jinik jî dibê: Ez ê vê çîrokê bê, yanî ez ê vê meselê bêjim. Dibê: Ê go mîza wa bê, ê go çî wa bê ber herin bikin. Ev derî
- (80) nayê vekirin, hetta go' z vê mesela xwa nebêjim. Ê drabê bavê wênakê dibê, dibê: Bavê min... Dibê: Bavê mi ez birma wê drê. Ê mi go: Yabo, qotîya te heka winda bûya, çî ya, ez ê çim qotîya te ênim. Go: Na. Mi çû çeçmeq anî.

Go: Na, keça'm titna'm maya. Dîse çû titinê go: Bavê'm mi fêm kir go bavê'm naxwazê ez pê re herim. Û go: Çûm. Wî Şêxê Şamara jî ez nav bîşî da dîtîm.

- (85) Mi... Cibhê xwa'j mi ra avêt. E çûm. Sê zarokê mi çêbûn. Her sê zarokê mi jî... Pey ra wî... Û xulamê xwa şîyand, go: Her biba mala bavê wê. Ew jî birna wê dirê. Ew jî' b rê da... Hal û meselê yî ev a. Her sê kurkê mi û serê wa jê kir. Û her şeş guhê wa jî a va na'd berîka mi da. Her tiştê xwa dbêjê. Dibêjê, diçê, dibê... Dimeyîzênê vêce Şêxê Şamara wû bavê wê jî. Îda dibê: Ka ez ê piyê wî
- (90) jî der kim. Piyê wî heta' b derzîyê navêjê piyê bavê xwa û terk derzîya wî piyê wî naxebitê... Rihet dibê ga şêlleh tê de nîn a. Ew keçik piyê bavê xwa jî rihet dikê. Gotibû go: Rebbî, tişteke bikevê piyê ta go ne der bbê' w ne zer bbê heta ne ez bi vî destî ewk bikim. Îda ew jî çêkir. Û go rabûn agirik... Go dgo: Ka agirekî bikin. Wî xulamê'm bavêjna nav, wî bişewitênin. Û jinbav... Hal û
- (95) mesela jinbavê jî... Jinbav berda. Bêbextî lê kiribûn, zahf bêbextî' l wê keçikê kiribûn. Çîroka mi xilas, serê we sax.

METN 6¹²⁸

- (1) Go hebû nebû birakê'm. Ez ê çîrokekê ji we ra bêjim keko. Çîroka Keçika Çardehsalî' j we ra bêjim. Go keçika çardehsalî. Go keçik bû, çardehsalî bû. Go her şeva qî rabê hewşa mala bavê xwa malê. Teyrek î' j hewa de çê, bê: Keçikê, keçika çardehsalî / Tê bê nesîbê vî teyrê pazdehsalî. Go: Yadê. Go: Hê. Go:
- (5) Çiqqa her sibeh rabim ez hewşa xwa dmalim, ev teyr ê ser mi re çê, ê wilo bêjê. Raba, em ê mala xwa' j ber bar kin. Em ê' j vir çin. Go: Lawo, ma em ê' b ku de çin? Go: Heme mê çin. Go rabû rojik, ddo, sê, çar dibê: Wela em ê' j ber vî teyrî çin. Hema her sibbeh ez ê hewşê malim. Ev teyr ê' d vi ra bûrê wê wilo çê wê wilo bêjê min. Rabê diçin. Bav bi şiqkî da diçê. Keç û dê bi şiqkî de
- (10) diçin. Ka bi ya hev nakin, çawa tkin hema' b şiqkî de diçin. Diçîn, diçîn, diçîn, diçîn navsera çiyakî. Dimeyîzênin qesrek a li wir a û haveynê derî tê de nîn a. Piştî xwa ddina derî, piştî xwa ddina dîwêr, a tî na. A tî na, piştî xwa ddina dîwêr. Derî dibê zîq, divebê. Diçîn, dibê: Keça'm, ma ka çi' l wir a? Ka hera. Dibê: Yadê! Wela cêrekî cemidî va' l vê dê... Av tê de heya. Dibê: Lawo têr

¹²⁸ Ev çîrok ji Eytan Turğuta ku 56 salî ye wekî deng di sala 2013an da hat tomarkirin. Eytan Turğut ev çîrok ji bavê xwe Mehmet Turğut girtiye.

- (15) vexwa wû têra mi jî bêna. Têr dixûn, têr divexwin. Go berê ew çemçik hebûn. Çemçik a, ka kodik a, ka çi ya. Dibê em ê çin, kina devê cêr da. Divegerê, divegerê, dimeyzênê derî tê girtin li keçikê. Keçik di alyê hindurû de dmênê, diya wê'l şiqê derve dmênê. Dibê: Keça'm. Dibê: Hê. Dibê: Ev jî... Hera li wa oda hemmika meyzêna bê çi di wa da he ya w'j diya xwa ra bêja. Diçê, li yekê
- (20) dimeyzênê, zîv û zêr a. Li yekê dimeyzênê, malê dinyayê ya. Li yekê dimeyzênê, ga teyr a. Ew teyrê go digot. Dirabê digrî. Keçik digrî, digrî, digrî, digrî. Teyr ji xew şiyar dibê. Dibê: Ma ser, çima ti digrî? Dibê: Mi gotiya qey ti mirîya. Ji tirsê dbêjê. Dibê: Mi gotiya qey ti mirîya. Dibê: Sedaq, anî wilo,'j îşê Rebê alemê. Mey hewqa digot jî, mi dgo: Na. Mi go: Em ê'j ber teyr çin. Em ê
- (25) çin, terkedinya bin daqena ev teyr wilo bes bêjê min. Dirabê teyr diçê, wê'd ava zîv û zêr ddakê, çarçefekê lê dkê, qesrek çi textekî ddeynê, wê ddeynê ber camê, ser text deynê. Ê'ş xwa ra dçê îşê xwa. Derî jî î girtî ya. Dirabê dmeyizênê, êleka qereçîya'd wir va dibûrê. Êleka qereçîya'd wir va dibûrê. Dibê, ew dibê: Ev ha'v şewqa min a. Ew dibê: Ha'v şewqa min a. Hevdû'ş
- (30) xwînê sor tîkin, lev tîxin. Dirabê yek a, diçê, werhasil, heka dçê heka dçê destavkê heka dçê çi ku dirê werhasil. Dirabê xwa dvedizê'j wa. Ji mîletê xwa dvedizê, xwa tkê bûwara devîkekê da, xwa tkê bûwara devîkekê da. Go mîletê wê diçê dibê: Xweha'm, ka tiştêkî mi berjêr ka. Ez ê êma ba ta. Weka ez bêjim werîsekî, tiştêkî... "Em ê êna ba ta." Çawa keçik çawa, çilo dkê, çawa dkê
- (35) werîs ka bê çi ewk çi nuî wê keçikê dibê ba xwa. Dirabê keçikê keçikê ewk dikê û çê dkevê cihê wê da. Keçikê dkujê, bawer ka. Keçikê dkujê, ya qereçî dkevê wir da. Ew jî dirabê. Teyr tê, dimeyizênê ga va ne ew a. Ê ya wînakê jî wilo dibê. Hema ew keçik jî dibê weka ew ewka serê teşîyê ew nahka serê teşîyê. Jinikik dibêjîyê dibê: Wela belkî ev ewk ji me ra lazim bbê, ev ewka
- (40) serê teşîyê'j me ra lazim bê. Dikê qula dîwarekî, dikê ya xanîyê xwa bê ka çilo dkê. Ev keçik ewk dibê. Jinika reş, ya qereçî wê ewk dikê. Dimeyzênê ga va ne ew a, wê dkujê şixwa. Dbêjê: Gelî gundîya! Ka hema ê go benzîn hebê, ê go mazot hebê, ê go tiştik hebê. Ê agir dîkin û vêya qereçî tavêjna nav. Ya qereçî tavêjna nav ya go halo'l serê vê keçikê kiriya. Keçikê keçikê wilo dîkin wê
- (45) wêya go wilo'l serê keçikê kiriya û ev keçika wê, ev jinika go wilo kiriya. Go digo weka serê teşîyê, kiriya weka serê teşîyê. Ew jî wilo, çîrokê berê, te dît,

wilo bûn. Îda dbê xebero gotiya... Wilo dibiward. Hingî berê wilo dgotin. Go gotiya jînikê gotiya: Belkî ev nahka serê teşîyê'j me ra lazim bibê. Tê dimeyizênê ga va îşê wî'y kirî ya, dora wî maliştî ya, her tiştê wî dîtî ya. Dibê:

- (50) Wela rojekê ez ê xwa li vê, li vî îşî tiştekan tê da heya. Ez ê xwa lê kima diz. Dimeyzê go ew nahka serê teşîyê dirabê kêlîkê îş û mîşê xwa dkê, her tiştê xwa dkê. Dîsa eyn diçe wilo dkevê qulka dîwêr. Anî jinika wî baş dibê, yanî baş dibê. Wilo dbêjin. Wilo ê berê wilo digotin. Çîroka mi xilas, serê we sax.

METN 7 ¹²⁹

- (1) Go hebû nebû. Ez ê birakê'm... Ez ê vêga rabim çîroka Jinka Zêra'j we ra bêjim. Go Jinka Zêra û di hevalê xwa çûna hejika. Go çûna hejika. Go Jinka Zêra jêhatî bû. Ê'd ceh de pêşî wê piştîyê xwa kir. Go her dû hevalê wê jî jê ewk bûn. Go go rabû go hevala wê ya pey ra, wê jî kir. Go: Ka'p xêra xwa
- (5) kêlîkê wera serê mi sah ka. Serê wê danî ser kaboka xwa. Ê serê wê sah kir heta ev hevalê wê dîtirkê jî piştîyê xwa bikin. Rabû Jinika Zêra go di xew ve çû. Jinka Zêra serê wê danîna ser kevirê û hevalê wê xayintî lê kirin, çûne malê. Go çûne malê. Rabû şev nîvê şevê dirabê, dimeyizênê ga ne heval û ne tiştak û çoleka repûrût. Şixwe'l wê dirkê, ga serê yê'l ser kevir a. Dirabê, dibê:
- (10) Wa yadê! Te dî berê dgotin dîgo: Pîrebok. Dibê: Hê, hê! Dibê: Ti ne diya min î / Ti ne diya min î. / Diya min a / Pêşmalşîn a / A kirassor a / Dawbigol a / Ne dya min î. Ew hirç a bê çî ya, ew jî xwa wilo tkê. Dibê: Wera, wera. Ez im. Wê dikê, dikê mixarê da. Dikê mixarê. Kurikkî di kurikê wê çêdbin jê. Navê yekî dikê Îsa navê yê dî dkê Mûsa. Dirabê rojekê, rojekê nêrîyê mala bavê wê têna
- (15) ser wê dê, pezê wa tê wê dê, dibê: Kuro lo şivano şivanê... / Şivano, şivanê mala bavê min î / Te pez berda Mêrga Mazinî / Ez Jinka Zêra ma / Xwêka heft bîra ma / Diya Îsa'w Mûsa ma / Îsal heft salê mi / Ez girtîkê lepê hirç û gura ma. Dirabê heqîqê wê bê ka çî he na miherkê wê tiştê wê na, diçe'b stirhê nêrîyê mala bavê xwa ve tikê. Diçe malê, dibê: Weleh hal û mesele ev bû.
- (20) Şivan dibê: Wela'l filan derê, dengê yekî halo dhata min. Ê ewk nêrîyê... Jixwa miherkin, tiştin me meyzand ga'b nêrîyê, bi nêrîyê, bi vî nêrî ve na.

¹²⁹ Ev çîrok ji Eytan Turğuta ku 56 salî ye wekî deng di sala 2013an da hat tomarkirin. Eytan Turğut ev çîrok ji bavê xwe Mehmet Turğut girtiye.

Meselek tē da heya. Ka'm herin. Em herin ka bē ɕilo ya. Tēn, dikolīn, ewk dīkin, dimeyizēnin ga va Jinka Zēra tē de ya. Jinka Zēra dibina malē. Dibine malē. Ū Īsa Mūsa jī'l wē dikē dimēnin. Dibē, dibē: Lawo, ez ē ɕime mala xalo, (25) nan ū mewīj, mewīja'j we ra ênim. Zarwē xwa ewk dikē. Ew jī tē, bavē wa tē, bavē wa tē ga va ne dē wū ne kessek. Yekī'l bin guhē vī dīwarē dixē yekī li bin guhē vī dīwarī dixē. Wa dikujē. Dibē Jinka Zēra jixwa diɕē malē. Ew wē dibina malē, dibine malē. Wela ɕīroka mi xilas, serē we sax.



PÊVEK 2: FERHENGOKA METNAN

aqir: axur

avzel: mibarek, pîroz

berberî: dijayetî, reqabet

bê ecibî: bê lome, dûrî van deran

bîşî: gîyayê himbiz, asê

ceban: goristan

cibh: cibe, eba

çavtengayî: hesidîn, ekisîn

çênî: parî, parçe

çilo: 1. çawa 2. şax û pelên darên berû
û mazî

daran: pêxistina agir, dadan

dasî: qirşikên gij û tûj yên serê
simbilên genim, ce û hwd.

derbik: kibrît, niftik

dever: cih, mekan

dever: cihê ketina nav rez û erd û
avîyan

dewrê pêz: karê çêrandina pez

efr: qeb, gulaş

erq: tevgera nava mirov ya berî
verîşanê

êl: kom, hoz

gerebol: ava bixerî, ava nezela

gêrkirin: li erdê dirêjkirin

gileh: gilî, şikayet

gurandin: serjêkirin

gwehdan: xwedîkirin, dermankirin,
paqijkirin

halo: wiha, hakî, holê, ha

haveyn: bermayî, nîşan

hefrît: giyandarên efsaneyî

hewl: şaşbûna çavan

hir: milayîm, sernerm

hiseynî: mirov li gor cin û perîyan

kabok: çok

keçelonek: qirdik, palyaço

kevanek: alîyê hundir yê pencereyê

key: karê her careka keyandina dew

kun: potstê pez yê avê

lep: dest

malê dinyayê: eşyay û malên nirxdar

med: midet, wext

mift û belaş: bêheq

miqam: awa

mirêba: xebatkarê çandinîyê, cinan

neqeb: navber

nu: rêbaz, metod

pilor: mama, hewdela zarokan

pîrik: alîkara zarokanînê, ebe

pîrek: jin

qambil: miqabil

qedan: nexesirîn, xwe xilaskirin

qefû: dar û qirşên ku li ber avê tên

repûrût: bêşînayî, ziwa

rêwingî: rêwî

ro'l nîro: nava rojê, bi roj

sahkirin: xûrandina por

sewal: ajelên wekî mêşin û bizinan,
pez

sewîlk: şerbik

şêlleh: jêmayîk, nîşan, piç

şilay: pir şaş, matmayî

tade: ezîyet

tem: îştah

teql: hêz û ahenga tevgerê

tewb: gurzê pêçayî

wewejardin: veqetandina tiştên ji
cûreyên cuda, neqandin

weled: banga dilpêşewitînê

xebero: goya, xwedêgiravî

xelfvegerandin: kirina qencîyê bi
xwedîyê qencîyê

xeremal: xerabmal, perîşan

xeriqî: yê ketî nav kêf û bextewarîyê

xeriqîn: ketina nav kêf û bextewarîyê

xêlfi: gotina şaş, derew

xwevedizîn: xweveşartin

xweçendkirin: hingavtina bi êrîşkarî

xwezerkirin: hingavtina bi êrîşkarî


ziha: ejdeha

zixur: kevirê hûr, xîç

PÊVEK 3: NEXŞE Û WÊNEYÊN HERÊMÊ

Nexşe 1: Nexşeya Eyaleta Diyarbekirê ya Sala 1530î ¹³⁰

DİYAR-İ BEKR EYÂLETİ



¹³⁰ Özkılınç û yên din, h.b., r. 119.



¹³¹ Tan I, **h.b.**, r. pêveka pirtûkê



¹³² Bnr. Bûlbûl, Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvîrêziya Wan (Di Dîyalekta Jorî Ya Zimanê Kurdî Da - Devoka Mêrdînê), r. 9 vgz. Tan I, h.b., r. pêveka pirtûkê

Nexşe 4: Xerabê Bena li ser Nexşeyê ¹³³




¹³³ Bnr.

<https://www.google.com.tr/maps/place/72300+Seki+K%C3%B6y%C3%BC%2FGerc%C3%BC%C5%9F%2FBatman/@37.6303462,41.4390538,11z/data=!4m18!1m12!4m11!1m6!1m2!1s0x400ba6cbb1e8d45:0x43add4606570fc10!2zU2VraSBLw7Z5w7wvR2VyY8O8xZ8vQmF0bWFu!2m2!1d41.5061912!2d37.6221361> (05 14, 2019)

Wêne 1: Wêneyê Xerabê Bena ji Esman ve ¹³⁴

🔍 (?yer=24714&haritasi=seki) Seki köy - Gercüş (?
y=&t=Gercüş&u=1&ua=0) - Batman (?
y=&t=Batman&u=1&ua=0)
1946k: Harabenna (?
lv=2&y=Harabenna&t=&srt=x&u=1&ua=0)
1928k: Xarabenna (?
lv=2&y=Xarabenna&t=&srt=x&u=1&ua=0)
■ Kürd (?eth2=kr) (Kercoz (?asr=Kercoz)) yerleşimi
■ Köyün Kürtçe adı yanlış yazılmış. Doğrusu şu şekildedir:
Xerabê Bena ryaman
■ Koord: 37° 37' 22" D, 41° 30' 37" K



¹³⁴ Bnr. <https://nisanyanmap.com/?yer=24714&haritasi=seki> (05 15, 2019)

Wêne 2: Wêneyê Xerabê Bena ji Diyarê Reza¹³⁵ ve



¹³⁵ Diyarê Reza ew kaş e ku gundê Xerabê Bena di pala wî da dimîne.



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

TOR AĞZINDA ZAMANLAR **(Xerabê Bena Köyü Örneği)**

Yüksek Lisans Tezi

Lokman KALAN

13711044

Danışman:

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mardin, 2019